# ŞENGAL
## Vejîna Çilmêran

*Azad Ararat*

aryen

**Weşanên Aryen** ǁ 16

**Serpêhatî-Roman** ǁ 06

**Şengal**
**Vejîna Çilmêran**

Azad Ararat

**Edîtor:** Roj Agir

**Redaksiyon:** Xerzî Xerzan - Aram Zal

**Dîzayna Bergê & Mîzanpaj:** Sadık Hangül

**Wêneyê Bergê:** Amara Art

**Çapa Yekem:** Enqere - Gulan, 2018

**ISBN:** 978-605-81987-5-3

**Sertifika No:** 34548

**Weşanên Aryen:**
Güzeltepe Mah. Abidin Daver Sok. No: 7/1
Çankaya/Ankara
**Tel:** 0312 7040251
**E-mail:** aryenyayinlari@gmail.com
facebook.com/aryenyayinlari

**Çap:**
Ceylan Matbaa - Ahmet Uçar
Güven İş Merkezi B Blok No: 318 Topkapı / İstanbul
Tel / Fax: 0212 613 10 79
Sertifika: 23352

Copyright© 2018 Weşanên Aryen
Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê beyî destûra weşanxanê bi tu awayî nayê zêdekirin.

# Şengal
# Vejîna Çilmêran

*Azad Ararat*

aryen

Di asîmanî vî welatî de carna ewrên sipî kom dibin. Weke topên pembû, yên ku di asîmanî de daliqandî bin, disekinin. Mirov kêfxweş dibe li ber dîmeneke wiha. Carna di asîmanê şipşîn de deqên sipî yên ewran, weke berfê xuya dibin. Mirovên vî welatî carna xeyalên xwe li van ewrên sipî bar dikin û ber bi şînahiya asîmên ve dişînin. Xeyal di vî şînatiyê de xwe dispêrin valahiyê û êdî nema diyar dibin. Bi demajoyê re baran dibare, xeyalên li ewran barkirî bi baranê re têne xwarê. Dibarin li ser mirovan û ji nû ve zindî dibin; xeyal dibin rastî. Di rastiyan de veşartî dimînin xeyal. Lewra, dibêjin ku, li dû xeyalan nekeve, lê bê xeyal jî nemîne.

Carna ewrên reş tên asîmanê vî welatî, bêdem û bêdestûr. Weke qîr dibare li ser gul û kulîlkên vî welatî, mal wêran dibin û malî perîşan. Dayîk zarokên li ber hemêza xwe diavêjin, bi neçarî bêyî ku li pey xwe binhêrin. Zarok, di deşt, gelî û newalan de ziwa dibin, difetisin ji german, ji birçiyan û tînan. Nalînên wan nagîhîjin asîmanan, ji ber ku her kes ji xwe re ye. Ereb, faris û tirk, herkes li ser ola xwe  diçe. Em di naverastê de dimînin , lewra êdî wext e, divê êzdî rabin.

Di nav deştekê wek deryayê fireh de, Çiyayê Şengalê li pey hev rêz dibe. Weke keştiyeke dûr û dirêj e, ji demên pêxemberan mayî. Bi axîn, bi nalîn û bi keser e Şengal.

Carna jî bi kêf û xiroş e. Şengal cihê çîrok û çîvanokan, cihê destan û lehengiyan e. Dewlemend e Şengal, ji hêla ol, mezheb, terîqetan... Di hemû dar û berên vî çiyayî de kevneşopiya gelan heye. Çand û nirx kom bûne, di ser hev de hatine, mezin bûne, bandor li dinyayê kirine. Lê mixabin niha... Niha dinalin ev warên qedîm û kevneşopiyên dîrokê. Riziyane û bêserûber in. Ji derve êrîş hatine li ser. Ne bi giştî radest bûye ne jî wek xwe maye. Ji ber vê yekê, hinek wek resentiya xwe maye hinek jî bûye mîna dijberê xwe. Ji ber vê çendê, nûkirin, nûjenkirin pêwîst e.

Şengal, cihê qilan, êl, eşîr û gelên kevnar e. Cihê pîr, koçek, çilegir, qewal, mirîd û şêxan e. Welatê Melekê Tawûs, Teyrê Tawûs e. Diyarê roj, tîrêj, çira û agir e. Pîroziyan dihewîne di nav û derdora her qubeyeka xwe de. Di her malekê wê de, dengê bilur û tembûran bilind dibe. Di vir de dengbêj in zanayên dîrok û çîrokan. Evîn û evîndarî, li ser zimanê dengbêjan, di her kêliyeke jiyanê de, ji nû ve têne jiyîn.

Niha çolter e Şengal û di nava bêdengiyekê de ye. Bi bîranînên hezaran salan dijî. Bi çîrok û destanên kevnar dilê xwe şa dike. Niştecihên vî çiyayî ji heftê û sê fermanan derbas bûne. Carna hinek ji wan dibêjin, xwezî em hemû bikuştana û yek ji me nemabûya.

Bêzar bûne êdî niştecih û xwediyên vî cihê pîroz. Yên ku ferman rakirin bêzar nebûn, lê yên ku ferman li ser wan ve hatin bêzar û bêtaqet in. Ji lew re, bê ku li pişt xwe binêrin ji vî warê bav û kalan direvin û diçin. Lê mixabin, jixwe yek jî armanca sîstemê ango ew kesên ku fermana wan rakiriye ev e. Ji ber vê yekê, êzdî, bivê nevê pêwîst e li hev bicivin û ji nû ve avadan bikin evcihê bav û kalên xwe.

Çiyayê Şengalê di navbera Dîjle û Feratê de ye. Ji rojhilat ber bi rojava ve dirêj dibe. Piştî neqebekê êdî Çiyayê Kolik ber bi rojava ve dest pê dike. Başûr û bakurê çiyê deşt in; deştên bi xêr û bêr. Cihê herî bilind di Çiyayê Şengalê de wek Çilmêran tê zanîn û bilindahiya wî 1.463 metre ye. Dirêjahiya çiyê 100 kîlometre ye. Gelek gelî û newal ji çiyê diherikin û ber bi başûr û bakur ve xwe berdidin xwarê. Cih bi cih dar û kevir hene, û hin deverên wî jî rût û repal in. Di hinek cihan de erdên fireh ji bo çandiniyê tên kifşê, lê hin cihan de zeviyên teng hene. Kêm be jî, di berwarê çiyê de, kanî diherikin. Her çiqas ev kanî hindik bin jî, qedr û qîmetê wan li cem gel zêde ye. Gund û gundik li dora van kaniyan de hatine avakirin. Dora van kaniyan de şikeft û xaniyên kevnar hene. Çiyayê Şengalê bi hezaran salan mirov û zîndewerên cûr bi cûr di hemêza xwe de parastiye û li wan xwedî derketiye. Ji lew re, Çiyayê Şengalê wek dayîkê ye.

Di quntar, berwar û serê Çiyayê Şengalê de rez hene. Bi ked û hostahî hatine avakirin û xemilandin. Li palan, dîwar hatine lêkirin û erd hatiye rastkirin. Bi vî rengî qat bi qat rez çêkirine. Dims, bastîq, kesme, şerab, mewîj bûne xwarin û vexwarinên bi hezaran salan. Lê mixabin niha rez nemane û di rezan de dîwar û hişkahî diyar in. Bi nav û bang in hejîrên Çiyayê Şengalê. Ji vî serî heya wî serî hejîrên dêm û yên avî hene. Bi navê nêvsork û tahmik du rengên hejîran hene. Hejîr hem têne xwarin û hem jî têne hişkkirin. Ji hejîran serok (sewik) jî tê çêkirin. Ev jî ji makîna goşt re têne derbaskirin û dibin weke qîmeyê goşt. Axa Şengalê pir dewlemend e û zîv û zêrîn e. Ji bilî van dewlemendiyan, derametên wek zerdalî, zeytun, hinar, tû, behîv, kizwan, simaq û hwd. hene. Mirov ji bo tenduristiya xwe ji van tehman mehrûm namînin.

Giyayên wek gurîz, kereng, tolik, xerdel, rêzkêrovî, pûnga dêm, pîvok, gêzberok, sahnî, deştî, fitir, durêvîk hene. Kîvork û kumî hin ji cureyên din in ku ji axê tên wergirtin. Her giyayeke vî çiyayî dermanek e. Ji lew re mirovên vî çiyayî zexm, bihêz û tendurist in. Wekî dinê, li vî warê çalik, sarinc û şikeft hene ku dibin alîkarên jiyana zîndeweran. Ji demên kevnare heta niha gelek tişt hatine afirandin û tim têkiliya çand û kelepora vî gelî bi van avahiyan çêbûye; û Şengal bi niştecihên xwe yên ev jiyana dewlemend dijîn ve, her hebûye.

Li rojhilat, li rojava, li bakur, li başûr, li ser serê Çiyayê Şengalê; mirov dikare bibêje ku li her aliyê herêma Şengalê qubeyên pîroz hene. Bi van qubeyên xwe, dibe wek navenda bawerî, rêûresm û jiyanê. Li bakurê rojhilat de Qubeya Pîrê Ewran heye, ji vî wêdetir Qubeya Şerfedîn tê kifşê, û di raserê vê avahiya pîroz de Qubeya Çilmêran ku li lûtkeya çiyê de cihê xwe digire, heye. Li kêlaka wî, jê ne gelek dûr dêrek ruxiyayî heye. Ji bo Şerfedîn û Çilmêran wiha dibêje Qewal Xelef Qasimê Çilegir:

"Şerfedîn di Mergeha Şêx Adî de li Şêxan, li gel Şêx Adî çil sal rûnişt. Pişt re sala 1214 (P.Z.), Şêx Adî, Şerfedîn şand Çiyayê Şengalê da ku Şengal rizgar bike. Bi vî avayî Şerfedîn kir berpirsiyarê herêmê û Şerfedîn bû Mîrê Çiyayê Şengalê. Niha ev der tirbeya Şerfedîn e. Şêx Adî ji gundê Beytilşarê yê Lubnanê rabû hat Çiyayê Şengalê, devê Deriyê Geliyê Kersê. Li vê derê Şamîka heye. Ji ber Şêx Adî ji Şamê hatiye û li vir sekiniye navê wî danîne Şamîka. Şêx Adî û cemaeta xwe hatine li vir rûniştine. Şêx Adî ji gelî ber bi jor ve hat serê Kaniya Gulav. Li ser kaniyê sekinî, navê kaniyê guhert û navê wî danî "Kaniya Pîrexa". Neh-deh cemaet bi Şêx Adî re bûn. Şex Şims bû, Şêx Hesen bû, Şêx

Ebûbekir bû û hinek welatiyên din jî pê re bûn. Ji welatê Şêx, Eşîra Dimiliya, Qiziliya hatin, ew jî pê re bûn. Paşê ser çiya ketin. Dika Çemir, Dika Fadil, Dika Dengiz re derbas bûn, çûn û gihiştin Tajî. Piştî Şêx Adî jê re got: ´Ti weke tajiyan dipeyivî´ ji vî demê pê ve ji wê eşîrê re dibêjin Tajî. Ew jî lubnanî bûn û bi Şêx Adî re hatibûn. Şêx Adî û cemaeta pê re li dara Fadil rûniştin. Darên Fadil bi qasî gewdeya bermîlên gazê stûr in. Darên wî wextî heya niha jî li ser kaniyê diyar bûne. Nehatine birîn û bûne wek pawan, nîşan û dîrok. Ji wir re çûn, ji Şêbil re xwe berdan xwarê û çûn Şerfedîn dîtin. Li Şêb, li ser kaniyê hev dîtin û Şêx Adî pê şa bû. Hinekan ji Şerfedîn re got, tu yê sipî bûyî; ji ber ku temenê wî derbas bûbû û por û simbêlê wî sipî bûbûn jê re wisa digotin. Wisa çûn û bi hevdîtinê kêfxweş bûn, ji ber vî çendî digotin pê şa bûye."

"Sala 1257an de (P.Z.) Şerfedîn û Siltan Êzidê Sor qedem guhastin û dan rê çûn. Herî dawî mêran ew li Mêrdînê dîtin. Ev nav ji wê demê tê. Wateya wê ew e ku cara dawî mêran Şerfedîn û Êzid li wê derê dîtine. Peyva mêran êdî bûye navê herêmê û ev der wek Mêrdîn hatiye binavkirin."

Qewal Xelef Qasimê Çilegir jî li ser Çilmêran wiha dibêje:

"Şêx Adî ji Lalişê çil mêr dişîne Çiyayê Şêngalê da ku Şerfedîn biparêzin. Yê ku ji van çil mêran re serkêşiyê dike Brahîm e. Her çil mêr tên ba Şerfedîn. Ji wan re tê gotin Behdîn ango Xwebexş. Ew çil mêr Şerfedîn û Çiyayê Şengalê diparêzin. Ji deverên Çiyayê Şengalê jî mêr dihatin Çilmêran. Li Çilmêran şêx û pîr li hev diciviyan. Ji wê demê pê ve li ser serê girê Çilmêran qube tim hebûye. Di qubeyê de serderî (micêwir) disekinin. Vana xwedî li qube derdikevin û çirayê pê dixin."

Ji Çilmêran ber bi rojava rêyeke qîr diçe heta Amûdê. Amûdê cihekî kevin yê artêşa Iraqê ye. Ji Amûdê rêyek xwe berdide bajarokê Şengalê, ev bajar di çiyê de ye. Li bakûrê bajêr gir, newal û cih bi cih raste hene. Li Başûr, rojhilat û rojavayê bajêr, deşteke bêdawî û fireh heye.

Ji Amûdê ber bi aliyê rojava ve, li navserê çiyê, Navdeşta Serdeştê heye. Ji wê û wêdetir gundê Kolik heye ku ev gund gundekî çiyayî ye. Geliyê Kersê ji vir dest pê dike û ber bi jêr ve diçe. Di ketina gelî de kaniyeke xweş ku reng dide vê herêmê heye. Her wiha, li vir qubeyek jî hatiye lêkirin. Ji kaniyê berjêr heta gundê Kersê li her du aliyên gelî bax û baxçeyên serhev xweşikbûneke cûda diafirîne. Li vî gelî pir tişt têne çandin lê piranî tutin tê hildan. Ji ber tahma wê ya kişandinê, tutinê Geliyê Kersê pir navdar e. Ji gundê Kersê ber bi jêr ve gelî dirêj dibe û diçe heya deştê. Ev gelî dikeve bakurê Çiyayê Şengalê. Rêya ji Şengal tê li Serdeştê ango di navserê Çiyayê Şengalê re derbas dibe di geliyê Kersê de xwe berdide û heya bajarokê Sinûnê diçe. Ji Geliyê Kersê ber bi Rojava Qubeya Şêşims (Şêxê Rojê) heye û ev dikeve li rûyê bakurê çiyê. Qube di quntara çiya de hatiye avakirin. Di zeviyek biçûk de bîrek hatiye vedan û dora bîrê bi keviran ve hatiye nijandin. Ji qubeyê hevraz êdî bejayî bêkeys dibe. Li vir newalên kûr, girên bilind hene. Cih bi cih latên mezin û asê wek bedena kelehan bilind dibin. Qubeya Şêxê Rojê wek gelek qubeyên din, xwedî dîrokeke kevnar e. Li vir bax û bostanên avî nîn in, lê rez û hejîrên dêmê pir li berçav dikevin. Erdê li van deran ji bo ajaldariyê ango ajalxwedîkirinê destdaye ye. Di biniya Qubeya Şêşims de Qubeya Pîrê Fat jî heye. Ji Qubeya Şêşims û wêdetir êdî dawî li Çiyayê Şengalê tê; heya vê derê Çiyayê Şengalê weke elîpsekê ye.

Piştî neqebekê Çiyayê Kolik dest pê dike. Çiyayê Kolik dirêj e lê weke Şengalê bilind nabe. Ne li navserê çiyê ne jî li derdorê Çiyayê Kolik dar hene. Lê ev çiya ji bo ajalxwedîkirinê pir baş e. Gelek newal û gir di vî çiyayî de hene. Dawiya Çiyayê Kolik digihîje sînorên dewlet-netewa Iraq û Sîstema Federal ya Bakûrê Sûriyê.

Bêgûman ev sînor, ji hêla dewletan ve hatine xêzkirin. Ji ber ku di rastiyê de, di navbera gelan de sînor nîn in. Gelan, bê ku sînor hebin bi hezaran sal di nava aramiyê de jiyana xwe derbas kiriye. Di jiyana bê sînor de têkilî û peywendiyên netew û civakan pir pêşketî û dewlemend bû.

Li dawiya Çiyayê Kolikê, li herêma jê re Hol tê gotin de, Gola Golxatunê ya navdar cih digire. Di dawiya Çiyayê Şengalê û Çiyayê Kolikê de li ser axa Rojavayê Kurdistanê, gihîştina Golxatunê xweşikbûna dîmenê temam dike, ango Golxatûnê piştî çiyayan reng dide xeta sînorê Rojava û Başûr. Ev deşt, çiya û gol hem ji bo jiyana niştecihên herêmê hem jî ji bo jiyana koçberan gelek guncaw e.

Li başûrê Çiyayê Kolikê gundekî Ereban yê bi navê Medîban ku tê wateya dayîka du guran heye. Herêma Medîban şeş kîlometre dirêj û çar kîlometre ber e. Xaniyên gund ji hev dûr in. Piraniya xaniyan bi kerpîçan û bi şêweyê kevin hatine lêkirin. Erdê gund di warê çandiniya genim û ceh de zêde pêş neketiye. Lê belê, ji bo çêrê gelek destdaye ye. Di nava gund de du newal hene. Di werzên zivistan û biharê de, di van newalan re bi şêweyê rûbaran av diherike. Cih bi cih di kortan de av kom dibe. Li rojhilatê gundê Medîbanê, piştî Kolik û neqebê dîsa Çiyayê Şengalê dest pê dikin. Di destpêka başûrê rojavayê Çiyayê Şengalê de Geliyê Şilo heye.

Geliyê Şilo ji quntara çiyê dest pê dike û ber bi jor ve diçe. Di nîveka çiyê de dibe du newal. Ev her du newal heya serê çiyê dirêj dibin. Di geliyan de piranî taht û latên mezin hene. Ji van hinek ji kevirên sipî ne û ji bo çêkirina şikeftan kêrhatî ne. Jor, çep û rastê gelî pir asê ye. Bi van taybetmendiyên xwe, ji bo parastinê, dibe ciheke biewle. Di dema şerên şûr û mertal, tîr û kevan û riman de, mirov dikaribûn xwe di van şikeftan de biparêzin. Di gelî de sêsed û şêşt û şeş şikeftên ku mirov dikare di nava bedewiyên cîhanê de bihijmêre hene. Bi kolanên xwe û bi çêkirina tehtên sipî yên bi hêsanî hatine çêkirin ve, ev şikeft nîşaneyên kevneşopiyên jiyana mirovên kevnar in. Yek jî taybetmendiya wan tehtan ev e ku qet av ji nav xwe derbas nakin û di her demsalê de ziwa ne. Ev şikeftên wiha zivistanan germ in û havînan jî hênik in. Di gelî de tenê yek kanî heye lê qasî sê henîfeyan av jê diherike. Ji vî kaniyê ber bi jêr qasî sê kîlometreyan, coyek hatiye çêkirin. Ji bo vî teht bi qasî devê tevirekî, wek xîzikeke zirav hatiye kolan. Bi vî awayî, ava kaniyê heya devê gelî bi şêweyek hostahî tê kişandin. Di devê gelî de erdê rast heye. Li vir, di demên borî de, hem pez hatiye avdan hem jî bostan û baxçe hatine avakirin. Wek mirovan, ajal jî xwe li kaniya gelî girtine û tîbûna xwe li ser vê kaniyê şikandine. Kew, kevok, mar, moz û hwd. têne serê kaniyê û jê av vedixwin. Gundiyan di vir de salên dûr û dirêj, ji bo girtina kew û kevokan kozik û xefik danîne û ji bo debara xwe nêçîrvanî kirine.

Di aliyê başûrê çiyê de gelek qube hene. Ji vî serî heya wî serî, di quntar û berwarê çiya de qube hatine lêkirin. Di vî rûyê başûr yê Çiyayê Şengalê de jî gelek gelî, newal û kanî hene. Her wiha cihê aşûrî û yên cihûyan ku mirov li rastî nîşane û şaneyên wan tê, xwe raveyê çavan dikin.

Li deştên derûdora Çiyayê Şengalê,  gelek cihên niştecihbûnê yên kevnar û nû hatine avakirin hene. Di deşta bakurê rojava de Komelgeha Xanasorê heye. Di rasta Geliyê Kersê de jî Komelgeha Sinûnê heye. Bi vî rengî yek bi yek ber bi rojhilat ve Dugur, Dihola, Borik, Guhbel û Zorava rêz dibin ku ev herêm ji kombûna sedan gundên gelê kurd ê êzdî pêk hatine û bi şêweyê bajarokan têne dîtin. Di başûrê çiyê de ji milê rojhilat ve ber bi milê rojava komelgehên Girzerik, Girizêr, gundê Tewra, Sîba Şêx Xidir hene. Di bakurê Sîba Şêx Xidir de, di quntarê çiyê de, du gundên bi nave Sikêniya Jor û Sikêniya Jêr hene.

Ev her du gund nêzikî Geliyê Şilo ne. Ev gund xwediyê kaniyên xweş û rengîn in. Bakurê gundan çiya başûrê wan jî deşt e. Xwedêda li Gundê Sikiniya jor, di sala hezar û nehsed û şêstî de ji dayîk bûye.

* * *

*Ez Xwedêda me, niha di temenê xwe yê pêncî û heft salî de me û li Komelgeha Xanasorê dijîm.*

*“Binêre li wan wextan li wan zemanan*
*Li wan bedîlan li wan heywanan*
*Em jibîr nakin heftê û sê fermanan*
*Kul û hedera dilê me*
*Kul û hedereke zor giran e*
*Birînên me xedar in sax nabin bi heb û dermanan*
*Em digerin ser goran û goristanan*
*Gelo xêra kê dane kê bê xêr û xefen (kefen) mane*
*Bajarin ji me ava ne*
*Em bêtifaq in*
*Em wenda ne*
*Em der û dinyayê ketin*
*Em belawela ne*
*Em çi bikin nêv hemû dinyayê*
*Em ne xuya ne*
*Di destê zaliman de, şûrî giran e*
*Giha melekê erd*
*Heta melek li asîmana*
*Jê re hat xweş cewab e xweş mizgîn û xweş beyan e*
*Go rojkê emê we derêxin ji ber hikmê zalim hikmê giran e*
*Em ê destê xwe xera bikin qlîma wîlayeta şaristana*

*Binêre sûk û qeyseriyê bê xweyî bê xwedan e*
*Em ê hikûm bikin deşt û zozana*
*Me bo kêf û şahî eşq û dîlan e*
*Çiyayê Şengalê ji me re xweş war û xweş sikan e*
*Em ê li bendê bin*
*Rojkê Xwedê destê me ve bîne*
*Em ê bi destê xwe hilînin heyfa kal û bavê zemana"*[1]

Piştî ku ez ji dayîk bûm, jiyana min li gund derbas bû. Weke her zarokekî ez jî çend salên destpêkê ber hemêza dayîka xwe bûm. Wextê ez ji dayîk bûm, navika min hat jêkirin û di milê fizîkî de ez ji dayîka xwe qut bûm. Lê belê ez hîna gelek piçûk bûm. Lewra pêwîstiya min bi dayîka min hebû. Hem şev hem jî roj min nedikarî bê dayîka xwe bijîm. Heke dayîka min çûba derveyî malê û ez di mal de hiştibama, gelek xemgîn û bêgêwl dibûm. Min bêriya dayîka xwe dikir. Min dixwest di şûn de vegere malê. Dayîka min çiraya jiyana min bû, şev dikir ronî, ez diparastim, têr dikirim û fêrî jiyanê dikirim. Ji ber ku ez zarokê ewil ê malê bûm, bûbûm delalê malê û hezkiriyê ber dilê dayîkê. Ez ne keçik lê kur bûm, lewra qedir û qîmeta min li ber çavên wan zêdetir bû. Wiha derbas bû salên destpêkê yên jiyana min. Piştî ku gihiştim pênc saliya xwe, êdî derdiketim derveyî malê. Min dikarî di nav gund de bigerim û weke çûkekê êdî ez bi per û bask bûbûm, min dikarî bê dayîka xwe bifirim.

Gundê me gundek gelek xweş bû û li quntarê Çiyayê Şengalê hatibû avakirin. Di gund de zeviyên me, bax û baxçeyên me hebûn. Di pêşberî gund de gir hebû, girekî qeraç. Ji vê û wir de deşt dest pê dike; deşteke bêserî û bêdawî. Heya çav dibînin deşt e. Di gund de du kanî hene;

---

[1] Helbest; Pîr Cindî, Serdeştê, Çiyayê Şengalê

ji wan yek li rojhilat yek jî li rojavayê gund re diherikin. Di wan deman de ji bajarê Mûsilê bijîşk hatin û av kontrol kirin. Wê çaxê bijîşkan digot: “Ev av derman e.” Ji bo gurçikan ava vê kaniyê zêdetirîn kêrhatî ye. Me êdî zanî gundê me dermanê nexweşiyan e. Kaniyên gundê me ji ber dermantiya xwe ya xwezayî bûbû cihê serdana hemû gelên herêmê. Herwisa ji wir û şûn de edî dixtoran jî nexweşên xwe dişandin ser vê kaniyê ku ava xwe jê bibin û pê sax bibin. Kaniyên me diherikîn diçûn heya deştê. Hem gundê me, hem jî Sikêniya Jêr ava xwe ji van kaniyan digirtin. Ajal bi vê avê dijiyan, bax û baxçe li ber vê avê mezin û xweşik dibûn. Li serê kaniyan de darên biyan hebûn. Dar bi qasî xaniyên du qat mezin û fireh bûn. Li serê kaniyan golên biçûk hebûn, bi qasî metroyekê kûr bûn. Di mehên havînê de zarok diketin van golan û xwe hênik dikirin. Ji kaniyan ber bi jêr ve jî ajal diketin avê û jê av vedixwarin. Lewra di nava rojê de av şîlo dibû. Ji ber vê sedemê gundiyên gundê me berê sibehê ava xwe ya vexwarinê digirtin. Sikêniya Jêr jî di nîveka şevê û şûn de ava xwe dikişand malan. Di gund de, malên jêra kaniyê, ji xwe re bi cihokan av dikişand. Malên ku ser kaniyê re bûn li ber malên xwe bîr kolabûn. Her malekî yek metre erd kolabûya, ji vî kurtasiyê de jî av derdiket. Carna, ji ber ku hênikahiya ji têna jêr ber bi jor vedikişiya, tifikê êgir de koz vedimirîn. Bi vî rengî bû gundê me; bi av û kanî, û bi bax û bostan bû.

Di gundê me de darên fêkiyan yên cur bi cur hebûn. Ji vana hejîr, hinar, tû, zerdelî gelekî bitam bûn. Ji bilî van rez û zeytûnên me jî hebûn. Di van deman de cîhana me gelek biçûk bû û jiyana me bi gund û derûdora wî re bisînor bû. Em têra xwe hebûn. Ji der ve me tenê çay û şekir, her wiha ji bo cildirûnê qumaş distand. Pêwîstiya me pir bi der ve

tine bû. Ji hazirkirînê zêdetir, tişt bi destê gundiyan dihatin çêkirin û dihatin xebitandin.

Ez dema gihiştim neh-deh saliya xwe, êdî zarokeke nesekinî û nerehet bûm. Jiyan ji bo min lîstok bû. Lîstokan di jiyana min de beşeke girîng digirtin. Jixwe lîstokên me du beş bûn; beşek ji van yên şer û ceng, beşek jî yên kêf û şahiyê bûn. Me zarokan lîstoka kevirkanî dilîst. Ji bo vê dayîkan ji me re ji mûyên bizinan ta dihûnandin. Her milekê ta qasî metreyek bû, nîveka wê qasî bostek pahn bû. Ser vî cihê pahn re eyarê pez dihate dirûtin da ku pê kevir baş bêne avêtin. Di her wextekê rojên nediyar de em zarokên gund li hev diciviyan. Zarokên Sikêniya Jêr jî li hev kom dibûn. Di navbera her du gundan de em dihatin pêşberî hevdu û me dest bi lîstokê dikir. Me kevir dikirin nava eyarê pez û seriyekê ta bi tiliya xwe ya piçûk girêdida. Bi tundî ba dida û seriyekê tayê berdida. Kevir ji cihê xwe derdiket û ber bi armanca xwe ve diçû. Di vê demê de dengek jî derdiket. Deng weke yê bivîna bayê yan jî çivîna fîşekê bû. Ji ber ku dema kevir ji eyarê pez derdiket, eyar lihev diket û wisa ev deng jê derdiket. Zarokên Sikêniya Jêr jî bi heman şêwazî kevir diavêtin me. Gelek caran serê me zarokan ji ber van keviran dişkest û em birîndar dibûn. Nizanim me çima evqas lîstokeke xedar dilîst. Evên ku ev lîstok cara destpêkê derxistin gelo ji bo çi derxistibûn. Gelo ji bo zarokan ferî şer ango xwe parastinê bikin wisa ev lîstok afirandibûn? Nizanim. Lê ya ez dizanim ev lîstok pir bi xedar bû û jiyana me ber bi neyîniyan ve dibir û her ku diçû em ji hev dûr dikirin.

Em wek piçûk û mezin dihatin gel hevdu û me lîstoka Holê jî dilîst. Yên ku dizanîbûn, diçûn li çiya, ji wir dar dianîn. Dar weke gokekê girover dikirin. Çoyek jî didan

destê her yekî ku navê wê jî kaşo bû. Serê kaşo qasî bostek, tewandî bû. Em diçûn qadê ku me jê re digot Meteres. Lê belê mezinbûn û biçûkbûna Meteres li gor şert û mercên erdê ku em têde bûn dihat binavkirin. Em dibûn du alî, lê hêjmarek xuya tine bû ji bo vê lîstokê. Her aliyek pênc kes jî deh kes jî dibû. Bi keviran du keleh dihatin danîn û lîstoka me dest pê dikir. Bi kaşo me hol dida da ku em ji keleha pêşberê xwe re derbas bikin. Bi vî rengî bû, lîstoka me ku me jê re digot Holê.

Zivistan û biharan, di nava gund û sergoyan de zibilê pez şil dibû. Wê demê me çitûçam jî dilîst. Ji berwarê çiya re me şaxên daran jê dikirin. Me dianî nava gund û qasî nîv metro dibirî. Paşê serê van daran tûj dikir û dikir weke singên sertûj ku di erdê re biçin. Di sergoyê zibil de, me dest bi lîstokê dikir. Me bi dor sing bi destê xwe hildida jor û bi tund diavêt nava wî zibilî. Lîstikvanê piştre singê xwe wisa diavêt ku karibe singê erdê de çikandî bide û ew daxîne xwarê. Heke wisa bikira serkeftî dibû, nexwe, lîstok bi lîstikvanê dinê didomiya.

Me roja pêncşemê piştî nîvro hêkên kelandî amade dikirin. Me kerên xwe digirtin û em diçûn ser rê. Me kerên xwe xar didan ber bi nava erdan ve. Yên destpêkê digihiştin armancê, kêfxweş dibûn û pesnê kerên xwe didan. Di wir de me hêkên xwe diqeşartin û dixwarin. Me qaşilê hêkan, bi taybet, diavêtin nav erdan ku xêr û berê erdan zêde bibe. Piştre bi coş û kêfxweşî me berê xwe dida gund û em vedigeriyan malên xwe.

Xem, kul û derdên me tinebûn. Yên hebûn yên me bi xwe bûn û di nav gund de dihatin çareserkirin. Em xwe bi xwe û yên xwe bûn. Lewra em dilşad bûn, hezkirin û evînên me jidil bûn.

Di wan çaxan de ez weke mozan har bûm. Carna ez û hevalên xwe em diçûn ber kuna mozan. Bi darikan me kun tev didan. Moz derdiketin û êrîşî me dikirin. Dema me wan pir bêzar bikira, rasterast dihatin û xwe li nav çavên me dixistin. Ji ber vê çendê çavên hinekan diwerimîn. Paşê herkesî henekên xwe li wan dikir. Ji ber ku çav wisa diwerimîn, êdî xuya nedibûn. Dîmenek pir kenok derdiket holê. Lê yên ku moz pê vedayî heke bi kevirên germ dax kiribana nediwerimî. Ji ber çi ye nizanim, lê me carna bi hevdu re carna jî bi ajalan re şer dikir. Bi vî rengî jiyana me û yên ajalan, bi xweşî û nexweşiyên xwe ve bi hev re derbas dibû.

Kuştina çûkan jî yek ji wan lîstokên me yên xirab bû. Ji ber ku her çiqas me navê wê kiribû lîstok û me ji wê lîstokê keyf û xuriş werdigirt, û di encamê de kuştina zendiyekê hebû, ez bi xirabî û nebaşiya wan rojan dihesim kêliya ku ew tên bîra min. Çûkên ev qas piçûk, nazik û nazelîn ku bi deng û rengê xwe xweşikbûnê didan xwezaya me, lê me ew xweşikbûna cîhanê bi destê xwe dikuşt. Ji ber çi bû nizanim, lê ya ku ez pê dizanim ev weke kevneşopiyekê bû; em ji pêşiyên xwe wisa fêr bûbûn, bi heman rengî, nifşên pişt me dihatin jî ji me hîn dibûn. Firîna çûkan xweştir bû ji kuştina wan. Lê me ew dikuştin, bêeger û bêsedem. Me kevanên darîn çêdikirin. Bi kevankan diçûn binê daran û me kevir diavêtin wan çûkan. Li gundê me kesek bi navê Xidir hebû û bi nêçîrvaniya xwe ya çûkan navdar bûbû. Bi kevankê her kevira ku biavêta diçû li çûkan diket. Ango yek kevirê wî ji ber nîşana wî ya xurt vale nediçû. Wisa gelek çûk dikûşt. Dema Xidir kalemêr bû, xewnên tirsnak didît. Li gorî ku min piştre bihîst herdem çûk dihatin ber çavên wî ango di xewna wî de dihatin ber rûyê wî û ew ji tirsan vediciniqî, bi tirs û xof ji xew radibû.

Min pir ji berxikan hezdikir, bi taybet ên zerik. Min nan û ceh dida berxên xwe. Di nava rojê de min ew li nava giyayên kesk de diçêrandin. Carna şev nîvê şevê ez diçûm gel wan, min destê xwe di serê wan de dibir û ez pê bextewar dibûm.

Carekê bi malbatî em çûn deşta Bamernî. Ev cara destpêkê bû ku ez çûm derveyî gundê xwe. Mehên havînê bûn. Me dexil diçinî. Bi qasî du mehan em li wir man. Ew wek me bûn, lê ji me dewlemendtir bûn. Rojekê gundiyan debok û beroş girtibûn dest xwe û bi daran lê didan. Me fam nekir ka ev çiye û ji ber çi tiştî ye. Me pirsî, "Gelo çima wisa dikin?" Wan gotin me, "Mêşên me yên hingivê xeyidîne û çûne, bi vê rêbazê em dixwazin wan aş bikin da ku vegerin cihê xwe." Wiha derbas dibûn rojên me yên wê derê.

Di gund de êvaran şevbihêrkên me hebûn. Gundî di malekê de li hev diciviyan. Tembûrvanan bi tembûrên xwe şevên tarî û bêdeng dixemilandin. Dengbêjan bi kilamên lehengî û cengawerî reng didan şevên me. Bi stranên ku distiriyan, em ber bi rojên kevin, mêjûya dûr û dirêj ve diçûn. Kilamên fermanan û revandinên keçan jî distiriyan. Di odeyeke dorfireh de çarmêrkî rudiniştin civata mêran. Kîsikê tutinê didan hev û bi dorveger çixare dipêçan. Yên qutiyê xwe hebûn ji bo hevalên xwe di erdê re diavêtin, digihandin yên pêşberê xwe. Carna yekî digot, "He hey heyyy." Bi gotina hey û ax re sed ax û keder dihatin avêtin û ji ber mij û morana dûmana cixarê ewrên sipî peyda dibûn di bilindahiya odeyê de.

Dengbêjan bêhnek distandin û dûyên xwe berdidan, bi hestên ji evînê barkirî. Diçû şev dihat berbang û bi bangdana dîkan re dawî li şevbihêrkê dihat.

Lîstokên me yên êvaran hebûn. Ji van yek jî cotik bû. Li çiya darberûyan berûyên xwe digihandin û berû diketin erdê. Gundiyan kom dikirin ji bo pêwîstiyên cur bi cur. Qalikê berrûyan yan bi darê ve diman, dema berû diketin, yan jî bi berûyan ve gindirî erdê dibûn û ji hev cûda dibûn. Hinek qalik jî bi rik bernedida berrûyên xwe. Bi çi şêweyî ba me qalikê berrûyan kom dikir, dianîn malê, serdevkî di nava sêniyekê de rêz dikir. Di bin qalikekê de me cih dikir moriyek ji moriyan. Em yên di mal de dibûn du birr. Me sênî datanî naverasta her du birran. Kê/kî morî bidîta, ew dibû serkeftiyê vê carê.

Carna em dibûn du birr. Em lîstoka gustîlk dilîstin. Me destên xwe dikirin kulm, yek moriyek dikir di kulmekê de. Heke birra pêşber moriyê bidîta, ew dibû serkeftî. Şertên me hebûn di van lîstokan de. Ev jî piranî yan şekir yan ji çay bû. Ji ber ku biqedir bûn, zehmet peyda dibûn di wê demê de. Di her malê de şekir û çay tûne bû. Lewra lîstokên me dibûn sedem, çay jî peyda dibû, şekir jî. Her kesî wek şêwaza komûn para xwe vedixwar.

Di gund de ajalên me ên pir baş hebûn. Tu kes bi tenê nediçû ber ajalên xwe. Colik hebû, her rojek malek diçû ber keriyê ajalan. Pez û mihên me wek bax û bostan, dar û daristanên me, em têr dikirin. Her sal dizan û zêde dibûn pez û ajalên me. Xwe bi xwe zêde dibûn. Berx û gîskên me xweşikî û rengîniyek cuda bûn di gundê me de. Me şîr didot dikire mast, mast dikir dew, ji dew jî nêvişk çêdikir. Ji mûyên pez kon, ji hiriyê mîhan balîf, doşek, kulav û lihêf çêdikir. Yên nêr yên kêrê bûn, di cejn û şahiyan de geş dikir sifra me. Me carna pez nedigurand lê ji eyar dikir. Ji eyaran meşk û cewt çêdikir. Cewt zehmet bû di dema çêkirinê de, lê hêjayî wê zehmetê bû ji ber ku ava cemidî dida me.

Mêran ji çiya berrûyên têra xwe negihîştî dianîn. Jinan bi keviran hur dikirin. Bi av berdidan nava cewtê û dima heta demekê. Çi bêhn û pîsî hebûya paqij dikir wan berûyan. Paşê her çar ling dihatin girêdan û devê wê re av diketê. Di nav cewt de av sar dibû. Cewt her ku kevin bibûya baştir av sar dikir.

Ji bo debarê pêwistiya me bi derve nebû. Dar û ber, ajal û lawir têra me hebûn. Di gund de tu karsaz û karker tinebûn. Tu kes bêkar nebû ji ber ku her kesek xwedî kar û barek bû. Em hemû rêncber bûn û me bi ked û xwêdana xwe ve jiyana xwe derbas dikir.

Li ber ava di nava gund re diherikî aş hebûn. Me dexlê xwe li wir dihêra. Di gund de dirûnkerên me jî hebûn, wan dirûnkeran hem ji bo jinan hem jî ji bo mêran cilan didirûtin. Cilên bûkanî, zavatî û yên dawetan bi şêweyekê taybet û xemilandî dihatin dirûtin. Carna gundiyan, çi jin be çi mêr, bi emanetî cilê xwe didan hevûdin.

Sefar dihatin gundê me, ew ji me bûn. Her çi qas di milê olî de em ji hev cuda bûn û baweriya me ne yek bû jî, di jiyanê de em mirovên hev bûn. Di gelek gund û bajaran de, em di nav hev de dijiyan. Ti ferq û cudahî di navbera me de tine bû. Aşûrî bûn ev sefar, cihû bûn. Di pîşesaziyê de xwedî huner bûn. Dihatin beroş û firaxên me sipî dikirin. Sobayên me qeynax dikirin. Demjimêr û radyoyên me yên xirabûyî çêdikirin ku wê demê demjimêrên bêrîkan hebûn, lê ew jî pir kêm bûn. Her wisa di gund de radyo jî çar-pênc heb hebûn.

Di kevneşopiya me de keçxwestin kêm  çêdibû. Piranî ciwanan li hev dikir, direviyan û diçûn gundekî dinê li gel mirovên xwe. Di nava çend rojan de diyar dibû ka malbatên wan li hev hatine yan na. Gelek caran malbatan li

hev dikir û paşê agahî digihîşt bûk û zava. Derdor ji bo wan dawetek xweş amade dikir û bi keyf û xweşî zewaca wan pîroz dikir. Xelkê goşt û girarê xwe dixwar, bûk û zava jî cara destpêkê wê şevê diçûn ba hev û bi hevdu şa dibûn. Piştî vê şahiyê bûk û zava vedigeriyan malê û îcar li gund dawet dihat kirin. Li gorî derfetên malbatan ji rojekê heya heft rojan dawet dikirin û girseya gel di van dawetan de dihatin cem hev. Civakî bûn dawetên me, ji her kesî re vekirî bûn. Çi belengaz be çi dewlemend, her kesekî li ser yek sifreya goşt û girarê dihatin ba hevdu. Piraniya kesên ku dizewicîn, bi hev re temen derbas dikir, lê kêm be jî, ji ber sedema lihevnekirinê berdan jî hebû. Hinek axa û beg ji yekî zêdetir jin dianîn, lê di rastiya civaka me de pirjinî tune bû.

Dema ez gihîştim sêzde saliya xwe nûka min dest bi xwendinê kir. Ez dereng mabûm lê dîsa jî çûm dibistana seretayî. Jixwe di gundê me de bi navê dewletê yek dibistan û yek jî qereqola polêsan hebû. Bi dibistanê bere bere, bi qereqolê jî bi darê zorê em dihelandin û ji cewhera xwe em dihatin dûrxistin. Tiştên din tev yên me, yên civaka me bûn. Min du sal li gund xwend. Êdî ez bûbûm ciwanekî pazdeh salî. Ji her demê zêdetir jixwe bawer bûm. Ez êdî ne ew zarokê ber hemêza dayîka xwe bûm. Kêm be jî min serxwebûna xwe bi dest xistibû.

Sala 1975an, weke min li jor got, temenê min gihîştibû pazdehan.

Di dîroka tevahiya gelan de hinek kêlî hene ku neyên jibîr kirin. Evane carna pir girîng in û pêşeroja mirovan diyar dikin. Qonax hene deriyê xêrê, qonax hene deriyê bêxêriyê vedikin. Sala 1975an saleke wisa bû. Bê ku agahiya me ji gelek tiştan hebe di ser me de kiryarên pir kirêt

dihatin meşandin û lîstokên pir qirêj li ser me dihatin lîstin. Jixwe em weke gel tûne dihatin hesibandin. Em hebûn, pir kevnar bûn, lê carna jî em tune bûn. Li ser lênûsa dewlet-netewan, navê me nehatibû nivîsandin. Lewra em tune bûn. Lê em koka mirovahiyê, çand û rêûresmê herî kevnar yê cîhanê bûn. Dewlet-netewan em parçe kirin û tine hesibandin. Lê em hebûn, li ser deftera mirovahiyê bi tîpên zêrîn hatibûn nivîsandin. Em bûn dayîka hemû şaristaniyan, lê em bi kêmasî, bi lewazî bûn. Derveyî serdema xwe mabûn. Lewra jî înkarkirina me hêsan bû. Kuştina me li cem hinekan xelat bû. Keç û jinên me xenîmet, mêrên me qetilhelal bûn. Em nezan, em bêrêber û bêtifaq bûn. Lewra ewrên reş û tarî li ser asîmanê me kêm nedibûn. Şikestin, belavbûn û berbabûn çarenûsa me bû dîsa. Dîsa em man bê xweyî. Rê li me hatin girtin. Neçarî perîşanî ket para me.

Li çar aliyê welat serhildan hebûn. Jixwe serhildan taybetmendiya herî pêş a lehengên me bû. Lê mixabin serkeftin nedibû para me. Xewnên Ehmedê Xanî nedibû rastî. Lewra weke her carî vê carî jî em li naverastê bêxwedî û bêxwedan mabûn. Bê şûr û mertal, bê gor û qeftan.

Li başûr û rojhilatê vî welatî de giregiran xwe sipartibûn dagirkeran. Serî hildabûn lê ne bi hêza cewherî. Xwe sipartibûn hêzên dagirker ku beşeke din a Kurdistanê dagir kiribûn. Ma li ku derê û kengî hatiye dîtin ku bi piştgiriya dagîrkerekî şer hatiye biserxistin li hember dagirkerên din, û serkeftin hatiye bidestxistin.

Di 6ê Adara 1975an de li Cezayirê Hikûmeta Îranê û a Iraqê li hev civiyan û qaşo pirsgirêkên xwe çareser kirin. Her yek ji wan, destê xwe ji pişta Kurdên xwe kişandin. Her yek ji wan berê xwe da Kurdê ku li hemberî wan serî

rakiribû. Di dawiyê de, dîsa bi ser neketin Kurdên serhildêr. Bûn qurban, ji hev belav bûn.

Di gundekî sedmalî de, em ên ji van siyasetan bêagahdar, cara ewil çekên me ji me sitandin. Qaşo bi çend diravan ji me dikirîn. Kî/kê dikarîbû bêje “na”, herkesî radest dikir birûno, çifte û mawzerên bav û kalan. Rojek ji rojan gotin, “Bar bikin, em li vir nikarin xizmeta we bikin. Werin deştê ku em baştir alikariya we bikin.” Ew çi tinaz bû looooo. Min ne dizanî bigrîm ne jî dizanî bikenim; hema wilo mam sekinî li naverasta gund de. Çi kesî nedikarî bêje “na!” Peyvên hikumetê, wek çarenûsekê dipejirandin. Di destpêkê de polîs nerm bûn, hêdî hêdî siyaseta xwe hişk kirin. Noker û sîxurê wan jî ku ji me peyda kiribûn, weke wan tund dibûn. Rûyê wan tirş û tal dibû. Êdî gef li me dixwarin û digotin: “Heke hûn neçin em ê xaniyên we di serê we de bînin xwarê.” Bi neçarî, bi bêzarî û bi diltengî me bar kir ji gund. Em çûn Komelgeha Sîba Şêx Xidir. Li wir ne xanî hebûn ne jî stargehek. Xwedê em kaş kirin û têwer kirin. Em tevahî gundî ji gund, bax û bostanên xwe hatin qutkirin. Ya herî girîng jî ev bû ku, em ji çiyayên xwe hatin dûrxistin. Çiya dayîk bûn ji me re. Bi hezaran salan me xwe di hemêza wan de hewandibû. Wan em parastibûn ji hemû xirabî û nebaşiyan. Di hemêza wan de me ol û baweriya xwe parast û pêş xist. Li wir em bûn xwediyê rêûresma xwe ya kevnar. Me exlaq pêşxistibû li gor wijdana civaka xwe. Lê niha em baskşikestî bûn. Em diavêtin çol û çolistanan. Em bûn wekî şêrê kedîkirî di qefesan de.

Di naverasteke dorfireh de me kon û kepirên xwe danî. Ji tîna û germa derizîn lêvên me. Hinekan malên gund xera kirin. Kerpîçên wan xaniyan anîn, ji nû ve lêkirin, di wê çolterê de. Dewletê di destpêkê de qereqola polîsan ava

kir. Piştre, ji bo lêkirina xaniyan, nexşeyek danîn û gotin: “Divê hemû mal mînanê hevdu bin.” Ew bû wekheviya wan ya ku em hêjayê wê dîtibûn. Feqîrî, perîşanî dest pê kiribû. Ji bo çavê me herdem li destê wan be, em bêkar û bar hatibûn hêlan. Tevî derfetên kêm, li vir min xwendina xwe domand. Min heya pola şeşan xwend, lê bêkarî, bêderfetî hebû. Jiyana me ne weke ya gund bû. Lewra min dev ji xwendinê berda. Ez çûm Mûsilê. Li gel hostayekê bûm karker û li ber destê wî dest bi kar kir. Kolana bîran û di gelek karên din de jî xebitîm, ango çi kar diket ber min, min dikir û wisa dema xwe diborand.

Komelgeh avadan bû, lê em jî êdî bi dewletê ve, ji navika xwe ve hatibûn girêdan. Me bê dewletê nedikarî jiyan bikin. Ew xweşikbûna berê, ew jiyana me ya berê ya li gundên me ji me hatibû sitandin û êdî ew tev li paş mabûn. Tenê carna weke xewn û xiyal dihatin ber çavên me, ew bîranînên xweş. Dewlet jî zêdetir di ser me de dihat. Em neçarê leşkeriyê dikirin.

Ez careke din vegeriyam li xwendina xwe ku temam bikim. Min dixwest biçim pola heftan, lê pêşiya min astengek hebû. Dewletê gote min, heke tu nebî endamê partiya BAASê tu nikarî ji vir û şûn de xwendina xwe bidominî. Ew BAASa ku wateya wê “nûjenî” bû, bi vî awayî zordarî li ser welatiyên xwe dida meşandin. Jixwe ji partiya BAASê zêdetir ti partiyên dinê tine bûn li Iraqê. Ez bêçar, bi fermî bûm endamê BAASê lê ev tişt tenê li ser çîzeçîza lênûskê bû. Min heya pola nehan xwend. Dîsa feqîrî li pêşiya min bû asteng û min nedikarî zêdetir bixwînim.

Di 22yê Îlona 1980an de şerê Îran û Iraqê dest pê kir. Ev şerê ku ne serkeftin ne jî binketin tê de hebû, milyonek mirov bûn gorî û nêzî du milyon jî birîndar bûn. Di milê

bûjenî de xusarên bêhesab çêbûn. Heya niha jî xaziyên vî şerî di kolanên me de digerin û bi deh hezaran kes jî winda bûne û nehatine dîtin. Birînên kûr vebûn di giyan û derûniya welatiyan de.

Ez timûtim ji şer reviyam. Min xwe radestî artêşê nekir. Ber bi dawîbûna şer ve êdî zarokên dibistanan jî dibirin şer û didan kuştin. Di wê demê de gelek êzdiyên me reviyan Çiyayê Şengalê. Bi şev bi rengekî nepenî dihatin nava gundan, pêwîstiyên xwe berhev dikirin û dibirin serê çiyê. Gelek caran polîs û leşker bi wan dihesiyan û diketin pey wan û ew jî bi neçarî ji bo nekevin destê wan hov û wehşan her direviyan û berê xwe didan çiyan. Her roj sê, carna jê kêmtir carna jî jê zêdetir cenaze dihatin ji qada şer. Zemawend li bûk û zavayan heram bûbû. Li qadên şahiyan li şûna keyf û xweşiyê, şîn dihat girêdan. Goristanên me mezin, nava dilê me biçûk dibû. Dewlet weke ziyayek devbixwîn li ser me de dihat û em li hember vî mîrateyê wek moriyên piçûk dihatin xwiyan. Wek ji rêbazên dewletan ya herî sereke, ji me sîxur û noker jî peyda kiribûn. Ew ji her kesî baştir dijîn; ji ber ku hogirê dewletê, neyarê gelê xwe bûn.

Ez gihiştibûm temenê xwe yê bîst û heft saliyê. Zewac û avakirina malbatê re dereng mabûm. Malbata min, biryara zewaca min dabû. Mala me û mala Xezalê, ku ez carna diçûm mala wan, li hev kir ku Xezalê ji min re bînin. Ji mehan meha gulanê bû. Li gorî baweriya me, di meha gulanê de dawet nedihatin kirin; ji ber ku meha gulanê bûka hemû mehan e di ser xwe de bûk qebûl nake. Heke çêbibe jî, bêguman qedayek li bûkê yan jî zava peyda dibe. Di dehê gulanê de, Xezalê ji min re xwestin. Em li bendê man ku meha gulanê biqede. Meh qediya û di yekê meha pûşbera

hezar û neh sed û heştê û heftan de, me daweta xwe kir. Ji ber windahiyên şerê Iraq û Îranê me daweteke bi def û zirnê nekir. Me xwarin amade kir, bê deng û his, bi dost û biraderan re xwar û wisa şahiya me bidawî bû.

* * *

Ez im Xezal, bi Xwedêda re zewicîm. Bûkaniya min dirêj neajot. Ez di sala destpêkê de bûm dayîka kurekî. Dawî li şerê Îran û Iraqê hat. Jixwe şer ne yê gelan yê ne-tew-dewletan bû. Dewletan şer kir lê di bin lingên wan de em perçiqîn. Jiyan ji bo me zehmet bûbû. Em neçar bûn biçin di derveyî komelgehê de kar bikin. Me cotkarî dizanî. Lewra em diçûn baxçeyan. Baxçe yên ereban, kedkariya wî jî yên me êzdiyan bû.

Em biharê bi malbatî diçûn baxçeyan. Me pîvaz, bacanê sor û reş û hwd. diçandin. Di milekê de xebata nav baxçe-yan û kar û şixûlên malbatê, milekê din de jî xwedîkirina zarokan hebû. Jiyan li min giran dihat. Her ku sal derbas dibûn hêjmara neferên mala me zêdetir dibûn. Her ku hêj-mara malê zêde dibû barê min girantir dibû. Dema dibû payîz me ji wir bar dikir û em dihatin komelgehê. Birin û anîna malan derdekî dinê bû ku wek dayîkek, şerpezetiya wê min dikişand. Em carna di dora Şengalê de diçûn ser erd, carna jî dûr diçûn. Ji cihên dûr yek jî Rabîa bû. Salên dûr û dirêj gelek malbatên êzdiyan diçûn wî cihî û dixe-bitîn. Me bi keda destê xwe bax û bostan dixemilandin û berhem diafirand. Şînkatiyên cur bi cur bi ked û xwêdana me dibûn berhem û li derdor belav dibûn. Erdên mirî zindî dibûn; ji bêrengiyê vediguherîn pirrengiyê. Di bazaran de keda destê me dihat firotin. Ked ya destê me bû lê hinekên

din difirotin ango me kar dikir bi erzanî lê yên xwedî erd li ser pişta me dewlemend dibûn. Li ber dikanan de reng bi reng bûn hêşînayiyên ku me ew gihandibûn. Heryek ji yê din bi tamtir bû. Dema dibû payîz her tişt diqediya. Çawa ku me tiştek nekiribe, çi kel û mel hebûya me komî serhev dikir û me berê xwe dida komelgehên xwe.

Piştî şerê bi Îranê re rewşa me aram nebû. Dem û dewran diguherî. Bûyer di ser hevdu de dihatin. Komkujiya Helebçe, şerên not û yekê di vî welatî de rû dan. Şerên navxweyî yên kurdan weke birînek bêar nedikewilî. Sala du hezar û sisêyan dîsa her tişt ser û bin bû. Di herêma me de bi temamî pêşmerge bûn desthilatdar. Em destpêkê bi vê yekê pir kêfxweş bûn. Gelek ciwanên me bûn pêşmerge, gelek jî ketin nava artêşa Iraqê. Êdî em nediçûn ser erd û me li bax û baxçeyan kar nedikir. Li aliyek de mûçeyên pêşmergetiyê, aliyek din de jî yên artêşa Iraqê, em ji ax û bereketa vê jiyanê qut kirin. Mêr fêrî paldanê, jin jî fêrî xwarinên amade bûn.

Di demên wiha asayî derbas dibûn de ji nişka ve tofanek hate serê me. Di 14ê Tebaxa 2007an de, hem li Sîba Şêx Xidir, hem jî li Girizêrê çar teqîn bi hev re çêbûn. Bi sedan qurban û birîndar li naverastê man ku ji wana yek jî dayîka min bû. Emerîkiyan, bi helîkopteran, hinek birîndarên me birin ku birînên wan sax bikin. Ji wana yek jî biraziyê min bû û xwediyê du zarokan bû. Ji wan yek kur ya dinê jî keç bû. Heya niha jî em nizanîn çi bi biraziyê min hatiye. Vê komkujiyê em ji xewnek giran şiyar kir, lê me nedizanî divê çi jê bê wergirtin. Neyar, di nava dilê me de li me xist. Em hejandin, bêhêvî kirin. Serok û giregirên me ne di wê astê de bûn ku ji dinyayê fêm bikin. Her yek ji wan bi cihekê ve girêdayî, têrxwarî û ser xwe bûn. Em ên

feqîr û perîşan li ber lingan de diçûn. Aso li pêş me tarî bûbû, lê me nedizanî. Pisîkek, kevokek, çûkek çiqas lewaz be ewqas jî tirsonek e, çiqas tirsonek be ewqas jî xwedî parastinê ye. Qet bêparastin tev nagerin û zû bi zû nabin nêçîra nêçîrvanên xwe. Lê em ên hiş ji serî firdayî, wek bedeneke jixweçûyî, me çu tiştek ji vê rewşa kambax fêm nedikir.. Tîrêjên rojê li me xeyidîbûn. Di asîman de stêrkên me vemirîbûn. Çirayê me pê nediketin. Qubeyên me tarî bûbûn. Em diltevizî bûbûn.

17ê Kanûna 2010an ciwanek bi navê Muhammed Bûezîzî, yê ku endazyarekî bû, li Tûnisê agir berda bedena xwe. Deriyek vebû ji bo firîna ber bi azadiyê ve. Hêviyên gelan dîsa ji nû ve geş bûn. Careke din mirovahiyê li pey şopa heqîqetê ketibû. Hişê civakî, hişê komûnbûnê xwe dabû der. Dem dema serîrakirina ciwanan, werz werza gelan bû. Rûxiyan hinek dîktator û weke gokeke teqandî, bayê wan  çû û daketin xwarê. Li Iraq û Sûrî rageşî pêşket. Ya rastî aloziyek bû. Dibetiyên dîrokî derketibûn holê. Pêşdeçûyin jî paşdeçûyin jî pêkan bû. Dibetiyên demokratîkbûnê jî û yên hovîtiyê jî hebûn.

Lê mixabin, ji bo gel bihara xwe nejîn, hêzên tarî xwe li şer û siyaseta kirêt girtin. Ji ber ku gel bê rêber, bê bîr û bawerî bûn, nedikarîn bîrdoziya xwe bi ser bixînin. Tenê vereşandina ji kerban di dilan de cih girtibû, û ew jî bi kêr nedihat. Ji xeynî vî, rêxistin pêwîst bû. Hember lewaziyên wiha curbicur, zilhêzên dinyayê ketin qada şer. Rêxistinên çeteyî afirandin û weke keviran di ser serê gelan de barandin. Bihara Gelan bûbû qirkirina gelan û serûbinbûna jiyana wan. Kirin weke lîstokeke şanoyê. Li ser dikê, desthilatên dewlet-netewan û çeteyên xwînmij hebûn. Di milekî de li asîmanan çekên herî pêşketî, di milekî de, di destê

çeteyan de şûrê kevnar hebûn; ji bo kuştina gelan û belengazan. Di nava çend salan de bajarên hezaran salan hatin rûxandin. Bi milyonan kuştin çêbûn. Gelên Rojhilata Navîn ên kevnar kirin penaber û di deryayan de xeniqandin; ji şîrî heta pîrî zarok û pîrên me yek bi yek ji nava me birin û êdî ew nema vegeriyan. Bi wêne û dîmenên me tîrajên rojnameyên xwe zêde dikirin hinekan. Bi kamerayan êşên dilên me digirtin û ev dibûn sedema hildana xelatan. Kesî ji dewlet û hikumeta xwe re ne digot, ew çi lîstokeke ecêb e, ma êdî ne bes e.

Hinek zarokên dayîk û bavan ji rêyek dûr û dirêj hatin, xwe gihandin me û dixwestin birînên me bipêçin. Xwîna xwe rijandin li ser axa me û tev li karwanên şehîdan bûn ew canên bedew û şîrîn. Me bi tilîlî şandin termên wan cangoriyan. Me ew ji vî welatî ber bi welatên wan ve oxir kirin. Ew bûn em, em bûn ew. Divê gengeşiya bêaman de têkilî xwîn û xwîdana me bûn.

Piştî komkujiya du hezar û heftan, siberojeke xwînî gav bi gav hate pêşxistin. Fermaneke nû di ser serê me de dianîn, bi nepenî, xayintî û bêwijdaniyê. Piştî di rojekê de ketina Mûsilê, çokên me lerizîn. Tilefer ket û şûn ve Tileferî hatin gihîştin me, şîa û tirkmen bûn ew. Me ji devê wan guhdarî kir. Qala yên bi al, cil û rûyên wan reş dikirin. Mîna pêlekê ji deryayê her tişt dida li ber xwe, herî zêde jî keçik binpê dibûn; keçikên delalê dayîkan, siberoja civakan. Ew bi lorik û kilaman dihatin mezinkirin, evînên li ber dilê xortan bûn ew. Lê mixabin, dest diavêtin wan, pîs û qirêj dikirin. Ya herî kembax jî, mêr bêşeref û bênamûs dikirin. Îrade dişkest, ruhê teslîmbûnê pêş diket. Demek piştî fermanê re, hinek ji me dibûn destebirakên kûjerên xwe û dikaribûn bi wan re bibin yek jî.

Piştê çeteyên hov Tilefer girtin, me dizanibû êdî dor hatiye me. Hinek malbatan dixwestin bar bikin ber bi welatên jorîn ve. Lê nehêlan û pêşî li wan girtin. Ji bo derbas nebin belgenameyên fermî ji wan dixwestin. Bi neçarî gelek malbat vegeriyan. Me nedizanî riya bazdanê jî li me hatiye girtin. Yên ku qaşo parêzvanê me bûn, digotin: "Qet netirsin, ew ji bo me  nehatine. Wane şerê hev dikin û tiştek bi me nakin. Heke şer rû bide em li pişta we ne, em we bi tenê nahêlîn û em ê we ji hemû êrişan biparêzin." Hinekên ji me digotin: "Em êzdiyên belengaz in ma dê çi bi me bikin." Hizirîn û pêşdîtinên me tewş bûn. Haya me ji dinyayê tine bû. Em hem hay ji dinyayê bûn hem jî me tu tişt jê nizanibû. Mirovên dîtî pê dizanin ku ger lêhiyek rabû her tiştî dide ber xwe. Lê yên di qesran de rûniştî bêxem bûn. Maldariya dinyayê kor kiribû çavên wan û ew ji tu tiştî têr nedibûn. Yên digotin ku em li pişta we ne, em ê we biparêzin, em firotibûn bi bêbextî. Di pişt me de xencer li pişta me dabûn, lê me nedizanî. Xiyanet! Axxxx dayê xiyanetttt! Me careke din dît, lê em dereng mabûn. Ma di nava kîjan komkujiyan de, destê xiyanetê tine bû? Ma bê xayînan ferman dikare were serê me?

Êvara Cejna Çile ya Havînê bû. Me xwe amade dikir ji bo cejnê, ji bo kêf û şahiyê. Pişt re weke her êvar, wê êvarê jî em razan. Em bêagahî bûn, lê di dilê me de sed tirs û xof û guman hebûn. Em li ser textên ser xaniyan radizan. Em duduyê şevê de bi dengê kalaşnîkof û doçkayan şiyar bûn. Hîn ew nehatibûn û negihiştibûn me lê, dengê mirinê, dengê axîn û nalînan, bêhna qirkirinê, ji kûr ve dihat poz û guhên me. Em ji nav nivînên razanê ji nişka ve derketin. Mêran berê xwe dan satirê ku di berê de hatibû çêkirin. Mêrên biçek û hinek jî bêçek pişt satirê sekinîn û ketin nav pevçûnê.

Yên ku digotin netirsin, em li pişta we ne, ji zû ve dest bi bazdanê kiribûn û em bêparastin hiştibûn. Di nîvê şevê de, hê zarokên me di xew de, ewan terka me kiribûn û em di nava lepên hov û wehşan de hiştibûn. Pêşmergeyên ku qaşo di pêşiya herkesî de diçûn ser mirinê ku pêşmêr bûn, vê carê ber bi paş ve, ber bi xiyanetê ve, ji beriya herkesî baz dabûn û çûbûn. Êdî navê wan bûbû "paşmerge". Ew ne pêşmergeyê revok bûn. Ji ber ku em bêjin pêşmergeyên revok bûn û peyva pêşmerge bikar bînin, em neheqiyê li dîroka pêşmergetiya berê û hezaran pêşmergeyên şehîd dikin. Ew çekdarên hinek partî û siyaseta wan bûn. Di fermanê de, tenê pêşmerge em nehêlan, leşker û polîsên ku di warê ewlehiya welatiyan de wek şêran bûn, wan jî bi wan re dan rê û çûn; li pişt xwe nemeyzandin, wisa bazdan ku roviyan li ber wan şerm kirin. Ew tev misilman bûn, yên ku em, yên êzdî hiştin di nav lepê hirç û hovan de.

Lehengên me li ber xwe didan, lê bedena bê serî bi kêr nedihat tu carî. Serok û serwer pêwîst bûn, lê em ji wan bê par bûn. Pevçûn dewam dikir, lê em bêçarî li qadê bûn. Me nedizanibû xwe komî li ser hev bikin; gelo me baz bida yan em bimana! Dawî li kêliyên tirs û xof nedihat. Heftê û du ferman dihatin ber çavên me û em bêhiş dibûn. Xwîna berxên nêr dihatin ber çavên me û min li zarokan nihêrî, keçên destavêtî, cilçiriyayî dihatin li ber çavên min û min li keçên xwe nihêrî. Belengazî û perîşanî, ya herî girîng jî bêçarî wek ewrekî giran di ser me de hatibû û me di nava tarîtî û bêzariyê de hêlabû.

Di satir û qenalan de bêfîşek mabûn mêrên berxwedêr, yên xwe kirin mertal ji bo parastina Êzdîxaneyê. Hinek ji wan şehîd hinek ji wan birîndar bûbûn, lê dest ji çeperên xwe bernedabûn. Wan dizanibû heke çeper bişkên, wê tev

zarok û jin bikevin destan û di bin lingên wan hov û gûran de werin perçiqandin. Pêşmerge, polîs û leşkeran, di zû de, riya xwe girtibûn, ber bi bêkerametiyê ve çûbûn, bê ku yek çirk jî zarok û jinên Şengaliyan bihizirin. Gelo ma ew bi xwe ne xwedî malbat, ne xwedî jin û zarok bûn, ma hindik jî be wan ji keramet û şerefê tu parekê negirtibûn, ma qasî misqalekê wijdan û dilsojî bi wan re nemabû? Dema çûbûn, çekên xwe jî bi xwe re biribûn. Ji ber wê jî bêçek mabûn egîdên me. Di nêzî berbangê re, ji ber xilasbûna fîşekan, şikestîbûn û bêtaqet mabûn berxwedêrên me. Roj hiliyabû li ser welatê min. Lê ev roj ne mîna rojên berê bû. Ev ronahî û şewq ne mîna rojên berê têhn û şewqa ji bereketê bar kirîbû, lê ev roj dişewitand erd û axa herêma min a pîroz. Sor kiribû axa bav û kalên min bi xwîna gelê min ê qedîm. Hov û nemirovên sedsala bîst û yekê li ser termên me re hatin û derbasî nava komelgehan bûn. Berbanga sibê bû û demjimêr heft û nîvê sibehê rave dikir. Sûka bajêr û avahiyên fermî yên berê, cih û warê kesên ser serê me xwe mezin dikirin, hatibûn dagirkirin. Bextê mirîşka bêserî li me hatibû, û em li erdê di nav xwînê de digevizîn.

Xwedêda berê xwe da erebeya xwe ya ji hev de ketî. Me got; “Em bêminetî baz bidin.” Lê carek bêşansî dest pê kiribû û erebeya kembax jî li me xayîn bûbû û nexebitî. Me di nava bêzariyê de li çavên hevdu dinêrî. Ne girî ne ken, ne hêvî ne jî bendewariyên me mabûn. Em şaşo maşo bûbûn û me nema dikarî gavek jî ber bi pêş ve biavêjîn.

Şaxewan, yek ji kurên min e. Bejna wî zirav, ne dirêj ne jî kin e. Porreş û qemer e weke min. Ken li ser lêvên wî tu caran kêm nedibû. Çavên wî hurik û bûriyên wî lihevhatî ne. Carna li zarokan dinêrî carna li min. Dema ku li keçikan binêriya, serê xwe li ber xwe de xwar dikir, ji şerman serê

wî ranedibû. Di dawiyê de gote bavê xwe; “Ez vana di destê çeteyan de nahêlim.” Zarokên min ên biçûk girtin ba xwe û li gel dost û biraderan siwarê maşîneyan bûn û çûn. Em ên ku me bi salên dûr û dirêj xulamtiya wan ereban kiribû, vê carê em bûbûn nêçîra wan. Em kirîv, cîran û dostên hev bûn, lê wan tu carî xwarinên me nedixwarin. Em mabûn di nav lepê wan de, çi bixwestana dê bianiyana li serê me. Me nedizanibû ji destê van kafiran mirin baş bû, yan bazdan.

Serê sibê bû, ji nişka ve her kesî baz da bêser û ber, bêyî hay ji rêç û xelasbûna xwe hebe. Hinekan bi maşîneyan, hinekan bi pêyan, hinek rê û rê direviyan, hinekan dabû nav erdan. Em hemû ber bi çiyayê xwe ve direviyan, çiyayên ku her dem bûne stargehên me yên demên bêeman. Ev fermaneke din bû ku careke din li me rabûbû. Hinekan bi cilên şevê dabûn rê. Hinek bêpêlav bûn û hinek jî bigopal. Gorrên miriyên me li dû me man, bîranînên me tev li pey me man, axa me ya zîv û zêr tev di lepê gûrên devbixwîn de man. Ya herî girîng bi hezaran keç û jinên êzdî, bi hezaran xort û kalên êzdî di nav lepê hov û haran de man û me ew li pey xwe hiştin û em ketin ser rêyeke nediyar û bêdawî. Zêr û zînetên me, qesir û serayên me, xanî û banên me hemû dewlemendiyên me ku keda bi salan yên destê me bûn li pişt me man. Yên herî dewlemend bigire heta yên herî hejar di heman rêkê de ji ber mirinê direviyan. Me nedizanî di pêşiya me de jiyan heye yan na….

Min û Xwedêda, me gelek zehmetî kişandibûn, lê ya vê carî cûda bû. Kokqelandinê dest pê kiribû, bê destûr û bê zagon. Sînor tinebû ji hovîtiyê re. Ya dihat serê me ferman bû ferman, fermana heftê û siseyan. Di heftê û du fermanan de, em tine nebûn. Lê em birîndar, lê em derbeder bûn. Em gevizîn di ser hevdu de, em piçûk, em bêqîmet bûn.

Me dabû rê, dijmin jî dabû dû me. Berê me ji deştê ketîbû çiyê. Me dixwest bi zûtirî xwe bigihînin wan çiyayên ase yên ku di raboriya dîrokê de ji bo bav û kalên me bûne stargeh. Lê mixabin, dijminên hov û bêwijdan doçkayên xwe yên lûledirêj di ser me de girêdabûn û bi xedarî, gûle di ser me de dibarandin. Carna hinek ji me diketin erdê, dibû nale nala wan, em li xwe venedigeriyan ka birîndar in yan mirî ne. Ji ber ku her kes ketibû derdê rizgarbûna xwe ya ji mirinê. Ji lew re em li pey xwe nedizivirîn. Lixwevegerîn yan jî çûyîna bi hewara yên di şûn de diman, negengaz bû. Ji ber ku gûrên devbixwîn bi lez û bez nêzî me dibûn, gavek ber bi paş ve, mirin bû, gavek ber bi pêş ve, hêviya jiyanê zêde dikir. Ji lew re heya ku ji me dihat me gavên xwe ber bi pêş ango ber bi hêviya jiyanê ve diavêt. Bi vî rengî bi êş bû reva me, ewqas bi êş bû ku mirov naxwaze ti carî bi bîr bîne; de ka hûn bihizirin, li pey te hewar û gaziya birîndaran, nalenala dayîk û kalan, lê malik mîrata DAIŞê nedihêla em li xwe vegerin.

Di navbera Sîba Şêx Xidir û gundê Werdiyê de em li deşt û çolan, li newal û girikan wer dibûn û bi wî awayî, em ji mirinê direviyan. Bîna me diçikiya û devê me ziwa dibû ji tînan. Êdî carna me nedikarî gavek ber bi pêş ve biavêjin. Em bi temen, em dayîk, em zarok, em ji hemû beşên mirovan yên bêçare bûn. Em zarokê li ber himêza dayîkê, em pîr û kalên li ser pişta ciwanan û em zarokên destê wan di destê xwişk û birayên wan de diçûn, diçûn û her diçûn. Lê çima xilas nedibû ev rêya kambax! Çima bi dawî nedibû ev rêya dûr û dirêj! Em bêhêvî, dilşikestî, lêvqelişî û bêzar bûn. Êdî çokên min ranedikir laşê min. Ez pîr, ez kal bûm. Ez bêhêz û bêtaqet bûm. Lê ez naçar bûm. Lewra dimeşiyam, dimeşiyam û her dimeşiyam. Di rê de qeza çêdibûn,

maşîne li hev diqelibîn û ew roj weke roja mehşerê bû. Gelek biwijdan bûn, hê damarên mirovahiyê bi wan re mabû û alikariya hev dikirin. Lê hinek tenê xwe difikirîn, weke yên em di nav lepên wehşan de hêlan baz didan, bê ser û çav direviyan. Hinek dilrehm bûn, alikariya kal û pîran dikirin. Lê hinekan jî ew di cih de dihêlan û baz didan. Di vê tengasiyê de gotina bav û kalan ku digotin; "Di navbera mêranî û qelsiyê de bostek heye." dihat bîra mirov. Belê, min ew roj vê mêranî û qelsiyê bi van her du çavên xwe dît. Jixwe beriya wê bi hezaran ên xwe wek mêrxas bi nav dikirin, me hiştibûn û çûbûn, ew xayîn bûn, ji wan re ne xem bû hebûn yan jî nebûna me; bes ên me, yên me çima wisa nêz dibûn, çima li hev xwedî dernediketin! Ax ax çi zehmet e û çi zor e aqilê pişt re bişixule, me bi çavan dît lê me bawer nekir, me xeterî dît lê me got ew dost û bira ne, ma wê çawa me bihêlin û biçin. Lê em çi bikin, ew çûn û çûn û bêyî li pey xwe vegerin hîna diçin.

Ber bi êvarî em gihîştin gundê Werdiyê. Wê şevê em man li gel nasên xwe. Zarokên min li gel min bûn. Em û ew di vî gundî de gihiştin hev. Ev gundek giran bû, lê dilê gundiyan sivik û lez û bez lê dida, serê wan bi xem û gumanan tijî, ên bêhêvî û bêxwedî tenê em bûn. Em bêçare û bêzar bûn. Me nedizanî wê heya sibê çi bibe û çi nebe. Gelo em biçin, ji vir jî dûr bikevin û her biçin, ev pirs heya demekê di serê me de her diçû û dihat. Heya nîvê şevê, destê me ser dilê me, çavekî me girtî çavekî me vekirî, herdu guhên me ji kûr ve bala xwe dabû bêdengiyê; gelo dê dengek bê an na. Heya berbangê zarok nîvrazayî nîvxewde bûn, lê xew bi çavê me neket, em wisa di hizir û bîrên kûr û giran de şiyar man. Bi derketina stêrka berbangê re me xwe da hev. Ji ber ku yên dihatin ser me tarî bûn weke şevê. Lê

pêdiviya me di şevên tarî de bi stêrkan, di berbangê de bi stêrka berbangê, bi bûyîna rojê re bi derketina rojê hebû. Ronahî, ronahî, ronahî!.. Êdî me qet ji taritiyê hez nedikir. Ji ber ku pêwîstiya me tenê bi ronahiyê hebû. Lewra em di şevan de pê dixin çirayê di qubeyên xwe yên bi tîrêjên rojê pêçayî de. Periyên me hene ax periyên me, kesk û sor û zer. Ew xemla qubeyên me ne. Xemla erd û asîman in, xemla keç û bûkan in. Ji ber ku kesk û sor û zer in.

Bi derketina tîrêjên sibehê re dem guherî, lê ne tenê dem, pê re dewran jî guherî. Dinya serobino bûbû, çete ji heft parzemînan bi çaralî li ser serê me kom bûbûn. Ji Çeçenîstan heya Moxolîstan, ji Ewropa heta Amerîka, ji erebên paşverû yên tu caran nebûn hevalê ti kesî, tev li me hatibûn hev, mal û milkê me talan kiribûn, zar û zêçên me bi xwe re biribûn, ciwan û zilamên me bêserî hiştibûn û mala me di serê me de anîbûn xwarê.

Bi derketina rojê re çete ketin gundê me. Nizanim çima, lê me baz  neda. Giregirên eşîretan kom bûn li meydanê. Gotin: “Ji bilî ola me, hûn çi bibêjin bila weke we be.” Ew çeteyên hov û wehş bûn, bêwijdan û bêsînor bûn. Li cem wan nebû ne şeref û ne namûs, bi wan re nebû ne exlaq ne keramet. Ji ber wê her çavê wan li bêexlaqî û xirabiyê bû. Lewra serçete di kêliyên destpêkê de çav berdabû du xwişkên ji malbatên xwe qutbûyî. Wî got: “Ez her duyan ji bo xwe dixwazim. Ew êdî dê bibin jinên min.” Giregiran lava kirin. Ji neçarî pesnê ereb û Erebistanê dan. Ji bo wan bêşerefan, qala bişeref û binamûsbûna wan kirin.

Ên me, yên navê wan giregir û pêşeng bûn, lê ew bêmejî û bêhiş bûn. Ewqasî fêm dikirin û ewqas bû zanebûna wan, ma em çi bikin! Ew gotinên giregiran tev vale çûn. Giregiran tenê ji xwe re axivîn û dilê xwe rehet kirin. Ji lew

re, serçete bê li wan guhdarî bike, qîrek da wan û ji wan re bi zimanekî vekirî got: “Keçên we, bûkên we, jinên we ne yê we ne êdî.” Vê carê dest pê kiribû, nalenala keç û jinan. Qîrîn, gazî û hawara keç û jinan Çiyayê Şengalê dihejand. Ji wir dengê wan digîha Çilmêran, yên parêzvanê Şerfedîn û wisa deng digihîşt Şerfedîna pîroz. Ma ne ew Çilmêr bûn di demekê de rizgar kiribûn şeref û kerameta me. Niha dem bû, şêr pêwîst bûn şêr, weke wan Çilmêran.

Li çiyayên jorîn hate bihîstin, dengê keçik û bûkan. Hewar û gaziyên wan digihîşte erş û asîmanan, digihîşte çiyayên Herekola Mîran, Cûdiya miradan û Gabara Egîdan.

Wê rojê li me bû êvar, taritiya şevê xwe berdabû xwar, bêdengiya mirinê li me wer bûbû. Giregiran nûka gotin: “De ka rabin baz bidin, biçin xwe rizgar bikin ji destê van hov û haran, ji destê van bêşeref û bêexlaqan.” Jixwe tişta ji me dihat ew bazdan bû, heke ew jî carna bi destê me biketa. Lê bazdana bêdawî û mirov nizanî heya kengî bû. Weke keriyan, beş bi beş em ji gund derketin û me baz da, lê kes ji me nedizanî em ber bi ku ve baz didin û gelo em ê biçin ku derê. Carek em bi xwe hesiyan. Me deşt di şûn xwe de hêlaye û em bi hezaran gihiştine palên Çiyayê Şengalê. Me baş dizanibû, ew kêliya ku bi me bihesin me baz daye, wê bikevin pey me wan bêbav û bêwijdanan û jixwe wisa jî kiribûn. Carinan di şevên tarî de ronahiya maşîneyên xwe didan aliyê bazdana me û dema dizanîn nagihîn me, vê carê bi doçka û hewanan bombe û gule dibarandin di ser serê me de. Di ber pala çiyê de, di nav wan kevir û daran de, ma kî dizanî êdî, kî ket, kî ma! Ez û Xwedêda, bi keç û xortên xwe, bi lêdana dilê me û bi çikîna bîna me, em hildikişiyan û hildikişiyan ber bi lûtkeya çiyê ve. Lê mixabin yek ji me

qetiyabû û di gund de li gel malxalanên xwe mabû. Lê me nedizanî çi bi serê wî hat û rewşa wî çibû niha.

Wê şevê me xwe da newalekê. Êdî taqeta rêveçûnê bi me re nemabû. Her yekî ji me bi şêweyeke bêserûber, li aliyekî xwe dirêj kir, di nava wan keviran, li binê wan daran de. Em ranedizan, lê em ne şiyar bûn jî her wiha. Carna ji westanê û ji ber bêzariyê çavên me germ dibûn û xewê dilê me dorpêç dikir, carna jî tirs û xofa mirinê ji nişka ve me şiyar dikir û xewa me diherimandin wan hovên nemirov. Di wî halî de em man heya derketina tîrêjên tavê ji aliye rojhilatê çiyê ve. Tîrêjan li kêleka me dixist. Ewilî ne bilind bûn ew, bi qasî bejnekê bûn. Hêdî hêdî roj bilind bû hat gihişt ser serê me û bi tîrêjên xwe yên germ û dijwar hebûna xwe bi me dida hîskirin. Tîrêjên rojê zer bûn, zerda zêrîn. Weke porê şehkirî yê delalekê bûn. Gotegot pir zêde bûn, telefon ranediwestiyan û herkesî pirsa mirov û kesûkarên xwe dikirin. Hinekan radigihand ji giregiran re, ewan digot: “Bexdadî ferman daye. Heke êzdî bixwazin dikarin bêne misilmankirin, lê bi zorê kî êzdiyan bike misilman ez ê destê wan jê bikim.” Giregiran û bendeyên wan digotin: “Jixwe em bi dilê xwe nabin misilman.” Telefon nedisekinîn, lê didan bê navber. Kirîv û dostên me yên berê çûbûn li gel çeteyan. Lewra dizanibûn telefonên me. Wan digot Emîr dibêje: “Bila werin, telefon û çekên xwe radestî me bikin. Em ê tiştekî bi wan nekin. Nexwe em ê êrîş bibin ser wan.” Bawer kirin giregir û êzdiyan. Mixabin çeteyan amadekarî dikirin. Bi radestkirina çekan em ê hêsantir bihatana kuştin. Bi radestkirina telefonan dê kesî nizanibûya ka çi bi ser me de hatiye. Êzdiyan careke din berê xwe dan Werdê û çûn. Paşê careke din bazdan, lê êdî dereng bû, hinek ji wan dîl ketin destê wan çeteyên bêbav.

Xwedê em şaş, em bêhiş, em gêj kiribûn. Lewra me carna ji dijmin, carna jî ber bi dijmin ve baz dida. Carna ber bi jor, carna ber bi jêr ve.

Xwedêda gelek hewil da û got: "Êzdîno neçin, hûn ê bêne kuştin." Lê wan guhdariya wî nekirin, çûn û niha gelek ji wan bêser û bêşûn in. Me xwe berneda deştê û di quntarên çiya re berê xwe da Sikêniya Jor. Em bi şev meşiyan û ber bi beyanî re gihîştîne gund. Gund yê Xwedêda bû. Lewra zaroktiya wî dihat li ber çavên wî. Dar bi dar, kevir bi kevir, gir û newal, yek bi yek bi me dida nasîn. Çiqas bîranînên wî hebûn, bi vegotinê dawî lê nedihat. Di gund de em ne tenê bûn. Yên weke me jî hebûn û yên ji me cûdatir jî. Ya herî baş di gund de av hebû. Her çiqas kanî çikabûn jî, ji bîran av peyda dibû. Ava pîroz, ava ku jê re dibêjin ezîz. Belê, di rojên wiha de baştir fam dibe ka av çiqas ezîz e. Av ji bo zendiyan jêneveger e. Bax, bostan û fêkî pê digihîjin. Av pakijî ye, me xwe pê pakij kir. Lê belê çand û exlaq, bi taybet jî yên hinekan, pir pîs bû û bi avê jî paqij nedibû.

Roj çû ava, tarî kete erdê. Saet bû nehê şevê. Ji dûr ve sê sertav diyar bûn. Hêdî hedî nêzikî me bûn. Çend gav mabûn bigîhin me, wê demê gotin: "Êvara we bi xêr be." Me bersiv da û got: "Êvara we jî bi xêr be, kerem bikin rûnin." Beriya ku rûnin yek ji wan hate rûyê min û  keçikên min jî maç kirin. Em maçî kirin bê ku me nas bike û bêsedem. Keçikek bû, bi cilên leşkerî yên deq bi deq, biçek û rext bû. Her duyên din mêr bûn. Em hemû rûniştin bi çember û çarmêrkî. Ji her du mêran yekî dest bi axaftinê kir, bi devoka me. Me eşîret û nasên wî pirsî. Ji eşîreta me bû, ango Qîranî. Ji dûr ve dibû mirovê me. Wî, beriya ku rabin, ji me re got: "Êdî hûn di ewlehiyê de ne. Em nahêlin çete pêşdetir werin. Bedela wî çi dibe bila bibe, em ê we biparêzin. He-

valan rêyek vekirine. Hûn dikarin herin Kersê û berê xwe bidin korîdorê û biçin heya Rojavayê Kurdistanê."

Wê şevê em li cihê xwe man û me hinek xwe da hev ji bo meşa dirêj ya li pêşiya me mayî. Bi berbangê re me firaqên xwe tijî av kirin û piştre em ketin rêya xwe. Heya tav derneket em nesekinîn. Bi derketina tavê re me navberek da. Li derûdorê xelkên din jî hebûn. Wana jî hewl dida ku çiya biqulipînin û derbasî rûyê din bibin. Ez li ber kevirek sekinîm û min dest bi duaya serê sibê kir. Min got:

*"Mahdera Şêşims mahdera xêrê ye*
*Mahdera Şêşims mahdera rehmê ye*
*Mahdera Şêşims mahdera îmanê ye*
*Amîn amîn amîn amîn amîn amîn*
*Tibarek Allah û dîn*
*Tifaq el tifaqîn*
*Şêxê Hesen dereca xaliqîn*
*Qebîbilbanê ji qedîm, hîmeta Şemsedîn û Fexredîn û Nasredîn û Sicadîn û Amadîn û Babadîn*
*Şêşims quweta dîn û Sultan Şêx Adî tance ji ewil heta bi axirîn*
*Tu xêr î, tu xêra bidî, tu şeran wergerînî heq hemdila heqe ya Rebil alemîn*
*Berî ku roj zeriqî, nûr bi nûrê tifiqî, melek Emrîn hat û tê şefiqî, me şîrine te xaliqî*
*Sibe bû rojê da beyana*
*Nav û dikarê Şêşims eleyk silam e*
*Şewqa Şêşims dabû çarde tebiq erd û asîmana*
*Ya Şêşims tu li me bibî xwedan e*
*Sibe bû roj hiltê ye*
*Me şik nîn e navê Xwedê ye*

*Ya Şêşims her siba her siba*
*Me yek e sidik û heye îman e ji te û nav û dîkar û dîndarê te divê*
*Me yek e sidik û heya ji Şêşimsê xwe divê*
*Ji malê heta malê Şêşims e xwedanê sê qalê*
*Em Şêşimsê xwe nabirin xeyalê*
*Ji derecê heta derecê, Şêşims e xwedanê ferecê*
*Dest û damin Şêşims xwe tewaf dikim*
*Şûna birga kahbetilahê şerîf û şûna hecê*
*Sitûnê heta sitûnê çil mifte hundir û xezînê*
*Şêşims e dide dest xwedan marîfeta û nasînê*
*Ji çav heta devî mohra Şêşims lê dikeve*
*Me ra meleka germ e li gel me ye germ e nahêlî ti binivî*
*Ji devî heta bi çava mohra Şêşims geriya li nava*
*Ya Şêşims me bi te silav e*
*Ya Şêşims ba li ba te ew saet e û ew gav e serî heta piya*
*Ya Şêşims te ez neqişandim te ez danîme ser rêya*
*Em Şêşimsê xwe nabirin hêviya*
*Hêviya wî zor hêvî ye*
*Ya Şêşims ez hatime ser vê xizmetê*
*Ya Şêşims tu li  min veke deriyê rehmetê*
*Ya Şêşims tu ronahiyekê bidî ber min û çendî ehlê sunetê*
*Sunet ku sunet e azebûne kêm taqet e Şêşimsê xwe bi înet e*
*Sunî ku sunî ne zebûn û mandîn e Şêşims yê xwe bi hêvî ne*
*Ya Şêşims tu yî banga tu yî mahdera*
*Tu yî li gel ezîza tu yê gel rêbera*
*Erkan sekinî li ser milê qelendera*
*Ya Şêşims me bi te nav û dikar û dîndarê te mefer e*
*Ya Şêşims tu bang û gazî û hewara me re were*
*Ya Şêşims tu yî ya hawara tu yî ya  gaziya*
*Tu yî  gel ezîza tu yî  gel rêwiya*

*Erkan sekinî ser milê edewiya*
*Ya Şêşims me bi te û nav û dikar û dîndarê te hêvî ye*
*Ya Şêşims tu hêviya me beyî zuy e*
*Mala Şêşimsê min ê mîra serê kaniya şêx û pîra*
*Ya Şêşims tu kesê me yê sinetê, babê derwêşa û feqîra*
*Ya Şêşims tu rêberê rêya yî*
*Ya Şêşims tu cebarê şikestiya yî*
*Ya Şêşims tu delîlê heyiya yî*
*Ya Şêşims tu mefera bê mefera yî*
*Ya Şêşims tu fereca xêran î*
*Ya Şêşims tu berevanî qeda û belan î*
*Ya Şêşims ti xwedanê risqan î*
*Sê hezar û sê navê Xwedê, mezin û şêrîn û heq in, temam in*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê Tawûsê Melek kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê navê Tawûsê Melek kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê sê hezar û sê navê Xwedê kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê li wehdaniyê kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê muqamere kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê el erşat ezîm kî*
*Ya Şêşims tu miraza min hasil bikî*
*Ya Tawûsê Melek ti miraza min hasil bikî*
*Şêşims nurîn e*
*Ser kursiya zêrîn e*
*Kilît û mifte destê wî de ne*
*Vedike derê zor xezîne, xelata jê dertîne, sunetxane hêvî ne*
*Ya Şêşims tu dermanê hemû birîna*
*Ya Şêşims tu hemû birîna derman bikî*
*Em kêm in Xwedê temam e."*

Piştî ku min diaya xwe temam kir, em gelek nesekinîn û em ketin ser rê. Rêveçûna me dewam kir, heya ber bi nîvrojê. Êdî dinya germ bû. Di bin dareke mazî ya koksitûr de em rûniştin bi malbatî. Ava ku me bi xwe re anîbû me vexwar û pê re jî me nanê tifsî xwar. Xwedêda telefona xwe vekir û telefonî Berxwedan kir. Ew Berxwedanê zarokê min yê yekemîn, roniya çavê min, ezîzê li ber dilê min bû. Lê belê telefona Berxwedan di destê çeteyan de bû. Lewra êdî me nedizanibû ka çi bi Berxê min, bi şîrînê li ber dilê min, bi Berxwedanê min hatiye. Ew parçek ji canê min ku min bi salan bi destê xwe pir bi delalî ew mezin kiribû, di rojekê de ji destê min çû, ber bi çarenûseke nediyar ve. Bîna min gelek teng bû û ez pir bêçare bûm. Ez ji bin darê derketim, çûm li ber kevirekî. Min destê xwe ber bi rojê ve dirêj kir. Tîrêjên rojê rasterast diketin nav çavên min û nav kefa destê min. Min kesereke kûr kişand û bîna xwe berda. Min xwest bi keserkişandin û bînberdanê ve kul û kederên hundirê dilê xwe hemûyan derxim, lê min nedikarî û min dest bi diayê kir:

*“Mahdera Şêşims mahdera xêrê ye*
*Mahdera Şêşims mahdera rehmê ye*
*Mahdera Şêşims mahdera îmanê ye*
*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Hesenî Zer Baba û Def û Şibaba û Quds û Mekke û Medîne û Kabê*
*Êzdîn emîr babê baba mezinê çendî Sehaba*
*Ya Şêşims, tu me sitar bikî, tu me xwedan bikî, ji qeda, ji bela, ji taf û tufana, ji nebûyan, ji bêbextiyan, ji bûxtanan*
*Ya Şêşims tu hêviyên me û ruhê Êzdîn li dîwana Xwedê bikî*
*Ya Şêşims tu mebi  xatirê dura sipî kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê padşayê bêrî kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê heq nefesa Sultan Êzî kî*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn li dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu min bidî bxatirê Melekê Şerfedîn û Xêrê Sabîla û Şerbik û Çira û Perî û Qendîla*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê derg û dîwanê Siltan Şêx Adî kî*

*Ya Şêşims sê hêvî me ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu me bidî xatirê melekê ber rojê û Ezraîl û Cebraîl û Dordaîl û Ezrafîl û Ezazîl û Mixayîl û Mikaîl. Ew in her heft melekê kibîr ew in xasê berî çendî bedîl*

*Di destê wan de ne mifte û kilît, sekinîn qaf û qenser Hezretê Melekê Celîl*

*Ya Şêşims tu me û ruhê Êzdîn neke ji bîr*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn tu ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu min bidî bi xatirê Çawîşê Şêşims, Melek û Mişterî û Bercîs û Adil û Meryan û Eshad*

*Ya Şêşims tu min bi xatirê Mîr Emadîn û qedîm li ban kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê heca û medrûm kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê mendê Şerîf û mendê toqil kî*

*Ya Şêşims sê hêvî me û ruhê Êzdîn tu ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu min bidî bi xatirê Îxtiyarê Mifî û sir li pê pira selatê û Hadir û Nadir û Qadir û Cengel û Cabrîn û Fal Kerîm û Qesra Cewher el Alî û cewher binyad meleke feynî*

*Ya Şêşims tu min bi xatirê Umranê Hindî kî*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Mizde eydana meleka û Derwêş Qazan û sekinî li ser darê meleka û mala Adiya û pîrê li bina nefesa Siltan Êzdîn e Şêx Fexrê Adi ye û Şêx Mend Nasredîn û Mîr Sicadîn û Sitya Ês û Pîra Fat û Xatûna Fexra û Rebîa edewî û zim zim qubil bi dor*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê Êzdîn û Êzdîn Emîr kî*

*Ya Şêşims sê hêvî me û ruhê Êzdîn ti ji dîwana Xwedê kî*

*Ya Şêşims tu me bidî bixatirê Kaniya Spî Seyd el Kewin û hewdil kewdil û bûkir û El Bûkir û nobedarê qedîm û berê Şêx Ahmed û Kekê Şêx Şeyela û Pîr Mendî Gor û Delîl el Bahir û Zincer el Wereq û Meşhel Fira Tawûsî Melek*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê her heft Kurê Pîrêkî û dergehê mîr mîra Emadîn kî*

*Ya Şêşims sê hêvî me û ruhê Êzdîn tu ji dîwana Xwedê kî*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Indirîsî Xeyat û Banê Erşa û Bilalê Hebeş, Axa û Qelendera û Şêx Mihemedê Harûnî û Melek Zeyn û Melek Zîn*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Melek Fexredîn û her çil mêrê ber sicadêkî*

*Ya Şêşims sê hêvî me û ruhê Êzdîn ji dîwana Xwedê kî*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê cels û rewaqê Şêx Adî û Pîrê Kuza û Pîrê Kemal û Pîrê Mencermafî û Şêxê Siwara û Reşê Gara û Guhar Zerzer û Guhar Zara û Dara Qewala û Seyd el Beden*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê Sitya Ês Maka Şêx Adî bikî*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu me bidî xatira Qapiya Reş, Qapiya Miraza, Miraza Erda, ezmana, şihûda, saliha, xasa, qelendera, embiya, oliya, mêra, milyaketa, tavêjine wê qapiya*

*Ya Şêşims tu miraza me û hincî ruhê Êzdîn li dîwana Şêx Adî, Melek Şêx Xesen û berê şibakê derê wê qapiyê hasil bikî bi îmanê û axretê û tifaqê û dîn û dewletê bi stara dinyayê û axretê.*

*Em kêm in Xwedê temam e.*

*Temamiya vê duayê bi navê Xwedê, Tawûsê Melek û mêran e.”*

Piştî xwendina vê diayê, careke din vegeriyam li bin dara mazî. Em heta berêvarê man rûniştî. Ber bi êvarê re em rabûn û ketin ser rê. Piştî demekê em nêzikî serê çiya bûn. Wext hatibû, weke her rojê îro jî roj diçû ava. Lewra em sekinîn me berê xwe da rojê. Min dest bi xwendina diayê kir.

*“Mahdera Şêşims mahdera xêrê ye*

*Mahdera Şêşims mahdera rehmê ye*

*Mahdera Şêşims mahdera îmanê ye*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê siwarê rojhilat û rojavayê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê dotê û dayê*

*Ya Şêşims tu me bixwînî tevayê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi  xatirê navê Xwedê û çilê eynî li beyzayê*

*Ya Şêşims tu me itar bikî tu me xwedan bikî ji qedayê, ji belayê ji xelayê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê zerê êvarê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi  xatirê Siltan Şêx Adî û xudanê kiryarê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê  Siltan Êzî û Beyt el Farê*

*Ya Şêşims tu ev bang û hawar û gaziyê me bêy hemû cara û vê carê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Şemsê Êzdînê tu kilît û mifta bîne veke derê zor xezîne em sinî hêvînê*

*Ya Şêşims tu me bixwîne ser deftera îmanê*

*Ya Şêşims tu me star bikî, tu me xwedan bikî, ji nebûyê û bêbêxtiyê û buxtanê*

*Ya Şêşims tu me deynî ser pişka îmanê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê erş û kursî û ga û masî û heyat el kursî û navê Siltan Êzî*

*Ya Şêşims tu halê me û ruhê Êzdîn bipirsî*

*Ya Şêşims tu me bidîbi xatirê Luh û Qelema û Hawa û Adema, Îsa û Meryema îxtiyarê wehî sir û kerema*

*Ya Şêşims tu bang û hawar û gaziyê me bihêle hemû wexta hemû çaxa û hemû dema*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê qub û hilala û şibak û hihêla û ruhê fehla û navê Xwedê û Melek Fexredîn û her çar kêla*

*Ya Şêşims tu ber me ruhê Êzdîn vekî dergehekê xêra*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê mêran û meleka û erşan û feleka û Tawûsê Melek û her çarde tebaqa*

*Ya Şêşims sê hevî û pirsyarê û xêrê û halê me û ruhê Êzdîn bike*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê bihuştê û darê û zimzim û mixarê û kafê û çelexanê Hekarê û Siltan Şêx Adî xwedanê kiryarê û Siltan Êzî û Beytil Farê û Siltan Êzî û etqatê û Siltan Êzî û pira selatê*

*Ya Şêşims tu banga me bigihîne qatê*

*Ya Şêşims ti bang û hawar û gaziyê me bêyî hemû cara û vê carê*

*Ya Şêşiis tu me bidî bi xatirê sûka marîfetê wan pênc ferzên heqîqetê û mêrê wextê dera derwêş lê dikin xilmetê*

*Ya Şêşims tu banga me bêy dinê û axretê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê çilê erd û ezmana û bedrî ibin mey û qeyûmî ibin qama û zencerî temame bahrî berî û berîstanê*

*Ya Şêşims tu ji bo me Lalişa nûranî binêrî hana*

*Ya Şêşims tu me star bikî tu me xwedan bikî ji qeda ji bela taf û tûfana, ji nebûya, bêbextiya, buxtana*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê qedrê durê kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê qedrê qasê kî*

*Ya Şêşims tu mebi xatirê qedrê sefayê kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatir qedrê silavgehê kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê qedrê îxtiyarê muxfî sir binê bahrê kî*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn li dîwana Xwedê çêkî*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê dura sipiya û sihûd û salihiya û çiyayê tor û siniya erd û ezman û zeviya û Siltanê bêriya Melek Şerfedînê Mehdi ye*

*Ya Şêşims me bide hêvî ye Şêşims ti hêviya me bêyî zû ye*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê durê zera avê, axê, ba û agirê, erd û ezmanê û ber dîwana axayê qelender e wê Êzdîno Mîr her çar sura*

*Ya Şêşims me te mefer e*

*Ya Şêşims tu wan bang û hawar û gaziyên me ve were*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê dura suhura û kursiya moha û Siltan Êzî mekanê wî ezîz e û qubil bi dore roja Laliş avakirî zor dergah lê danî qube til bi dore*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê zorê zora*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê kursiya rehmana û canî bin cana erd û ezmana û behra qurzim û sîhane Sira Şêx Mendê Fexran e, Şêşims tu bo me Lalişa nûranî binihêrî yan e*

*Ya Şêşims tu me itar bikî tu me xudan bikî ji qeda, ji bela, taf û tufana, nebûya, bêbextiya, buxtana*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê kursiya cebêra xwedanê xêra û ruha fêhla û kafî û her heft mêra*

*Ya Şêşims tu li ber me û ruhê Êzdîn vekî dergahekê xêrê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê kasan û rasa û nefesêd xasa û Xidir Nebî û Xidir Elyase mêrê westê û sûka marîfetê û her pênc ferzê heqîqetê û dera derwêş lê dikin xilmetê*

*Ya Şêşims tu yî banga me bêyî li dinê û axretê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê qesra cewher binyat roj û heyv jê îd hilat*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Umran û Îdrîsê xeyat*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Şêxan û Laliş û Meke û Medîne û Quds û Xelîla*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Melek Şerfedîn û şerik û çira û perî û qendîla*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Sitya Ês û Sitya Zîne*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê Ezraîl û Cebraîl û Dordaîl û Ezazîl û Ezrafîl û Şimxayîl û Mikaîl. Ew in her heft melekê kibîr. Ew in xasê berê çendî bedîl. Di destê wan de ne mifte û kilît. Sekinîn qaf û qensel hezreta Melekê Celîl, çûne hezreta Melekê Celîl*

*Ya Şêşims tu me û ruhê Êzdîn nekî jibîr*

*Ya Şêşims tu sê hêvî me û ruhê Êzdîn tu ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê kafan û mixara*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê sûkan û simedara*

*Ya Şêşims tu me bidî bi xatirê padşa û her çar yara*

*Ya Şêşims tu me bidi bi xatirê Şêx Adî û makê*

*Ya Şêşims tu me bidi bi xatiraê Siltan Êzid û berê şibakê*

*Ya Şêşims tu me bidî bi  xatirê ad û nad û zemberqat û endilgêt û endilsunet û carût el Hesen şerabil zuh û şerabil kewsel*

*Ya Şêşims tu min bidî bi xatirê kespel û melkeser û bexda ser û şemûn el safî Êzdîn el Cahfî û Hesen el Besrî Êzdîn el Cahfî Alî û Hemed el Malî û Bekir el Talî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê Balûlî zane kî*

*Ya Şêşims tu mebi  xatirê Balûlê yek dane kî*

*Ya Şêşims tu me bi xatirê Balûlî dîwane kî*

*Ya Şêşims tu sê hêvî û mahderî me û ruhê Êzdîn ji dîwana Xwedê bikî*

*Ya Şêşims tu rêberê rêya yî*

*Ya Şêşims tu cebarê şikestiya yî*

*Ya Şêşims tu delîlê heyiriya yî*
*Ya Şêşims tu mefera bê mefera yî*
*Ya Şêşims tu fereca xêra yî*
*Ya Şêşims tu berevanê qeda û belan î*
*Ya Şêşims tu xwedanê risqa yî*
*Sê hezar û sê navê Xwedê yê şîrîn heq in mezin in temam in*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê Tawûsî Melek kî*
*Ya Şêşims navê Tawûsê Melek*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê sê hezar û sê navê Xwedê kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê û wehdaniyê kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê el miqerimiyê kî*
*Ya Şêşims tu me bi xatirê hezar û yek navê Xwedê erş el ezîm kî*
*Ya Şêşims tu miraza meyanê hasil bikî ya Tawûsê Melek tu miraza miyanê hasil bikî*
*Şêşims nûrîn e, li ser kursiyeke zêrîn e, kilît û mifte destê wî de ne, vedike deriyê zor xezîne, xelata jê dertîne, sinetxane li hêvî ne*
*Ya Şêşims tu yî dermanê hemû birîna*
*Em kêm in Xwedê temam e.”*

Piştî vê diayê, em meşiyan. Êdî em gihiştin ser serê çiya ango lutkeya çiyê. Li me bû tarî. Li nav rastekê ya ku berê weke zevî dihat bikaranîn me xwe dirêj kir. Bêxem û azar, hema wilo me xwe berda ser axê. Bi şevê pir sar dibe hewaya Şengalê, jixwe zivistana wê pir dijwar e. Em tî, em zikbirçî bûn. Ji lew re sarma zêdetir bandor li me dikir. Lê belê em di ewlehiyê de bûn, li ser vî çiyayî, di hemêza dayîka xwe de.

Bi berbangê re em rabûn, jixwe karê me bûbû ev, carna em dimeşiyan, dema em diwestiyan me xwe dirêj dikir û dema dibû berbanga sibê cardin em diketin rê. Vê carê jî li me bûbû sibe. Me beyaniyê berê xwe da Şêşims. Em di newal, zevî û girikan re derbas bûn. Di rê de giyayê hişkbûyî di bin lingê me de, em di bin lingê çeteyan de diperçiqîn. Striyên giyayên hişk di lingên me re diçûn. Ew weke derziyan bûn. Em pê diêşiyan lê ew êşeke xweş bû, xweşê me diçû. Ji ber ku ew yên welatê me bûn. Strî hebûn bi giya û daran ve. Şev û roj her ku em dimeşiyan bê hemdê xwe em li stiriyan diqelibîn. Carna xwînê diavêt di bin lingê me re, lê haya me ji wê nebû. Dilop bi dilop dirijiya li ser kevir û giyayê hişk û li pey me şop çêdibû. Ji bo me ne xem bû, ji ber ku êdî ew gûrên devbixwîn ji me dûr bûn, nedikarîn bi bêhna xwînê ve xwe bigihînin me. Ji ber ku em êdî li çiyayên bi ewle bûn û zarokên welatê rojê xwe ji bo me kiribûn mertal. Bi xiroşa rizgarbûna ji destê wan gûr û hovan, em bi êşê nedihesiyan. Êşa ku xwezayê dida me, li cem me vedigeriya xweşiyê. Bi kurtî di navbera êş û xweşiyê de em diçûn û dihatîn. Lê em bi hatina dijmin zaf êşiyan. Wan neyaran xwîn kirin dilê me. Ji devê me xwîn diavêt. Ya ku ji vê kembaxtir jî hebû. Ew jî xiyanet bû. Me ji pişta xwe xencer xwaribû û dilê me dişewitî bi vê rewşê.

Di dîroka borî de, ew mîr û şêxên me yên serhildêr, di daran de daliqandin û kuştin. Mîr û şêxên xayin jî her hebûn. Vana xencer bi eşkere û bi pesindarî li ber xwe de dikir lê mixabin, dema wan xencer ji cih derdixist, di piştê de li gel dixist. Ewana neyar kêfxweş dikir, bi van kirinên xwe. Bêgûman, dijmin bi vî rengî ser diket. Kurd diman di bin lingan de. Lewra pişta me xwar, serê me berjêr bû. Bejna me tewandî, çavên me şermîn bûn. Li ser vê axa pîroz,

heya xiyanet hebe, ferman jî dê her hebin. Lewra beriya derkirina dijmin, pêwîst e xiyanet bê darizandin û tinekirin. Me baş zanî û me nû fêm kir, ku xiyaneta pêşengên me û yên em bi wan bawer in nebûya, ma çawa wan çeteyên hov û har dê bikaribûna wan lingên xwe yên qirêj deynin ser axa me ya pîroz?.. Ma kengî wan dikarî bi wan destên xwe yên gemarî dest bavêjin wan keç û jinên me yên delal û xweşik?..

Wê rojê û wê şevê, em man li ser serê çiyê. Dîsa di berbangekê de me da rê û em hatin gihiştîn raserê Şêşims. Gund û qube diyar bûn li me. Em kêfxweş bûn. Bîna me derket. Li ber latekî, ya ku qasî du xaniyan mezin em rûniştin. Mensûrê bejinnavîn, porreş, esmer û çeleng, kete axaftinê û got: “Ev çi malwêrani ye em ketinê, çima êrîşê me dikin û em... Em çima direvin. Hema bila me bikujin û hew, bila em nejîn. Bila êzdî nemînin û êdî ferman ranebin. Çi dixwazin ji me, ji ola me, ji baweriya me, ma em ne mirov in!” Piştî van gotinên bi êş û keder, Tîjdaya bejinkin, porreş û çavreş nesekinî û axivî bi hêrs: “Em heftê û du fermanan re derbas bûne. Nifûsa me heştê mîlyon bû. Niha em mane yek mîlyon. Lê belê em neqediyan û naqedin. Heya dinya hebe êzdî dê her hebin.” Serê min êşiya ji ber van hiziran. Li beramberê van qîrînên bêhêvî û bêçare min êdî nekarî sebir û guhdarî bikim. Ji ber ku her gotinek wan weke xencerekê li dilê min diket û ez diêşiyam. Ez bêzar bûm, ez westiyam, ez perîşan bûm, min hêdîka serê xwe danî li ser kevirekî û ez raketim.

Min di dema razanê de xewnek dît. Ev lata mezin ku em li ber  rûniştibûn, di nîveka wê de qelaşek vebû. Deveke lihevhatî çêbû ji vê qelaşê, dev wekî yê mirovan bû. Latê dest bi axaftinê kir û got: “Hûn, ango mirov çi ecêb in. Hûn

wisa bawer dikin ku tişt bi çavên xwe dibînin. Nexêr, çavên we tenê dinêrin. Yê ku dibîne mêjî ye. Ji lew re bi çavên xwe bimeyzênin û bi mejiyê xwe rastiyê bibînin. Nexwe, heya hûn bi mejiyê xwe rastiyê nebînin, hûn ê her dem li rastî fermanan werin û derbeder bijîn. Ez im, di vir de me. Bêçav û bêguh im. Lê belê weke pirtûkxaneyê ye hundirê min. Ez ji we gelekî zanetir im, jîr im, jêhatî me.

Bi sedan sal berê niha bû
Çar mêr hatin
Ji wan Çilmêran bûn
Ketibûn cengê bi dor
Têk biribûn dagirkerê har
Dabûn rê hatin vê dê
Li ser serê vî çiyayî
Rûniştin li ber min
Galgalên wan li ser serkeftinê, galgalên wan li ser serfîraziyê, galgalên wan li ser azadiyê bûn
Lê îro
Dîsa şêr pêwîst in, şêrejin pêwîst in."

Piştî vê xewnê ji nişka ve ez şiyar bûm. Min dora xwe nihêrî. Tîjda ji min pirsî, got: "Çi bû dayîkê?" Min got: "Qet, tiştek nebû şêrejina min." Nêreşêrê me, makeşêrê me hene. Lê hîna ne hatina avdan, ne hatine berdan, di ser serê dijmin de.

Êdî wext bû. Pêwîst bû em ketibana rê. Xwedêda axivî, di hişê wî de pîlanek hebû û hinek li ser hizirîbû, wiha got: "Ez û Şaxewan em ê her du  di pêş de biçîn. Hûn pey me re hêdî hêdî werin. Di pişta gund de em ê hev bibînin." Xwedêda û Şaxewan her du rabûn çûn. Piştî demekê em jî rabûn û me xwe ber bi jêr ve berda. Me bi çavekê li qubeyê û bi çavê din li derûdora xwe dinêrî. Me baş nedizanî di

vê rûyê çiyê de çete hene yan na. Ji dûr ve qube li ser xwe, gund jî weke ku aram be, diyar bû. Ji ber ku dijmin di cihekê de hebûya, di destpêkê de qubeyên me diteqandin. Ji berê û niha, ev weke zagoneka jêveneger a dijminên êzdiyan bû. Di nava rêveçûna dîrokê de herdem pirtûkên me hatine şewitandin. Lewra em niha mane bê pirtûk. Nezaniya me ji ber vê rewşê pêk tê. Me ramanên xwe yên dîrokî winda kirine. Lewra em êdî nizanîn ber bi kû ve diçin, me rêya xwe winda kiriye.

Em gihiştîn pişta gund û em bi awayekî bêhal rûniştin. Ne av, ne jî pariyekî nan mabû li cem me. Êzdiyên ji ber şûrê çeteyan rizgarbûyî, ji jor ber bi jêr ve, qefle qefle dihatin. Dema me li wan dinêrî, Xwedêda û Şaxewan hatin nêzikî me bûn. Di destê Xwedêda de sê kevok hebûn. Di destê her duyan de kîsik û şaşal jî hebûn. Xwarin û pêxwarin anîbûn bi xwe re. Du cewdikên avê jî bi wan re bûn. Me dest bi xwarin û vexwarinê kir. Bê ku kesek jê bixwaze, Xwedêda xwe bi xwe dest bi axaftinê kir: “Em hêdî û bi baldarî nêzikê gund bûn. Çi deng nedihat me ew bihîstin. Ez gihiştim li ber xaniyê pêşî. Min li derve û nava xanî meyze kir. Gundî tine bûn, lê di derdorê de xwîn jî tine bû. Gundiyan baz dabûn, lê min nedizanî ji ber çi bazdane. Di tenûrê de sê nan mabûn. Nan nîv pijiyayî bûn. Di pêjgehê de her tişt weke xwe mabû. Li erdê sifre raxistî bû. Ji şînkayî heya fêkî, her tişt hebû. Ji vî halê malê diyar dibû ku gundiyan ji nişka ve baz daye û çûye. Ev kevok yên wê malê bûn. Min ew girtin û serê wan jê kir da ku em bidin zarokan û zikê zarokan têr bibe û pê bihêz bibin. Me ji malê xwarin û pêxwarin da hev. Paşê em çûn qubeyê. Me dîwar û deriyên wê maçê kir. Em derbasî hundir bûn. Her tişt wek xwe bû. Çûm li ber pacên rengîn û min girêkek avêtê û ez derketim derve. Me berê

xwe da bîra avê. Dema em gihiştîn li ser bîrê, min dest pê kir ku avê bikişînim li jor, heşt heb mîh dora min kom bûn. Dema min av deranî, mîhan nehişt em vexwin. Ji ber ku ew ji me zêdetir tî bûbûn. Min jî ava ku deranî bir û berda hodê ku mîh tê de avê vexwin. Hîna mihan têr av venexwaribû, ji dûr ve zarokek ber bi me ve hat. Dema gihişt me, min dît ku ev ne zarok, jineke bejinkin e. Lê ji dûr ve weke zarokekê xuya dikir. Jinikê got: 'Zarokên min û bavê min li pişta vî girkî ne. Ji kerema xwe ji min re avê dagirin da ku ez ji wan re bibim.' Min got: 'Li ser ser û ser çavan.' Min çar debî dagirtin ji bo vê jinika bêzar. Lê mixabin wê nedikarî her çar debiyan bi hev re bibe. Ji lew re du debî bir û diduyên din jî hişt di cih de. Êdî dor hate me, min av deranî û da Şaxewan. Me têra xwe av vexwar. Paşê em ketin rê û em hatin li ba we."

Bi vê vegotina Xwedêda, êdî me ava xwe vexwaribû û xwarina xwe jî qedandibû. Mensûrî kevok pijandibû û dabû ber zarokan. Piştî xwarinê em hinek bi ser xwe ve hatin û hêz kete laşê me. Me xwe baştir hîs dikir. Ji ber vê yekê, em nesekinîn. Wek werzîştvanekî ku ketibe pêşbaziya bazdanê, di nava rojê de em ketin rê. Me xwe berneda deştê. Di nava çiya re, me da şiverêyan. Carna şiverê li ber me winda dibûn, lê em diçûn. Di rê de lingên me li kevirên piçûk dialiqîn û em serdevkî diketin erdê. Carna me destê xwe datanî li ser çoka xwe û me bîna xwe ber dida. Em qasî çar saet meşiyan û em gihiştîn raserî gundê Kersê. Di neqebekê re me xwe berda ber bi gund ve. Di rê de em rastê komekê hatin. Dema em nêzik bûn, me dît ku bi darik û kevirên tûj gorekê dikolin. Keçikek dirêjkirî bû di kêlaka gorê de. Min ji dayîkê pirsî, wê got: "Şazde salî bû, ji tîna fetisî." Weke ku qala bûyereke asayî bike, diaxivî. Keçikek

şazde salî, piştî meşeke dûr û dirêj, zimanê wê bi asîmanê devê wê ve dizeliqe, ew keçika bedew û ciwan ku hîna li pêşiya wê salên dûr û dirêj hebû, bêgiyan ketibû û êdî xatir ji me xwestibû. Lê dayîkê, pir bi asayî qala wê dikir. Na na dayîk di nava xwe de dikelî û dinalî. Di her awirê ku di-avêt terma keçika xwe de, dimirî û zindî dibû, dimirî û zin-dî dibû, dimirî û zindî dibû... Min li keçikê nihêrî. Destên wê hinekirî, di guhên wê de guharên lihevhatî, pordirêj û lêvtenik bû. Lê, ew êdî ne di jiyanê de bû. Min hew dikarî sebir bikim. Min berê xwe zivirand û bê xatirxwestin, ber bi jêr ve ketim şiverê. Piştî meşeke nîv saetî, em gihîştîn Kersê. Dinya tarî, gund elalet, em bê cih û war bûn. Li ber xaniyekî re me xwe dirêj kir wê şevê. Hestên me birîndar, ramanên me têkçûyî, hêviyên me hilweşiyabûn. Lê em ne dîl, ne jî kuştî bûn. Heke jiyan ev be, em dijiyan!..

Sibetira dinê em rabûn. Min çavê xwe li derûdorê ge-rand. Ka çi heye çi tine ye. Ez neçar bûm ji bo piçûkên li ber dilê xwe têr bikim. Baş bû ku min di xaniyê kêleka me de ar peyda kir. Rûn, xwê û meqel jî hebû. Min hevîr kir. Di meqelê de, di nava rûn de nan sorkir. Bêgûman her kesî têr xwar. Ji bo me ji ferman û rizgarbûnê zêdetir, têrxwarin û avvexwarin pirsgirêka sereke bû.

Mê ji betanî û paçên cur bi cur ji xwe re sîber çêkirin. Em man di bin de. Nîvro, yên çiyayên jorîn û yên çiyayê me mabûn, hatin li ba me. Gotûbêjê bi qasî saetekê ajot. Êdî me dizanî ka em ê çi bikin. Ber êvarê re gundiyekî ji gundê Kersê hat ba me. Wî ji Xwedêda re got: “Ji xwe re pezek bînin, bo zarokên xwe serjê bikin.” Xwedêda ev pey-vên wî nepejirandin û got: “Niha pêwîstî pê nîne, Xwedê ji te razî be, spasdarê te me.” Ew zilam çend car çû hat û her peyva xwe dubare kir. Lê belê Xwedêda jî neçû û pez

neanî. Cara dawî mêrik hat li ba me û dest bi axavtinê kir. Wî got: “Divê ajalên min neyên dizîn lê ji aliyê me ve bên xwarin. Kî bixwaze ez ê bidimê.” Pezên wî dihatin dizîn. Mêrik ji ber vê çendê pir êşiyabû. Dît ku em ajalên wî nadizin, ew bixwe hat û got ji xwe re pezekî bînin. Dema dît em nayînin, rabû çû bi xwe ji me re pezek anî. Xwedêda pez gurand û me da ser êgir. Wê êvarê herkesî têra xwe xwar. Wê şevê em bi zikê têr razan. Ew nêzîkatiya wî zilamî ez hêvîdar kirim. Min ji vê tevgera wî hêz wergirt. Wî ji bo min keyfxweşiyeke mezin ava kir. Ez hizirîbûm ku mirovahî miriye û nemaye, lê min bi çavê xwe dît hîna di nav me de damarên mirovahiyê û edaletê dipirpitin.

Roja dinê, bi beyaniyê em ketin rê. Me xwe gihand korîdora ku hatiye vekirin. Ajokarên ku ji Rojavayê Kurdistanê, ji Dêrika Hemko hatibûn bi dil û can dixebitîn. Xwestek û rêxistina wan pir li pêş bû. Me dizanî êdî tiştek bi me nayê. Bi dilekî rehet em siwarê maşîneyan bûn. Lê belê em komek mezin bûn û di maşîneyan de cih teng bû. Dîsa jî ajokaran hewl dida ku zêdetir mirovan hilbigirin û bibin. Çi ecêb! Ji me zêdetir ajokaran dixwestin em rizgar bibin. Ax ax min dîsa dît, ez dîsa hêvîdar bûm. Çavê min tijî rondik bûn, min cara dawî li paş ve, li çiyayên pîroz nihêrî, min xatir ji wan xwest û got: “Çiyayê Şengalê, Êzdîxaneya pîroz temaşe bike, ji bîra neke, li cem xwe tomar bike, hinek ji kesên ku me bawerî bi wan anîbû dest ji me berdan û em di destê çeteyan de hiştin û çûn, lê îro ji heman qewm, ji heman netewê hinekên dinê bi hawara me ve hatin, ji dil û can ji bo jiyana me, ji bo mayîna me ya li ser rûyê erdê dixebitin û li ber xwe didin. Bizanibe! Hinek dixwestin em bimirîn û yek ji me nemîne li ser rûyê erdê. Lê ev giyan didin me, dixwazin em bijîn û em bimînîn li ser rûyê erdê. Ji

bîra neke ku ev zarokên welatê rojê ne, ev zarokên welatê rojê ne, ev zarokên welatê rojê ne… Bi xatîrê te, bi xatirê te, bi xatirê te çiyayê pîroz… Weke her carê te vê carê jî em parastin.”

Piştî rêwîtiya korîdorê em gihiştîn Dêrika Hemkoyê. Em li Kampa Newrozê hatin bicihkirin. Em wê êvarê û wê şevê man li wir. Ji me, ango ji malbata me jî windayî hebûn. Lewra me dixwest ku em biçin Başûrê Kurdistanê, em biçin kampên li Zaxoyê, da ku em windahiyên xwe bibînin. Bi beyaniyê, ajokarên Dêrikê em birin û di avê re derbas kirin. Di vî milê avê de em man li naverastê. Me dixwest em biçin kampan lê çawa? Ajokaran ji me dirav dixwestin û diravên me tinebûn. Em li ber ajokarekî geriyan me lava jê kir. Wî em bi xêra xwe birin kampê. Di kampê de me çadirek veda, di ber çadirê de ji sacan me holikek jî çêkir, lê binê wê holikê pir germ bû. Wisa germ bû ku, ger yekî li ser sacê hêk bişikanda dê bi hêsanî bipijiya. Wiha dest pê kir jiyana me ya li kampan, ji warê bav û kalan dûr. Gelê herêmê, bi qasî ku ji destê wan dihat, ji me re bûn alîkar. Cil û firaxên xwe bi me re parve kirin, xwîna xwe dan birîndarên me. Herwiha, mirov bi hêsanî tê derdixist ku, hikûmat û Pêşmergê ji bo rewşa me rasterast wiha difikirin, “Hûn çima rizgar bûn. Me kuştina we pîlan kiribû. Hûn hatin li vir jî bûn belayê serê me.”

Nêrîna wan a li me bi vî rengî bû. Me du sal dikaribû di wê jiyana kampê ya zor û zehmet de li ber xwe bidin. Piştî du salan em vegeriyan hatin Xanasor, em bûn niştecihên herêma xwe. Êdî me xwe rehet û di nava aramiyê de hîs dikir. Ji ber ku em hatibûn li ser axa pîroz û em nêzî gund, bax û bostanên xwe bûn. Min ji nû ve tama jiyanê fêm kir.

Dema hatim Xanasorê, bîna welatê min têra min dikir ku ez li vir bê xwarin û vexwarin jî dikarim bijîm.

Dilê me perçe perçe bûbû, birînên me yên kûr hîn nehatibûn pêçan, qîrîn û nalenala dayîk û keçikan hîn jî weke wan rojên fermanê zindî bûn, lê îro ew lingên qirêj yên çeteyan nemane li ser axa min a pîroz. Bi rijandina xwîna xwe ve pak kiribûn welatê min, zarokên welatê rojê. Niha, yên ku ez ji laş û bedena xwe çêkirim, hinek ji wan wenda, hinek ji wan şehîd û hinek jî di nava têkoşînê de ne.

* * *

Ez im Berxwedan, yê winda, kurê Xezalê yê yekemîn. Ez im ew ê ezîzê li ber dilan, helbesta li ser devê dayîka xwe.

Ez, sala 1989an ji dayik bûm. Jiyana min weke her êzdiyekî derbas bû. Lê ya herî xweş û balkêş zaroktiya min bû. Weke her zarokekî, ez û hevalê xwe, em ewqas nesekinî bûn ku ji me re digotin "dînên taxê." Carna bi lîstokan derbas dibû jiyana me. Carna em diçûn nav erd, me dizî dikir. Pir tamxweş bûn tiştên ku me didizîn. Carna em pev diçûn, me serê hev dişikand. Carna em digiriyan, carna jî dikeniyan. Her roj dawet bû ji me re. Xwezî, xwezî jiyan her dem weke ya zaroktiyê ba. Bi coş, bi ken, bi ax û nalîn. Ji ber bi zanebûn, bi rêxistin, bi siyaset me zirar nedida hev. Ji lew re me zû li hev dikir, em zû li hev aş dibûn. Dewlet û artêş, şer û kuştin e. Lê em, em zarok bûn, zarokên gel. Mixabin! Dîsa jî em bi destê xwe dihatin kuştin. Erê kuştin, çi lîstokeke ecêb! Gelo, ew lîstok kî afirandiye?

Em zivistanan di komelgehê de bûn. Havînan bi malbatî diçûn ser erd. Temenmezinên me digotin: "Berê ne wisa bû. Em di zikê çiyê de, di halê xwe de bûn. Paşê em anîn di van komelgehan de bi zorê bicihkirin." Carna kalikê min digot, "Em di quntarê çiyê de bûn, weke ajalên kuvî, em anîn xistin vê komelgehê, niha jî em bûne wek ajalên kedîkirî."

Di payizekê de min dest bi xwendinê kir. Êdî her zivistan ez diçûm dibistanê. Ez kurd, ez êzdî, lê dibistan bi her tiştê xwe ve Erebî bû. Ez êzdî, dibistan misilman bû. Bi destpêkirina dibistanê re min fam kir ku ev dinyayek cuda ye. Em di dinyayekê de bûn, lê ser me re dinyayeke din, dinyayeke jorîn hebû. Dinyayeke sar, ji hestan dûr, heta bixwazî xedar. Em bi zorê fêrî jiyan, çand, dîrok û zimanek biyanî dibûn. Me nedixwest, li me zor dihat, lê em bêçar û bêzar bûn û ne bi destê xwe ne bi dilê xwe bûn.

Ji bo debara malê, malbata min, carna di derûdora Şengalê de, carna jî li bajarokê Rebîa, diçû ser erd. Ya rastî ev dinya ya her kesî ye. Mîrateya hevpar e ji mirovan re. Nabe hinek ji xwe re bikin milkê taybet. Bi hevre hilberandin û lihevparvekirin hîmê dinyayê ye. Dibêjin, yekî ji yê din re gotiye:

"Erdê xwe bide min."

Ê din gotiye:

"Nadim!"

"Çima nadî?"

"Erdê bavê min e. Ji wî gihîştiye min, ji bo vê nadim."

"Ji kî gihîştiye bavê te?"

"Ji kalikê min gihîştiyê."

Wisa heta heft bavê xwe jimartiye. Dawiyê de gotiye:

"Wî jî bi zorê ji yekî din zevt kiriye."

Wê demê mêrik gotiye:

"Ez ê jî bi zorî ji te zevt bikim."

Bi kurtî û kurmancî, axa vî welatî yê beg û dewlemendan nîn e. Her kesek dema ji dayîk dibe tazî û ripûrût e. Çûyin bi kefenekê ye ji vê dinyayê. Tiştê ku di navbera bûyin û mirinê de diqewime, wek dewlemendî û feqîrî, fîtneya hizirî ya mirovan bi xwe ye. Ya rast ev e ku, di vê dinyayê

de, tenê yar nayê par ve kirin. Bêgûman tenê hevsergirî taybet e, tenê pêwîstiyên zarûrî.

Lê dîsa jî çûyina ser bax, baxçe û bostanan, kêfxweşiyek bû ji bona min. Me ax dikola û tov direşand. Wisa şîn dibû reng bi reng. Di vebûna rojê de temaşekirina baxçeyan kêfxweşiyekê bû, weke ya cejnan. Çi ecêb! Bi avdana erdê re tov şîn dihat. Ax weke malzaroka dayîkan bû û di xwe de diafirand. Lewra dayîka min digot, “Xak dayik e”. Erê dayik e, têrker e û têr dike. Bêberamber, jixweber, jixwe dide. Kî dikare berhemdarî û dayîna dayîkê bike mal û milkê xwe! Şaşitiyek heye di vê dinyaya jorîn de, di vê dinyaya serdest û yekdestdar de.

Min heşt sal xwend. Temenê min bû pazde salî. Serê memikên min hişk bûn. Weke nokên gihîştî. Min ji dayîkê û ji mezinan dipirsî, gelo çima serê memikên min wisa hişk bûne, weke nokekê. Ti kesî bersiva min nedida, heya ku rojekê mamê min gazî min kir. Ez çûm ba wî. Wî yek bi yek got. Min hîn fam kir, ji mêrbûnê û jinbûnê. Bi kinahî ez baliq bûbûm û ez gihîştibûm. Lê mixabin! Min nedikarî bikevim pey evîna xwe. Min nedikarî hestên ciwantiyê bijîm, bi evîna xwe re di kuçe û kolanan de bigerim. Di bax û bostanan de stran û helbestên evîndariyê bistirêm. Bi keçikekê şa nebûm ez. Vana hestên qedexekirî bûn, di qanûnên nenivîsandî de. Evîna min dîlgirtî, evîndara min zincîrkirî bû. Azadî pêwîst bû, beriya her tiştî, lê rêya wê min nedizanî. Ez gav bi gav ketim nava avzêyekî. Her ku min xwe tev dida, zêdetir tê de diçûm.

Ji ber derfeta malbatê ya madî tune bû ku min bidin xwendin, di pazde saliya xwe de min dev ji xwendinê berda. Xeyalên min yên ku rojekê bibim karmendê dewletê û jiyana min bi mûçeya dewletê mîsoger bibe, têk çûn. Dawî

li hêviyên ku têkildarê dewletê bûn hatin. Di jiyanê de êdî ez bi tenê, bi serê  xwe bûm. Zêdetir min nedikarî xwe di ser malbatê de bikim bar. Divê êdî ez barê malbatê hilbigirim. Dem ew dem bû êdî. Dayîkê pazde salan ez xwedî kirim, mezin kirim û dam jiyan kirin. Êdî dem hatibû ku ez bifirim lê baskşikestî bûm. Min nedizanî ka ez ê çiqas bifirim û bilind herim. Kengî biwestim û serjêrkî bikevim xwarê. Gengeşiyek hebû di serê min de û min gava xwe ya destpêkê bi vî rengî avêt.

Êdî karker bûm, li ber destê hostayan. Kedkar bûm di xanî û avahî çêkirinê de. Me gelek avahiyên nû lê dikirin. Lê belê yek jî nedibû nesîbê me. Demekê min ajokarî jî kir. Maşîneya min, karê min bû. Ez bûbûm karsazê xwe. Ji bin fermanên xerîban derketim. Çend salan wiha dewam kir. Lê belê jiyan ji rêzê bû. Bêtam û bêcoş û bêşahî.

Artêşa Iraqê, di sala du hezar û sisiyan şûn de, gav bi gav mûçeyên leşkeran zêde dikir. Mûçe, heta neh sed dolarî diçû. Berê bi darê zorê ciwan dibirin leşkeriyê. Desthilatî guherî, bi guherîna desthilatiyê re rêbazên bikaranîna ciwanan jî guherî. Dewlet êdî nediket li pey ciwanan û nedibir leşkeriyê. Êdî wisa lê kirin ku ciwan bi xwe diketin li pey dewletê û dibûn leşkerê ji dil(!). Mûçe balkêş bû. Malbatekê bi mehaneyekê pir hêsanî dikarî pê debara xwe bike. Lê belê xeterî, birîndarî û mirin hebû. Yên ku dibûn leşker, rewşa xwe wiha pênase dikir, “Em bi xwîna xwe dijîn.” Ango me serî daye li ser vê rêyê, kuştin daye li ber çavan. Heke em sax bimînin ji me re kar e. Heke em bêne kuştin jî mûçe dê her bê dayîn û malbat dê jiyana xwe bidomîne. Bi deh hezaran ciwanên me neçarê vê qanûna nepenî bûbûn.

Di sala du hezar û duwazdehan de min jî navê xwe nivîsand ku bibim leşkerê Iraqê. Mûçeyê vî karê guncaw û berdewamiya wî jî maqul bû. Navê min der çû. Ji bo leşkeriyê serlêdana min hat pejirandin. Di bîst û sê saliya xwe de, rojek ji rojên biharê, min ji malbatê xatir xwest û ez çûm. Li Hemdaniyê, di deriyê leşkergehê re derbasî hundir bûm. Min belgeyên pêwîst yên fermî radestî rayedaran kirin. Em li wî cihî heftsed kes kom bûbûn. Yeko yeko bang li me dikirin. Dor hate min jî û ez çûm. Ez destpêkê birim li gel sertraş û serê min traş kir. Piştre cil, çek û rext dane me. Ez birim bin konekî ku çil kes tê de radize. Cil, çek, rext û porê me hemûyan weke hev bû. Her sibe zû em ji xew dihatin şiyarkirin. Me werzîş dikir û paşê jî taştê dixwar. Danê sibê, em di warê leşkerî û  pergaliyê de perwerde dibûn. Di navbera nîvroj de fîravîn dihate xwarin û me bîna xwe vedida. Piştî nîvro, perwerde berdewam dikir. Êvarê şîv dihate xwarin. Heya dehê şevê her kesekî karên xwe yên curbicur dikir. Lê piştî dehan razan pêwîst bû. Li vir, êdî jiyana me bûbû yekawaz û me nedikarî ji xeynî destûrên ku tên dayîn tev bigerîn. Em birêxistin, bipergal û sererastî bûn, lê em ne azad û ne jî yên xwe bûn.

Perwerde beş bi beş bû. Her refek di beşa xwe de perwerde dibû. Em fêrî çekan dibûn, çekên curbicur. Di destwerdan, girtina ser avahiyekê, operasyon û hwd. de em perwerde dibûn. Hinekan dev ji perwerdebûnê berdidan û diçûn. Hinek jî ji ber pirsgirêkên li gel fermandaran çêdibûn dest ji leşkeriyê berdidan. Lê belê, piraniya me li ber xwe dida û perwerde kuta dikir. Vê perwerdeyê sê meh dewam kir. Piştî sê meh, ji bo pênc roj ez hatim malê li cem malbata xwe.

Piştî  pênc roj, min berê xwe da Guwêr ku diket di sêgoşeya Mûsil, Hewlêr û Kirkûkê. Di nuqteyek leşkerî de li gel bîst û pênc leşkerên dinê, min dest bi erka xwe kir. Me her roj, her car pênc kes bi hev re, nobedarî dikir. Li gel me polîsên trafîkê jî hebûn. Me yek bi yek nasnameyên welatiyan kontrol dikirin. Kesên ku me guman ji wan bigirta me wan digirt û dişand navenda polîsan. Li gel me lîsteya navan ya kesên ku dewlet li wan digere hebû. Heke di dema kontrolkirinê de em li rastî wan bihatana, me ew desteser dikirin û dişandin navenda bajêr, ango qereqola polîsan. Carna em derdiketin gundan û taxan. Me lêgerîn û lêpirsîn dikir. Piştî ku şeş mehên min temam bûn, şevekê ji fermandarê me re telefon hat. Di telefonê de, di cihekê nêzikî me de, qala tevgereke kesên nenas dihat kirin. Wê çaxê ez di nobetê de bûm. Fermandêr hat û pirsa min kir. Paşê li gel fermandarekî ereb em pênc kes çûn ku li gor agahiyên hatî lêgerînê bikin. Fermandêr ji me re got: “Heya ji we tê kesî nekujin lê desteser bikin.”

Em çûn nêzikê cihê bûyerê bûn. Du hevalê me di milekê re berê xwe dan serê girê ku gumanbar lê bûn, me jî di milekê din re berê xwe da serê gir. Hevalên me dema nêzikî gir bûn, ji jor ve fîşek hatin teqandin û pevçûn peyda bû. Van her du hevalên me dest bi şer kir. Me jî di milê xwe de şer dikir. Di wê kêliyê de pişt me re maşîne hatin û nêzikî me bûn. Gulopên maşîneyan pêketî bûn û em xweş didîtin. Ji maşîneyan fîşek wek baranê hatin me. Em şaş man. Me nedizanî çi dibe û pêwîst e em çi bikin. Bi van fîşekavêtinan re em her sê birîndar bûn. Sê fîşek li her du lingên min ketin. Ji wan du fîşek ranê min ê rastê yek fîşek jî li bin çokê min yê çepê ket. Hevalê min ê fermandar jî du fîşek ji lingê xwe xwar. Hevalê min ê dinê, ku ji

xelkê Diyana bû, ji çengê xwe yê çepê û ji lingê xwe yê çepê birîndar bû. Maşîne nêzikî me bûn. Wê demê me fêm kir ku leşkerên amerîkî fîşek bera me dane. Leşker bi tedbîr û bi hamiran hatin heya cem me. Dîtin ku em leşker in, aciz bûn û paş ve vegeriyan û çûn. Mesele hatibû famkirin. Leşkerên amerîkî bê ku me agahdar bikin ketibûn herêma me. Di encamê de, em sê leşker bi birîndarî li erdê bûn.

Hevalên me hatin gihîştin me. Ewan rewşa me dît û ji fermandêr re ev rewş ragihand. Ez di dilê xwe de rehet bûm. Ji ber ku birînên me yên xedar tine bûn. Lê belê fermandarê koma me pir ditirsiya. Ji ber ku wî wisa dizanîbû ku dê bimire. Ji lew re ji hevalê xwe daxwaz kir ku bi telefona wî telefonî destgirtiya wî bike. Wî got: “Qet nebe beriya ku ez bimrim bi wê re biaxivim.” Em di nava xwînê de mabûn, lê di milekê de em bi halê hevalê xwe jî dikeniyan.

Min bi telefona xwe ji hevalê xwe re telefon kir û got: “Ez birîndar bûme lê malbatê pê nehesînin, bila nizanibin ku ez birîndar bûme.”

Piştî vê telefonê hevalên me bi maşîneyên xwe ji nuqtê hatin û em rakirin nexweşxaneyê. Wê şevê li nexweşxaneya Mûsilê hatim ameliyatkirin. Roja dinê min telefonê bavê xwe kir û rewşa xwe jê re ragihand. Min nexwest kes were ba min. Lewra min ji bavê xwe re got: “Tenê tu were bes e.”

Piştî vê birîndariyê du meh, li malê mam. Paşê dîsa çûm li ser karê xwe. Meha yekê ya du hezar û çardehan de cihê min yê dewamî hat guhertin. Ji Gîwer çûm Hemdaniyê. Di nuqteyeke biçûk de min erka xwe bi cih dianî. Her car dudu-dudu me nobet digirt. Em êzdî û misilman di nav hev de bûn. Ereb, kurd û aşûrî me tevan di nav hev de dijîn. Dostên me yên asûrî hebûn. Carna dema di nuqteya me re diborîn, şûşeyeka şerabê didan me û digotin: “Vexwin, em

dizanin ku hûn vedixwin." Erê, me vedixwar, êzdî, misilman û asûrî. Bêgûman yên ku venedixwarin jî hebûn. Lê tişta ecêb ev bû ku hinek misilmanên ereb têra xwe şerab divexwarin û dihatin xwe dişûştin û paşê jî nimêj dikirin. Li gor baweriya wan, çi dikî bike, normal e. Piştî xweşûştinê her pîsatî paqij dibe.

Çar roj beriya fermanê ji erka nobedariyê hatim malê. Rewş her ku diçû kembaxtir dibû. Her der hêdî hêdî dikete bin kontrola çeteyan. Tirs û xofa çeteyan roj bi roj belav dibû. Hêzên wan jî pêl bi pêl di ser me de dihatin. Piştî ketina Mûsilê, Tilefer jî kete destê çeteyan.

Wê şevê dema çeteyan êrîş kir, ez bê çek bûm. Min negot ez bê çek im û beziyam çeperê. Ez leşkerek perwerdekirî bûm. Di dema herî pêwîst de, ne çek ne jî fîşekên min tune bûn. Lê dîsa jî ez çûm ber satirê. Min ji xwe re got, heke hinek birîndar yan şehîd bibin, ez ê çekên wan hildim û şer bikim. Leşkeriya ku min ji bo dewletê dikir, kêrî min û gelê min nehat. Bi hezaran leşker û pêşmergeyên me yên êzdî hebûn. Mixabin, yekî jî nekarî çeka xwe ji bo gelê xwe bi kar bîne. Rastî ev rewş ji bo me êzdiyan cihê şerm û ketinê ye, cihê xemgînî û serşoriyê ye. Ji ber ku ne pêşmerge ne jî leşker yên gel nîn bûn, lê ew hêzên serdestan bûn. Kêrî wan dihatin, lê belê kêrî xwe û gelê xwe nedihatin. Di encama vî şerê ku dilnexwazan dikir de şikestin zû çêbû. Saet di heft û nîvan de min berê xwe da malê. Li gel malbatê, me dest bi bazdanê kir. Em hatin heta gundê Werdiyê. Ji gund jî me baz da, em çûn quntara çiyê. Roja dinê weke gelekan ez jî li gel malxalanên xwe vegeriyam gund. Min got, ez pariyekî nan bixwim. Malbata min nehat, wan xwe sipart çiyê.

Ez, piştî vegera xwe ya li gund winda me. Jiyana min ya bîst û pênc salî bi vî rengî bi dawî bû. Windabûn peyveke ji rêzê ye. Ser û binê xwe peyvek e. Lê belê peyveke pir xedar e, ji bo min, ji bo gelê min.

Li çar aliyê welêt windabûyî û windakirî hene. Bi sedan sal e, windakirin spartine me. Keç û xortên me winda ne. Dîroka me winda ye. Pirtûkên me yên pîroz winda ne. Zimanê me, rêûresmê me winda ne. Qube û peykerên me, zana û oldarên me winda ne. Ji lew re em nizanîn du sed sal berê çibûye. Çi bi ser pêşiyên me hatiye. Dizanim! Windakirin birîneke kûr û xedar e di dilên dayîkan de. Heke kêlek hebe, gorek, goristanek hebe, dayîk dikarin li ser bigirîn. Nexwe, her dem kom dibe xerîbî û bêrîkirin. Kom dibe keser, diteqe dil. Windabûn, windakirin bila êdî nebin çarenûsa vî gelî.

* * *

Ez im Şaxewan, kurekî din ê Xezalê me. Piştî ku em bi malbatî li Zaxo, di kampê de bi cih bûn, ez kûr hizirîm. Di encamê de min xiste serê xwe ku ez biçim Ewropayê. Her çi qas pir bi êş û ne xweş be jî, êdî kêfa min ji vê jiyanê re nedihat. Her tişt li ber çavê min reş bûbû. Jixwe di berê de jî xwesteka min a çûyina Ewropayê hebû. Min dixwest siberoja xwe di Ewropayê de saz bikim. Niha bi hezaran mirov ji gelê me, bi hêviya jiyaneke nû berê xwe dane Ewropayê, çima ez neçim?! Ez ê biçim Ewropayê, lê belê çawa?

Min hinek lêkolîn kir. Min dît ku tew lo, tor ava bûye. Ji Zaxoyê heyanî Ewropayê her tişt bi rêk û pêk dimeşe. Di her cihekî de, hem êzdî hem jî kurdê misilman, toreke xurt ava kiriye. Dikişandin bi hezaran kes ber bi Ewropayê ve. Weke keriyên pez mirov diajotin ser sînoran. Ma çima ez ê neçim! Ez ê biçim. Her çawa be, ji vê fermanê û ji vê jiyana kampê çêtir e.

Ez û bavê xwe Xwedêda, li nav dost û hevalên xwe geriyan. Me şeş hezar dolar da hev. Ez ketim rê. Çûm ber bi sînorê Başûr û Bakur ve. Di bejahiya çiyayî de, bi maşîneyên barhilgir me rêya xwe domand. Di vir de çiyayên biheybet hebûn. Riya me di nav wan çiyayan re derbas dibû. Min cara ewil, li vir çiyayî dîtin. Ew wek wan çiyayan bûn. Bi heybet, jixwebawer, çavnetirsiyayî bûn.

Li ser kaniyekê me navberek da. Kanî ji bin dareke çinarê derdiket. Ji ber vê, serê kaniyê nedixuya. Me li vir av vexwar. Çi av bû ev av, ev kanî. Ne weke herêma me bû. Bi tamtir û hêniktir bû. Me dest û rûyê xwe jî şûşt. Bayek hênik rûyê min dialêst. Ez ji xwe çûm. Di vê kêliyê de, ji nişka ve, di nav daran re kesek bi pêlavên xwe yên zer bi lez hat cem me. Silav da me û yek bi yek destê me girt û hat rûyê me. Paşê wî got: "Kerem bikin, rûnin." Em rûniştin, ew ma li ser piya. Min çav li derûdora xwe gerand. Min dît ku li ser latekî du çekdarên din jî hene. Ji wan yek jin yek jî mêr bû. Min, her çi qas dûr be jî, awirên wan di ser xwe de hîs kir. Dema wan dît ku ez bi wan hesiyame, bişirîn. Min jî bersiva wan da û ez jî bişirîm. Pêlavzerê ku li pêşberê me sekinî bû dest bi axaftinê kir: "Welat di cih de nehêlin, neçin derve. Ew welatên hûn biçinê, di berê de, hemû tê koşiyane  û xwe gihandine aramiyê. Ji lew re di welatên wan de şer û pevçûn tune ye. Dewlemendiyên ku wan bi dest xistiye yên wan in. Welatê me dewlementtir û xweşiktir e. Lê niha şer heye, em neçar in li ber xwe bidin û jiyana xwe saz bikin; aramî bînin welatê xwe. Ji bona vê têkoşîn pêwîst e, xwîn û xwêdan pêwîst e. Bê têkoşîn, reva ji bedeldayînê, ti kes nabe xweşmirov, belkî dibe xulam di bin destê hinekên dinê de. Li welêt bimînin. Di asta ku hûn dikarin de tê bikoşin, da ku em siberoja xwe ava bikin, serbixwe û azad bijîn."

Wî pêlavzerî ji me re tiştên pir qenc digotin. Tiştên ku wî gote me balkêş bûn. Mayîna di welêt de çi ye? Têkoşîn! Xwînaxwedayîn! Na! Ez dixwazim bijîm, naxwazim bimirim. Heya niha herkesî pesnê Ewropayê dida, ev ê pêlavzer berovajî vê diaxive. Gelo kî rast dibêje? Na! Kes nikare min ji rêya min vegerîne. Ez ê herim Ewropayê.

Çavên vî ciwanî dibiriqîn. Çima di awirên wî de hezkirin heye? Di vê germa havînê de bayeke hênik radike, di dilê min de. Çima? Carna dayîka min jî wiha li nav çavên min dinihêrî. Min li derûdora xwe nihêrî. Herkes kelecanî bûbû. Di cihê xwe de diliviyan. Laşê hinekan ber bi pêş û ber bi paş ve diçû û dihat. Çima?

Wî pêlavzerî dema axavtina xwe qedand, ji seriyekî ve dest bi xatirxwestinê kir. Piçûk û mezin, jin û mêr her kes bêhemdê xwe diçû rûyê wî ciwanî. Bi kelecanî em hemêz dikirin. Keçika çarde salî, ya li cem min bû, dema wî hemêz kir, lerizî ji kelecanê. Dor hate min, ez neçûm rûyê wî. Min her du destên xwe danî ser gepên wî û eniya wî de ew maç kir; nizanim çima!

Dema pêlavzer kete rê, li pey wî me li çepikan da. Wî jî ji me re destê xwe hejand û çû. Min, li her du pêlavzerên ku li jorê bûn jî nihêrî. Ew dîsa bişirîn. Bi destên xwe yên rastê, qayişên çekên xwe yên dabûn milên xwe yên rastê girtibûn. Bi destên çepê ve nîşana serkeftinê kirin. Bê çava ji nişka ve derketibûn pêş çavên me, wisa jî winda bûn û çûn. Çûn ber bi rojê ve; ji ber ku ew zarokên êgir û rojê bûn û agir û roj du pîroziyên me yên êzdiyan in.

Navbera ku me li ser kaniyê da, bi dawî bû. Em careke din siwarî barhilgirê bûn. Em di rêya ax de, di nava barhilgirê de, bi zehmetî, di rê de diçûn. Her ku xirxalên maşînê diket kortan, pê re em dihejiyan; bilind dibûn û diketin. Bi ser kêlekan ve dibûn, ber bi pêş û paş ve diçûn û dihatin. Me bi kotekî xwe bi rexê maşîne ve digirt. Min digot qey dê nava min derkeve derve. Hundirê me serobino dibû. Hinek jî divereşiyan. Bi rêwîtiyeke wiha em gihîştin ba leşkerên Tirk. Leşkeran em anîn xwarê. Em siwarî maşîneyên xwe kirin û birin. Em çûn nava Şemzînanê. Di qereqola polîsan

de navê me yek bi yek nivîsandin. Paşê em birin holeke basketbolê. Êdî bûbû tarî. Kesî ti xwarin û av neda me. Em derbasê nav penaberên din yên êzdî bûn. Di holeke fireh û bilind de cih tine bû ku em bi rehetî rûnin û bîna xwe berdin.

Saet nehan de, ji nişka ve dengê topan hate guhên me. Pişt re dengê hawan û obûsan. Demekê deng qut bû. Lê paşê dengê firrokeyan hatin guhên me. Ji wan yek diçû yek dihat. Ji dûr ve dengê roket û yên çekên giran dihatin. Dengê firrokeyan sekinî, lê pey wan re, vê carê dengê debabeyan, top û hawanan dor girt. Heya berê sibê wiha bû. Em jî carna radizan, carna jî ji ber dengekî nêzik dihat, şiyar dibûn. Diyar bû ku ji bona vî welatî hinek şer dikin; bi tundî û bi dijwarî. Wan dixwest dijmin der bikin, lê me... Me welêt berdabû û di nav lepên dijmin de hiştibû. Ew li welat xwedî derdiketin, me terka welatê xwe dikir û em ji boyî xwe li welatekî digeriyan. Wan bedel dida, can dida ji bona welêt, lê mixabin em jê direviyan. Me dixwest bê zehmetî û bi erzanî welatekî me hebe. Bi aram û azad be. Lê kanî!

Di nava rojê de em derketine  sûkê. Me dewlet ji nêz ve nas kir. Dewlet sar bû weke qeşayê. Lê hinek xweşmêr hebûn, mirovên herêmê bûn. Ji dil dibûn alîkar. Em di nav sûkê de gerandin. Bi kêfxweşî hay ji me diman.

Di başûrê welatê me de partî û rêxistin hene. Di nava navê wan de peyva demokrasî derbas dibe, lê di rastî de noker, bêbext û nexêrxwaz in. Navê wan demokrat, lê naveroka wan dijminatiya mirovan e. Lê ev xweşmirovên piştgiriya me dikirin, di cewher de demokrat û mirovhez bûn. Nizanim çima? Bêyî gotin û sekan, her dixwestin birînên me derman bikin. Êşên me par ve dikirin. Ya here girîng; ji me fêm dikirin.

Di hola basketbolê de em qasî du hezar kes hebûn. Di vir de ne serşo hebû ne jî destav. Yên ku hebûn jî têra me tevan nedikir. Em hemû qirêj bûbûn. Bîna genî ji me dihat. Ew ne bes bû, sipî jî ketibûn laşê penaberan. Carna xwarin hebû carna tine bû. Heke heba jî ne bi dilê me bû. Wisa derbas dibûn rojên me.

Piştî heftiyekê, ewan hê gazî me kir. Em kom bi kom ji holê derketin û me berê xwe da nava bajêr. Me ji xwe re otobus û mînîbus kirê kir. Em kom bi kom siwar bûn. Şev û rojekê em di rê de man. Em di gelek gelî û deştan re derbas bûn. Li herêma me çiyayekî hebû. Lê belê li vir çiyayên bilind û biheybet pir bûn. Di beyaniya rojeke germa havînê de em gihîştin Amedê, ya ku weke paytexta Kurdistana mezin dihat bilêvkirin.

Li wir, erkdaran em birin kampa penaberên êzdî. Şaredariya ku di destê kurdan de bû, ya Amedê, gelekî ji me re bû alîkar. Xelkê Amedê kel û melên xwe, xwarin û vexwarina xwe bi me re parve kirin. Di vî bajarî de me xwe xerîb nedidît. Lê mixabin! Dîsa jî em ji ber fermanê derketibûn û em penaber bûn.

Ez bîst û pênc rojan mam li Amedê. Yên em dikişandin ber bi Ewropayê ve, gotin amade bibin. Rojekê em ji kampê derketîn û çûn nava Amedê. Bi diravên xwe me bileta xwe birî. Ber bi Îzmîrê ve em ketin rê. Li Îzmîrê em birin bajarokê Alîaxa. Li Alîaxa em birin gundekî mezin ku di qeraxa deryayê de bû. Di gund de em li malekê man. Ne şev ne jî roj em dernediketin. Heya çar rojan em wisa rawestiyan. Piştî çar rojan, êvarê, dema dinya bû tarî, em li kosterekê siwar bûn. Hêjmara me sih û heft bû. Motora kosterê hat xebitandin û em ber bi Yewnanîstanê ve ketin rê. Rêya me ser avê re bû. Lingên me erdê nedigirt. Min xwe wekî

ku li hewayê bim hîs dikir. Ev cara ewil bû ku min derya didît. Tarî bû her der. Ez ditirsiyam. Bê hemdê xwe dilerizîm car bi car. Di nîveka rê de, di nava deryayekê bê ser û bin de, motorê kosterê sekinî. Tiştekî ku min bikira tine bû. Min destê xwe xist paşila xwe. Wê şevê di nava vê deryayê de dê çi bihata serê me min, min nedizanî. Kesê ku em dibirin li ser motorê xebitîn. Motor carna dixebitî, lê dîsa ditefiya. Cara dawî dema motor hat xebitandin, êdî nesekinî. Me rêwîtiya xwe ya li ser deryayê domand. Wê şevê em gihîştin qeraxê Yewnanîstanê. Me xwe ji kosterê berda ser axa Ewropayê.

Erê Ewropa. Lingên min li ser axa Ewropayê bûn. Qaşo êdî ez jî bûbûm Ewropayî. Nizanim çima, di nava dilê xwe de, min ti kêfxweşiyek nedît. Bîna axê ne weke ya devera me bû. Bayê ku li rûyê min dida ez çavtirsandî dikirim. Di koma me ya penaber de her kes rûken bû. Carna bi dengê bilind dikeniyan, carna jî li hev temaşe dikirin û dibişirîn. Te digot qey di şerekî meydanî de serkeftineke mezin bi dest xistine. Wisa kêfxweş, bi coş û madxweş bûn. Lê ez... Ez bêdeng bûm. Dilê min dikir gupegup. Mejiyê min tevlihev, hizra min têkel, hestên min rûxiyayî bûn. Piştî meşa di demekê ajot de koma me gihişt gundekî. Li wir em sekinîn heta ku rayedarên dewletê û polîsên wan hatin. Wana em girtin. Siwarî maşîneyan kirin û birin heya paytext Atînayê.

Li Atînayê deng û rengê me, nav û paşnavên me hatin tomar kirin. Ez êdî bûm penaberekî fermî yê Ewropayê. Ez nebûm Ewropayî lê bûm penaberekî Ewropayî. Dema ev gotin tê bîra min, ez di hizrên xwe de çûm cem pêlavzeran ku wî ji bo me gotibû, ″Ewropa nabe ya we.″ Bêgûman, bûyîna hemwelatiyê cihekî, wisa ne hêsan bû. Yewnanan ji konteyniran bajarek ava kiribûn. Em birin xistin

van konteyniran. Ji her hal û tevgera me diyar dibû ku em ne yên vê derê ne. Berovajiyê ku gelek dihizirîn, bi çûyina Ewropayê re em nebûn wek Ewropayiyan. Em weke xwe bûn dîsa, lê belê em ji kokên xwe, ji rêça xwe qut bûbûn. Di konteyniran de jiyankirin zehmet, bi hev re demborandin wek şêweya jiyana dîlan bû. Xwarinên ku dihatin belavkirin bi giştî nedihat xwarin. Ez û yên ku weke min xwedî diravan bûn, me gelek caran li sûkê dixwar. Dema me piranî di kampê de derbas dibû. Lê belê carna jî em diçûn nava sûkê û em digeriyan. Di kolanan de ez ji xwe re li siberojekê digeriyam. Lê mixabin, ti rêyeke ronî li pêşiya min diyar nedibû.

Carekê çûm dîskotekekê ku zaf qala wê dihate kirin. Êvarekê min xwe berda jêrzemînekê. Hundir nîvtarî bû lê bi sedan gulop jî pêketî bûn. Bi van gulopan hindir ronî nedibû. Dîskotek weke jiyana Ewropayê bû. Ji dûr ve xweş xuya dikir. Dema ez ketim navê, min dît ku pir şilo ye. Rageşiyeke bêkêmasî hebû. Ewropa ji dûr ve weke jineke xweşik bû lê di koka xwe de ew laşfiroşekî bû. Yên ku pê nedihesiyan di nava xweşikbûna wê ya xapînok de winda dibûn. Dîskotek jî her wisa bû. Cara ewilî bû ez ketim navê, min fam kir ku pêwîst e ez bi vê laşfiroşê re ranezêm.

Ew jî wisa bû; piştî ku ketim jêrzemînê, çûm li ber barê sekinîm û min dest bi vexwarina vîskî kir. Piştî çend kêliyan jineke temen ser sihî re hate cem min. Merhaba da min û min jî silava wê wergirt. Jixwe me zimanê hev fam nedikir. Jinikê ji xwe re vîskî xwest. Wê jî dest bi vexwarinê kir. Dikeniya carna, bêsebep. Carna jî dibişiriya. Ji min re bû meraq, ka dawiya vê nêzikbûnê dê çawa be! Min bersiva jinikê dida, carna bi ken carna bi lebat. Jinik hêdî hêdî nêzikî min dibû. Min dest avêt newqa wê û ber bi xwe ve kişand.

Tew lo! Ew di berê de hînkirî bû û pişta xwe da min. Min ew kişand ber bi xwe ve. Wê qorikên xwe ajotin ber bi pêşiya min ve. Em çend kêliyan man wisa. Germahiya qorikên wê belavî bedena min bû. Ez hêdî hêdî ji xwe diçûm. Jinik zivirî û berê xwe da min. Hêdîka xwe nêzikî rûyê min kir. Bînek kişand û lêvên xwe danî ser lêvên min. Dema xwe paş ve kişand, weke ji xewnekê şiyar bibim, şiyar bûm. Min dora xwe nihêrî. Nîv tarî bû. Ti kes ez nedîtibûm. Ji lew re min şerm nekir ji xwe. Jinikê ez ber bi derve ve kişandim. Lê min destê xwe ji destê wê rizgar kir û ber bi destavê ve çûm. Min rû û çavên xwe şûşt. Di deriyê piştê re derketim derve û di kolanê de ber bi jêr û ber bi jor ve çûm û hatim. Paşê, dîsa ketim hundir. Min ev jinik di goşeyekê de dît. Li gel ciwanekî din ê kurd bû. Ber bi pêş û ber bi paş ve diçû û dihat. Êdî min fam kir; temenmezinên Ewropî li gel ciwanên me demeke xweş derbas dikin, ji hestan dûr. Paşê ez fêr bûm ku, ji vê kirinê re digotin 'pêwîstiya biyolojîk.' Ew hezkirin û pîroziyên me tenê pêwîstiyeke biyolojîk bû li gel wan. Jiyana ez şahidê wê bûm weke diskoyekê bû. Ne min dikarî bi vê jiyanê re bibim yek, ne jî wê jiyanê ez weke xwe digirtim nava xwe. Dîsa hêviyên min ser û bin, hestên min têkel bûn. Rê li pêşiya min qediya. Lingên min erdê nedigirt. Mabûm li hewa. Dihejiyam bêserûber, weke şaxeke dara hişkbûyî. Carna ber bi çep, carna ber bi rastê ve li ber bayê diketim.

Şeş mehan bê kar mam li wê kampê. Di nava wan konteyniran de, di dinyayeke teng û biçûk de mabûm. Qaşo li Ewropayê serbestî, azadî û demokrasî bêsînor bû. Ya rast, ez di qampekê de, di nava konteynirekê de girtî û bêçare bûm. Qaşo çare hatina li ser axa Ewropayê bû, lê di nava vê çareyê de min bêçareyî û bêrûmetî dît. Lewra min zaf bê-

riya gund, gundik û bajarokê xwe kir. Deşt û çiyayên min, li ber çavên min giranbiha bûn. Êdî dost, heval û cîranên min, dihatin xewnên min. Malbata min, bira û xwîşkên min yên piçûk; min bêriya bîna wan kiribû. Êdî ez qaneh bûm. Ewropa bihuşteke xapînok bû. Ya rast, vegera ser gor û goristanên pêşiyan bû. Ez ji ruhê wan, ji rênîşandayîna wan dûr ketibûm. Pêwîst e ez ji nû ve li ser koka xwe şîn werim. Kok vedim û şax bidim weke şaxên dara maziyê.

Belê, min biryara vegerê da. Ez çûm balafirgeha Atîna. Li balafirê siwar bûm bi hestên têkel. Hatim heya balefirgeha Stenbolê. Li wir min balafir guhert û siwarî balefira Hewlêrê bûm. Ji wir hatim balefirgeha Hewlêrê peya bûm. Ez qet nesekinîm, min da rê û rasterast çûm Zaxoyê. Çûm kampê, cem malbata xwe.

Weke lîstokeke pêkenok bû, çûyin û hatina min a Ewropayê. Pir bi zehmet, bi rojan mayîna di rê de, ez gihîştibûm Ewropayê. Hatin jî pir hêsan bû. Bi balafirê û di rojekê de. Nizanim kî ye van tinazên xwe bi me dike. Çûyîn, mayin û di hatinê de, tev de pênc hezar dolarê min çû. Rawestgeha ku herî dawî ez lê rawestiyam, ev kamp bû,  yek ji kampên penaberiyê yên Başûrê Kurdistanê. Ez îcar penaberê li ser axa welatê xwe bûm. Ez tê gihîştim, min dizanî, hinekan tinazên xwe bi me dikirin. Kêf û şahiyan li dar dixin, li ser keda me, li ser êş û azarên me, li ser xwîna me.

Heya meha rêbendana du hezar û şazdehan, em man li kampê. Di vê mehê de em rûniştin weke meclîsa malê. Me biryar da ku em vegerin ser axa xwe ya kevnar. Me da rê û em hatin Xanasor a Şengalê. Dibêjin, wextekî jinek hebûye, pir bedew bûye. Wê rêberî kiriye di vê herêmê de. Navê wê derketiye heft qatên asîman. Xanê ye navê wê jinikê.

Porsor û tensor. Lewra navê vê derê kirine ´Xanêya sor.´ Ev nav maye ji vê komelgehê re û jê re hatiye gotin ‘Xanasor.’

Dema bi malbatî em hatin Xanasorê, min dît ku gelek tişt hatine guhertin. Bi baweriya min, ew cara yekem e ku piştî fermanekê ev qas zû êzdiyan xwe daye hev. Hêzên leşkerî hatine birêxistin. Di nava vê rêxistinê de jinên êzdiyan çek hildane û li hember dijminê hov şer dikin. Êdî jin bi xwe tola xwe hildidin. Asayîşa Êzdîxaneyê hatiye avakirin. Jin birêxistin tev digerin û xwe rêxistin dikin û rêxistina xwe ber bi pêş ve dibin. Ciwanên me bûne xwediyê rêxistina xwe ya xweser. Êdî bi navê êzdiyan dîplomasî jî tê kirin.

Ez amade me, xwe bi xwe. Min nîqaş kir, bi xwe re. Min got, ha hoo, ez dereng mame. Ez destpêkê çûme perwerdehiyê. Min mehek perwerdehî dît. Paşê ketim nav kar. Em mal bi mal digeriyan. Me xwe di nava gel de saz dikir.

Dewletê, xwe di jor de saz kiribû. Lewra dema ferman rabû ew rêxistina ku di jor de ya desthilatan bû, kêrî me nehat. Lê belê rêxistina ku em bi xwe ji jêr ve gav bi gav ava dikin, niha li hember çeteyan şer dike û gundên me rizgar dike.

Alikariya ku ji derve tê kirin, pir kêm digîhîje destê me. Jixwe hinekên noker dest datînin ser û yan nahêlin bigîhîje me yan jî weke xêra xwe bikin didin me. Bi vê rêbazî dixwazin me bi xwe re girê bidin, da ku careke dinê li ser maseyê bikaribin me bifiroşin hinekan. Alikariya rasteqîn, ji Rojavayê Kurdistanê tê; bê gerew û bê serevdekirinê. Jixwe ji roja destpêkê heya niha her li gel me bûn.

Di 24ê Pûşbera 2016an de, me kongreyek saz kir. Di vê kongreyê de me partiyek bi navê Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzdiyan (PADÊ) ava kir. Di dema hilbijartina meclîsa partiyê de ez jî hatim pêşniyarkirin. Di dengdanê

de ez jî bi ser ketim û bûm endamê meclîsa PADÊyê. Niha ez xwe li gor berê pir pêşketî dibînim. Lê belê gor demê ez lewaz im û pêwîst e xwe bi pêş bixim. Pêwîstiya min bi perwerdehiyeke bi rêkûpêk heye. Ez xwe amade dikim, da ku salekê di perwerdehiyê de bimînim. Ez fêrî tekmîlan û civînan bûme. Dikarim siyaseta herêmê û ya dinyayê binirxînim. Di pêşiya gel de biaxivim. Dikarim semîneran bidim. Çi ecêb! Vana taybetmendiyên ji rêzê ne, di gelek welatan de. Mixabin em hîna nû nû fêr dibin. Ez dibim yê xwe. Fêr dibim, xwe bi rê ve bibim. Ji lew re ji deste me hat ku em Meclîsa Rêveber a Şengalê damezrênin û bi pêş de bibin. Me nas kir azadî û demokrasî. Tiştên berê li dû me man. Ji vir û şûn de, kes nikare me bi rê ve bibe. Êdî me rêya xwe nas kir. Rêya azadî û serfiraziyê, rêya wekhevî û mirovheziyê; ya ku Rêber Evdile Ocelan afirandî û bi tîpên zêrîn neqş kirî…

* * *

Ez im, Vewrês, piştgirê YBŞê. Di sala 1993an de min çavên xwe li vê dinyayê vekir. Piştî em ji nû ve vegeriyan li ser axa xwe, ya ji pêşiyên me ji me re mayî, demekê betal û bê kar geriyam. Ez bûbûm xwediyê kolanan. Tu carî bêkar nebûm. Piranî bi karên malê mijûl dibûm. Binesazî nemabû di Xanasorê de. Di bexçeyê xaniyê me de bîreke avê hebû lê belê ji bona wî dînemo pêwîst bû. Ava ku ji bîrê derdiket tal û şor bû. Lewra nedihat vexwarin. Ava şîrîn ji quntara çiyê dihat lê sazgerîn têk çûbû. Herwiha ceyran pirsgirêk bû. Carekê mal wêran bûbû. Ew çeteyên gemarî, ne tenê mirov qetil kiribûn, xweza, mal, her tiştê ji jiyanê re pêwîst serobino kiribûn, talan biribûn. Ji nû ve pergalsazkirin zehmet bû. Li gel ev qas pirsgirêkan, rewşa me ji ya kampê gelekî baştir bû. Ji ber ku em azad bûn. Kesî zext li me nedikir. Me ji bîra malê, tankên avê yên li ser xaniyên xwe dadigirt û bi vê avê paqijiya malê jî dikir. Tankeke me ya ji bo ava vexwarinê jî heye. Lê mixabin herdem ev av peyda nabe. Ji ber ku maşîneyên avê dikişînin, zû bi zû peyda nabin. Yên hene jî têra me hemû malan nakin ku ji me re avê bikişînin. Em carna ava tal û şor vedixwin, pê çaya xwe jî çêdikin. Ya herî kembax, dema ez pê serê xwe dişom, porê min dibe weke sîxên sîxuran. Wisa hişk disekine. Lê em ji vê jiyanê qayîl in. Ji ber ku ewlekarî ji me ye, hêzên parastinê ji me ye û em bi xwe yê xwe ne. Em

serbixwe û xweser in. Heke pirsgirêk jî peyda bû, em xwe bi xwe çareser dikin. Heke pirsgirêk mezin û girîng be, em di dadgeha gel de kom dibin û xwe ji pirsgirêkê zelal dikin. Di dawiyê de, her alî bi kêfxweşî derdikevin ji dadgehê.

Piştî demekê min ji xwe re dikanek danî. Ez bûm dikandarê taxa xwe. Di navbera mal û dikanê de diçûm û dihatim. Tenê roja çarşemê dikanê venakim. Ew roj betlane ye. Ji ber pîrozbûna rojê, em êzdî di wê rojê de ti karî nakin. Herwiha em xwe naşon. Ew roj rojeke weke îna misilmanan û weke roja yekşemê ya xiristiyanan e.

Çi çalakî hebe beşdar dibim. Bi taybet çalakiyên tê de meş hebe û ji semîneran hez dikim. Yek laşê min bihêz dike, yek jî mejiyê min dide xebitandin. Zimanê civaka me ya nû çalakî û perwerdehî ye. Li hember bûyerên li Şengalê diqewimin, em bêdeng namînin û helwesta xwe eşkere dikin. Tenê Şengal na, ji bo deverên din yên Kurdistanê jî em xwedî helwest in. Rêk û rêgezên me hene. Her rêxistin û dewlet xwediyê hin xetên sor in. Em jî xwediyê hin xetên sor in. Demokrasiya radîkal û welatparêziya rasteqîn du diyardeyên jêneveger in ji bo me.

Weke piştgirê YBŞê, tevlî pêngavên leşkerî jî dibim. Weke şervanan jîr nîn im lê di asta xwe de ez jî karê ku dikeve li ser milê min ez wan pêk tînim.

Serê sala 2016an, pêngava rizgarkirina Medîban dest pê kir. Dema min bihîst, bê rawestan min berê xwe da Medîbanê. Jixwe ev ji bo min fersend bû, ji boyî ez kîna xwe ya ji fermanê girtî û êşa xwe ya di fermanê de bi çavê xwe dîtî li hemberê çeteyên hov birêjim. Di navbera Çiyayê Kolik û gund de gir hebûn. Hevalan ez li girek ku dikeve rojavayê gund bi cih kirim. Ev der ji bona parastina bejahiyê girîng bû. Em sê kesên sivîl, li gel şeş şervanan bûn. Li ser gir de

doçka, BKC, B-7 hebûn. Dema pêwîst dikir me doçka li ser dijmin de bikar dianî. Ji me re xwarin ji derve dihat. Dayîk ketibûn nava liv û tevgerê. Nan û xwarin amade dikirin û ji me re dişandin. Di serê gir de me naylon vedabû. Bi barîna baranê re av di ser naylonê de kom dibû. Ava kom bûyî me dikir firaxan. Stargehên me hebûn. Em di ber baranê de şil nedibûn. Hevalên me yên ku di deştê de dor li dijmin girtibûn bi qasî me ne bi şans bûn. Ew di bin baranê de şil dibûn. Heke hebûya çadirên neferî yan jî qeteke naylon, vedidan û xwe ji şiliyê diparastin. Ava di dolik û çalikan de kom dibû bikar dianîn. Şervan mal bi mal, gir bi gir ber bi pêş ve diçûn û gund rizgar dikirin.

Hey zeman… Zeman carna tal e, carna şîrîn e. Dem û dewran, doh kî direviya û kî li pey kî diçû, îro kî direve û kî di pey wî de baz dide. Dewrana me jî hatibû û çawa ew ketibûn dû me, em reviyabûn bê serûber, îro em dikevin pey wan, ew çeteyên qîrêj û gemarî ji ber me direvin û diterikînin vê axa me ya pîroz.

Carna hevalan bi bêtêlê, kuştina çeteyan radigihandin û wê demê min axînek kûr dikêşa û min qîr dikir û digot: "Dayîkno, xwişkno, birano! Va ye tola we ji wan hov û guran, ji wan bênamûs û bêexlaqan yek bi yek tê hilanîn. Hûn di gorên xwe de bi aramî razên. Îro zarokên we û zarokên agir û rojê, yên Rêber Evdile Ocelan, ketine pey gûrên devbixwîn û wana yek bi yek didin erdê û wisa tol û heyfa we hildidin." Pîştî vê qîrînê, nizanim ji ber çi, lê dilê min rehet dibû.

Piştî çûyina min re heftiyek, pêwîstî bi ajokarekî ambulansê derket. Ji min pirsîn. Min got, di ajotina her maşîneyekê de baş im. Fermandarê me yê ku li ser gir erkdar bû, pêşniyar kir ku ez herim û ajokariya ambulansê bikim.

Pêşniyar hat pejirandin û ez derbasî ser ambulansê bûm. Êdî, min li nexweşxaneyê kar dikir. Ji ber ku pêngava rizgarkirina gund dest pê kiribû, me hemû amadehiyên xwe li gorî vê dikir. Birîndar û şehîd çêdibûn. Ez bi maşîneya xwe li gel bijîşkan diçûm bi hawara wan ve. Min pir bi lez dikir ku ez xwe zû bigihênim cihê birîndaran da ku wan zû xilas bikim. Ji ber ku min jibîr nekiriye ew rojên fermanê dema ew gerîla jî bi lez û bez ber bi me ve dihatin û em ji çeteyan rizgar dikirin. Çawa ava xwe û nanê xwe bê ku bixwin didan me û em ji tînahî û birçîbûnê rizgar dikirin.

Rojekê em di nuqteya xwe de bûn û ji nişka ve ji bijîşkê me re telefon hat. Dema bijîşk telefonê vekir û bersiv da, xetên rûyê wî guherîn û rengê wî avêt. Min fam kir ku tiştek heye. Ji ber vê, bê ku bijîşk bibêje, ber bi maşîne ve çûm û min maşîne xebitand. Bijîşk û berdestê wî bê ku tiştek bêjin, hatin û siwarî maşîneyê bûn. Bijîşk gote min: ´Medîban´. Min jî wisa fam kir ku şehîd û birîndar hene û pêwîst e em bi lez biçin bi hewara wan ve. Lê belê di rê de bijîşk gote min: “Birîndarek heye, heke em zû bigihîjin dibe ku em wî ji şehadetê rizgar bikin.” Bi vê gotinê û şûn de, hîna zêdetir min lingê xwe pê li pedala benzînê kir û maşîne lezand. Me Çiyayê Kolikê derbas kir û xwe berda deşta Medîbanê. Hevalan bi bêtêlê rê nîşanî me dan. Me xwest kêliyek berê bigîhîjin birîndarê xwe û ew ji şehadetê rizgar bikin. Rêyên deştê ax bûn û dişibiyan hevdu. Em ketibûn rêyeke şaş. Em qasî şeşsed metre çûn. Di bin maşîne de, teqemeniya ku çeteyan bi cih kiribû teqiya. Teqemenî li milê rastê, di bin teleşa pêşî de teqiya. Maşîne bilind bû û dengek ecêp derket. Em man di nav toz û dûmanê de. Henaseya min qut bû. Min got, temam e, va ye ez dimirim.

Min piştî vê bûyerê çavên xwe di nexweşxaneyê de vekir. Ez nemiribûm. Destpêkê min pirsa hevalên xwe kir. Kesî bersiva min neda. Lewra min fam kir ku hevalên min rizgar nebûne. Ez ji her du lingên xwe birîndar bûbûm. Du mehan mam li nexweşxaneyê. Paşê derketim hatim malê. Bi alikariya du gopalan dikarim hêdî hêdî bimeşim. Destpêkê, mehê carekê, niha du mehan carekê diçim kontrola bijîşkî. Ew dibêjin, "Tu yê baştir bibî."

Hevalên ku min di şer de naskirî, dem bi dem têne serdana min. Em rûdinin û qala çalakiyên berê dikin. Bêgûman pakrewanan bi bîr tînin. Yê ku birîndarbûyî, ne ez tenê me. Ez ne kesî sucdar dikim ne jî berpirsyariyê li para hinekên din dihêlim. Min erka xwe bi cih anî. Di encama wê de bûme gazî. Serbilind im! Di nav civakê de tême hezkirin. Rêz li min tê girtin. Ez û civaka ku ez pê re me, em dizanin em çi dikin. Ji lew re bi kirinên xwe serfîraz im.

Jiyan didome. Min nedixwest xwe di ser gazîtiyê de razînim. Min dest bi kar kir. Di dikanê de, li ser kursiyê rûdinim. Heval û hogirên min dibin alîkar. Tiştan tînin di dikanê de bi cih dikin. Dikanê paqij dikin. Ez tenê li ser kursî pal didim. Heke kesek hat, tenê diravan jê distînim. Dost û cîran min bi maşîneyên xwe tînin dikanê û dibin malê. Xwedê ji wan razî be. Heke qediya, di dema pêş de, qet ne be lingekî min baştir bibe, ez ê maşîneyeke otomotîk bikirim. Wê demê ez ê bikaribim baştir karê xwe bi rê ve bibim. Ji çalakiyan qut nebûme, lê weke berê nameşim. Bi duçerxa gaziyan ve bi rê ve diçim. Yek di pişt de disekine û dahf dide. Dirûşmeyan diavêjim bêgûman. Dibêjim: *"Serî Hilde Êzdîxan, Azad Dibe Kurdistan!"*

* * *

Ez im Mensûr, pakrewanê welat. Bi malbatî em gihiştîn kampê. Şevek û rojek mam li wê dinyayê. Yên ku em li Şengal firotin, vê carê bi şêwazekê din li me xwedî derdiketin. Bi minet û bi zext. Kel û mel didan, lê belê di beramberê vê de girêdahiyek dixwestin. Wisa tevdigeriyan, te digo qey dibêjin: "Hûn çima rizgar bûn hatin heya van deran." Hişmendiya em û hûn ava kiribûn carekê. Her çawa be em yên dinê bûn. Heqê me yê jiyanê tinebû li gel wan û em ne mirov bûn. Heke heqê me hebe jî weke kole hebû. Lewra, ber êvarekê gihiştim kampê û roja din berêvarê min da rê. Min texsiyek kirê kir. Çûm heya li ser pira Sêmalka. Beriya ku ez peya bibim, min ji ajokarî re got: "Diravên min tine ne, heke tu bipejirînî ez ê telefona xwe bidim te." Pir mêr bû (!) Qet negot, hûn ji fermanê derketine, bila ew jî xêra kuştiyên fermanê be. Telefona min girt û kir bêrîka xwe. Wê demê weke tu fîşekek li serê min bidî, min hîn baştir fêm kir ka çima wan dest ji me kêşabûn û em di nava fermanê de hiştibûn. Yê xencer li pişta me dayî û em firotin û yê telefona min ji ber heqê kirêya rêyekê ji destê min girtî; yek feraset û yek fikir bûn.

Piştî ku min telefona xwe dayê, ajokar çû rêya xwe û ez çûm rêya xwe ve. Ez hatim li ser pirê, pêşmerge ji min pirsîn û gotin:

"Bi kû ve diçî?"

Min got:

"Diçim Şengalê."

"Nabe tu biçî."

"Çima?"

"Tu yê biçî beşdarî PKKê bibî."

Li gor wana beşdarbûna PKKê tawaneke mezin bû. Lê min nedizanî çima wisan e. Ya rast, min PKK jî nas nedikir. Min gote wan:

"Erê rast e, em bi malbatî hatine, lê birayekê min maye li wir, dixwazim biçim wî bibînim û bînim vir."

Bawer kirin, her çawa bawer kirin ez jî nizanim lê ya girîng bawer kirin û rêya min vekirin. Piştî ku ez li ser pira çemê Dîjleyê re derbas bûm, di kêleka rê de sekinîm. Piştî demekê barhilgirek hat û sekinî. Baş e ku ajokar Rojavayî bû û ji Dêrika Hemko bû. Çawa wî fam kir ku ez êzdî me, yekser guherî û got: "Tu kû derê bixwazî ez ê te bibim wê derê deynim." Min spasiyên xwe ji wî re diyar kirin.

Hîna em di rêveçûnê de, li nêzikê Dêrikê bûn, maşîne xera bû. Motora wê sekinî û êdî nexebitî. Ajokarî ji xwe zêdetir li ber min ket. Min dilê wî xweş kir. Min got: "Xeman nexwe, niha maşîneyek tê û ez ê siwar bibim û biçim." Wilo jî bû. Ez hatim Dêrikê. Çûm ba şervanan. Min got:

"Hatime beşdar bibim."

Yekî ji wan pirsî:

"Tu dizanî em kî ne?"

"Belê."

"Em kî ne?"

"Hûn teror in."

Bi rastî jî wê demê min gerîla û şervan nas nedikirin. Hinekan bi dev ew li ber çavên me reş dikir. Hinek rêzefîlmên tirkan jî, ew wekî kesên xirab nîşanî me didan. Min

jî wisa bawer kiribû. Piştî fermanê rewş guherî. Yên me wan bi qehremanî nas dikir û me bawerî bi wan dianî bûbûn xwefiroş û teror, yên me wan weke teror nas dikir û tu hêviyeka me ji wan tine bû, bûbûn qehreman û canfedayê civaka êzdî. Tenê gerîla hate bi hewara me ve. Ew li ber çavên min cuda bûn êdî. Cara destpêkê ku min gerîlayên jin dîtin, ez matmayî mam. Ez bi wan ve hatim girêdan.

Li Dêrikê ez birim cihê perwerdehiyê. Min cilên şervanan li xwe kir. Ez jî êdî bûbûm şervanekî ji wan şervanên ku nav û dengê wan li cîhanê belavbûyî. Dema min ew cil li ber xwe dîtin, ez pir bi coş û xuruş bûm û bi min re hestek cuda çêbû. Di kampa perwerdehiyê de, em pêncî şervan komî hev bûbûn. Ji vane tenê yek keçik, yên din tev mêr bûn. Hîna beşdarbûna keçên êzdî di asteke pir kêm de bû. Me sê rojan perwerdehî dît. Fêrî çekên weke kalaşnîkof, B-7 û BKCyê bûm. Li gel fêrbûna bikaranîna çekan, min perwerdehiya bîrdoziyê jî dît. Sê roj temam bûn û pişt re min ji fermandaran re ragihand û got: “Pêwîst e ez biçim Şengalê û beşdarî berxwedanê bibim.” Fermandaran ev daxwaza min di cih de nedîtin. Wan got: “Hîna zû ye ji te re. Xwe baş perwerde bike. Paşê here nav şêr.” Dilê min tijî, ji kerba çavê min sor dibûn û dinya tarî dibû. Êdî sebra min nedihat û min dixwest ez demek ji ya dinê zûtir biçim wê axa pîroz, mil bi milê zarokên welatê rojê, li dijî wan çeteyên gemar bikevim cengê û tola dayîk û bavan rakim. Bivê nevê ez ê biçûma Şengalê. Tişta ku min li ser biryar dabû û ev bûbû xwesteka min, ji aliyê hevalan ve hat pesendkirin û pişt re kes li pêşiya min nebû asteng.

Ez êvarekê li gel gerîla û şervanan siwarî maşîneyekê bûm. Wê şevê em hatin gihîştin serê Çiyayê Şengalê. Koma me li Amûdê bi cih bû. Hatina min ya vî çiyayî, ne weke

çûyinê bû. Di çûyinê de, me xwe ji mirinê rizgar dikir, lê di hatinê de êdî em ketibûn hewldana avakirina jiyaneke nû. Em ji nû ve radibûn ser pêyan û xwedî li çanda hezarê salan derdiketin. Pêşiyên me mîrateyek ji me re hiştibûn. Pêwîst e em jî vê mîrateyî bigihînin yên li pey me tên. Ji bona vê ez li serê çiyê bûm.

Dil di destekê de, çek di destekê de, awirên min weke tîrêjên rojê bûn. Bila bitirse dijmin, dilê wan biqete, vaye ez hatim, ez êdî li çiyayên azad im, ez natirsim, werin hûn li kû ne, çima hûn xwe diveşêrin! Va ye neviyên Şerfedîn û Çilmêran daketine qada şêr.

Bi fermanê re Yekîneyên Berxwedana Şengalê ango YBŞ hatibû avakirin. Ew rêxistineke xweser ya leşkerî bû. Di milekê de ferman hatibû, lê di milê din de jî, hêzên leşkerî yên parastina rewa ava bûbûn. Min jî di nav de cih girtibû. Çi hesteke xweş e û çi xweş tê guhê mirov, gotina YBŞê. Dema min ev nav bihîst û piştî hatim bûm endam û min jî cihê xwe di nav de girt, êdî min xwest ji tevahiya cîhanê re bikim qîrîn û bi taybet ji bo civaka êzdî bibêjim; mizgînî, mizgînî, mizgînî... Va ye avabûye hêza Êzdîxane. Êdî êzdî jî bûne xwedî hêz û vê carê ev hêz ne mîna hêzên berê ye, ev hêz bi mirovan dide hîskirin ku em bi xwe yên xwe ne. Êdî Şengal ne bê parastin e.

Ew bêçaretiya çend rojên destpêkê yên fermanê nemabû bi min re. Li gel hemû kuştin, revandin, destavêtin û îşkenceyê, min êdî pêşiya xwe didît.

Du roj mam li nuqteya Amûdê. Fermandarî ez veguhestim Geliyê Şilo; geliyê kevnar, weke hemêza dayîkê. Asê û ji parastinê re pir guncaw bû. Em li çiyê, çete li deştê bûn.

Şevekê nîvê şevê, em çar şervan çûn pişt satirê û me dora nobetê wergirt. Satira me nêzikê devê gelî, di rêyeke

ax de bû. Bi berbangê re, dema hewa hêdî hêdî ronî dibû, çete hatin û êrîşî me kirin. Bi maşîneyekê, di ser rê re hatin ku xwe di satirê de ango di me de biteqînin û piştî vê teqînê jî êrîş bikin. Maşîne qasî du sed mêtre nêzik bû û piştre me dest bi gulebaranê kir. Hevalekî me BKCyê yekî din jî B-7ê dixebitand. Roket û gule bi hevre diçûn ber bi wê maşîneyê ve. Ji nişka ve maşîne teqiya. Bi teqandinê re nava me lerizî. Lê belê tiştek bi me nehat. Piştî ku maşîne teqiya, çeteyên ku xwe bi erdê re kiribûn yek, dest bi êrîşê kirin. Heta ku ew hatin, hevalan jî cihê xwe girtin. Weke ku çeteyan hêvî dikir, nebû. Me cihê xwe berneda. Ew her ku di ser me de hatin, yan mirî yan jî birîndar bûn. Pevçûna me bi qasî saetekê dewam kir. Paşê çete têk şikestin û pişt re reviyan û vê carê me da pey wan. Bi qasî sê sed metre em di pêş de çûn. Ez rastî termekê çeteyan hatim. Serî heta binî cilê reş li xwe kiribû, birih bû; rihekî dirêj berdabû. Lê porê wî bala min kişand; min dest avêt porê, wî lê por ne yê wî bû, poreke çêkirî weke perûk dabû serê xwe. Di eslê xwe de serê wî keçel bû. Ez kêliyekê di ser vî termî de sekinîm. Mixabin! Em ji ber van reviyabûn. Min fam kir ku, tirsek hatibû avakirin. Tirs  ava kiribûn di dilê me de. Reva me ji ber vê tirsê bû ne ji van çeteyan. Piştî vê pevçûnê em vegeriyan cihên xwe. Êrişeke din a çeteyan me têk bir. Lê ji bo me ya girîng ne ev bû, ya girîng ew bû ku em gundên xwe ji destê wan çetayan derxin. Çeteyan biqewitînin û gelê xwe vegerînin li cih û warên xwe.

Li Geliyê Şilo em di şikeft û ber latan de diman. Kaniyeke zêrîn li ser me, di nava gelî de bû. Xurîş û kel û melên xwe me bi pişta xwe dibir gelî. Erê, ez fêrî nanpêjiyê jî bûm, fêrî xwarin çêkirinê jî. Cilê xwe bi destê xwe dişom. Cihekî qetiyayî hebe bi destê xwe didûrim. Her şev û roj nobetê

digirim û diçim dewriyê. Çi ecêb! Em hev rexne jî dikin. Hevalek di pevçûnê de ketibû êrîşê, min ew rexne kir. Ji ber ku pir xwîngerm bû, bêyî pişta xwe xurt bike, di pêş de çûbû. Wî fedakarî kiribû, lê min ew rexne kir. Rast e, wisa ye. Heke fedakarî be jî, pêwîst e li gor pîvanên rêxistinê be. Ev şer e. Li gorî xwe tevgerîn nabe, di bin de fedakarî jî hebe. Erê, çiqas hatime guhertin, di van çend mehan de. Ez carna li rewşa xwe dihizirîm û min ji xwe dipirsî, bi rastî jî, gelo ev ez im; ez im ev qas kar dikim bêrawestan, ez im şev û roj dixebitim, ji dil û can! Belê ew ez bûm û êdî min nû dizanî ez heme û ez yê xwe me.

Dem hatibû, demeke nû. Fermandarî got: "Te di pratîkê de ezmûn derbas kir. Pêwîste bi perwerdehiyekê li gel ezmûna pratîkî ya teorîk jî temam bikî." Rojekê, piştî danê sibê, merasimek hate lidarxistin. Fermandarê fewca me derket pêşberî hevalan. Çûyina min ji fewcê re ragihand. Paşê ser navê hevalên fewcê ji min re serkeftin xwest. Ez vexwendim pêşberî hevalan. Ez di wê kêliyê de ji şerma sor bûm. Di merasîmekê de tu carî derneketibûm pêşberî hevalan. Ez dizanim, li pêşberî hevalan min çend tişt gotin, lê nizanim min çi got. Hemû hevalên min ku di pêşberê min de ne, heke ne di merasîmeke fermî da bana, dê henekê xwe bi min bikiribana. Ez çûm û min yek bi yek destê hevalan girt. Çenteyê xwe da pişta xwe û ketim rê. Her tişt xweş bû û her tişt bi dilê min bû. Lê, tenê ya nexweş veqetîna ji  hevalan bû. Ji ber ku veqetin rastî jî pir bi dilêş û nexweş bû. Rojên xweş û nexweş me bi hev re dîtibûn. Hinek hevalên me şehîd, hinek jî birîndar bûbûn. Lê ez diçûm. Min dilê xwe xweş kir û ji xwe re got, ez ê hin hevalên nû nas bikim. Çûyina cihekî nû, naskirina hevalên nû, kelecaneke cuda bû.

Di rawestgehekê de rastî Evînê hatim. Evîn yeke porreş bû. Çermê wê kej bû, lê ber bi reşbûne ve diçû. Porê xwe kiribû kezî û li ser milê xwe de berdabû. Bejna wê navîn bû. Ew jî diçû perwerdehiyê. Ji ber ku wekî min diçû perwerdehiyê, bêtir nêzikî wê bûm. Min dixwest ew nas bikim. Wê jî xwe neda alî. Bi min re kete gotûbêjê. Du mehên perwerdehiyê em ê bi hev re derbas bikin. Ji lew re em zû aşnayê hevdu bûn. Va ye min ji niha ve hevaleke ku pê re têkiliya xwe deynim nas kiribû.

Piştî nîvroj, em gihîştin cihê perwerdehiyê. Akademiya perwerdehiyê li kêleka gundekî, di nav daran de bû. Payiz bû. Pelên daran weşiyabûn. Erd fîstanê zer li xwe pêçabû. Lê em hatibûn ku dil û mejiyê xwe bikin yek. Xwe kûr bikin, xwe biguherînin û birînên fermanê bipêçin. Rêyeke nû li ber xwe rast bikin. Pêşiya xwe, siberoja xwe ronî bikin.

Em di roja yekê de, serê sibê kom bûn. Sê fermandarê me hebûn. Ji wan yek jin, yên dinê jî zilam bûn. Di destpêkê de, rasteqîna derbaskirina bîst û çar saetan li ber me xêz kirin. Diviyabû demên betlane û serbest jî em vala derbas nekin. Paşê ref bi ref navê me xwendin. Bi giştî em sê ref bûn. Yek ya jinan du jî yên zilaman bûn. Wê rojê her qefleyek hate bicihkirin. Cihê perwerdehiyê, yê razanê û yê xwarinê diyar bûn. Ew roj wisa bi axaftina çawaniya rêxistinê û hevdu-naskirinê ve derbas bû.

Roja din, waneya me ya ewil dest pê kir . Belê perwerde. Em çima perwerde dibin? Heke em perwerdekirî bûna, gelo wê ferman bi serê me de bihata? Heke em dikarin li ber xwe didin û dijmin diqewtînin, gelo ma ne bi saya perwerdê ye! Em wisa ketin navê. Di akademiya leşkerî de, waneyên teorîk û pratîkî yên leşkerî me dîtin. Nizanim du meh çawa derbas bû. Devê min vebûbû. Min weke bilbilan

dixwend. Dawiya du mehan, dawiya dawiyê, platform hebûn. Ez wisa hêdî hêdî fêr dibûm û wisa min di jiyanê de rûpelek nû ji bo xwe vedikir. Êdî min baş dizanî, di jiyana mirovan de çiqas girîngiya perwerdehiyê heye.

Roja ku me dest bi platforman kir, hinek fermandarên me yên payebilind jî hatin. Em yek bi yek derdiketin pêşberî hevalan. Wisa hesab tê pirsîn, tu dibêjî qey roja mahşerê ye. Ketin û jihevbelavbûna civakê, ferman bi xwe re tînin. Bêperwerdehî, bêîradeyî û bêrêxistinî kesayeteke pûç û vala diafirîne. Ji lew re, kesayeteke bihêz pêwîst bû û divê ji agir bûya. Nexwe, ew civak dê çawa li xwe vegeriya.

Ez pir bi kelacan û bi xuruş bûm û wisa di nava bendewariyan de li hêviya dora xwe bûm. Dem hatibû û leza dilê min bêtir bûbû; ji ber ku dor hatibû min. Derketim pêşberê hevalan. Ez pir aram dixuyam; bi rastî, derveyî min wisa bû, lê di hundirê xwe de dikeliyam. Wisa bi kelecan bûbûm ku min xwe bi xwe digot, ez ê niha ji hişê xwe biçim û rezîl bibim. Çavên her kesî li ser min bûn. Piştî çend xulek derbas bûn, bahoza ku di nava min de rabûbû, kêm bû û paşê sekinî. Evîn rabû ez rexne kirim. Wê got: "Pir serhişk e. Dema tiştek got, çi dibe bila bibe dike. Ev baş e. Lê belê carna rewş, şert û merc diguherin. Pêwîst dike mirov biryara xwe di ber çavan re derbas bike. Ya din jî, her xwestek an gotina kesî, herdem bi rêxistinê re nabe yek. Ji lew re pêwîst e mirov rastiya rêxistinê bide ber çavan. Rêxistin îradeya me hemûyan e. Pêwîst e heval Mensûr, fikir û zikrê xwe bi rêxistinê re bike yek û wisa bimeşe." Paşê fermandar û hevalên min yên perwerdehiyê rabûn û ez rexne kirim. Tam du saetan bê navber ez mam li ser lingan. Piştî rexneyan min dest bi axaftinê kir û wiha bi dawî kir: "Heya jinek û zarokekî êzdî di destê çeteyan de

hebe, ez ê heya dilopa dawî ya xwîna xwe tê bikoşim. Heya gelê kurd negihêje armanca xwe û pergala xwe ava neke, amade me di her cihekî Kurdistanê de tê bikoşim." Piştî vê axaftinê, dîwanê got: "Heval dê sond bixwe. Kesê dijber heye?" Ji ti kesî deng derneket û ti kesî bertek nîşan neda. Paşê dîwanê got: "Tu dikarî sonda xwe bixwî." Min sonda xwe xwar. Bi çepikên hevalan, bi lez çûm û di cihê xwe de rûniştim. Ew barê giran ku li ser pişta min ava bûbû, rabû û ez sivik bûm. Piştî platformê, te digot qey ji bin barekî ji deh tonî de derketime, wisa rehet bûm.

Ez ji perwerdehiyê derketim û pişt re, fermandarî di Geliyê Kersê de ez erkdar kirim. Heman rengî, Evîn jî veguhestin wê derê. Di wir de biryargeha leşkerî hebû. Ji min û Evînê re gotin: "Hûn ê di nav gel de bin. Karê we xwegihandina ciwanan e." Demekê ez, Evîn û komek şervanên dinê me bi hev re xwe berda nav ciwanan. Li ser Çiyayê Şengalê, çi gund be çi kon be em diçûn navê û me xebata xwe dikir.

Carekê ez û komek heval ji Geliyê Şilo dihatin Geliyê Kersê. Di rê de maşîneya me qulipî. Du hevalên me hinek êşiyan lê ti xesareke giran li me nebû. Wexta ez gihîştim Geliyê Kersê, Evîn beziya û hate cem min. Wê bihîstibû ku me qeza kiriye. Hal û hewalê min pirsî. Min jê re got: "Çi be jî tiştek bi hesin nayê."

Ji bo rizgarkirina Şengalê pêngavek hatibû destpêkirin. Ez hatibûm şer. Ji bona wê min perwerdehî jî dît. Nedibû ez di xebata ciwanan de dema xwe derbas bikim. Her çi qas karekî girîng bû jî, min şer dixwest, şer. Min dixwest biçim tevlî rizgarkirina Şengalê bibim. Min ji fermandariyê re pêşniyar kir. Wekî ku dihat payîn, fermandarî pêşniyara min nepejirand. Min xwe sipart fermandariyê û heya pêşniyara min nehat pejirandin nesekinîm. Di dawiyê de fermandarî neçar ma ku pêşniyara min bipejirîne.

Beriya ku biçim Şengalê, min yek bi yek ji hevalên xwe xatir xwest. Ez çûm cem Evînê jî. Wê destpêkê bawer nekir ku fermandarî ez veguhestime Şengalê. Paşê got, bila diyariyeke te li cem min hebe. Min jî Deziyê Batizmiyê -bazinê ku tayê sor û sipî pê ve ye- ji destê xwe kir û da hevrêya xwe ya têkoşînê. Min ji Evînê xatir xwest û ji Geliyê Kersê ber bi Şengalê ve ketim rê.

Dema ez gihîştim Şengalê, gelek girên pişta bajêr hatibûn rizgarkirin. Hevalan li ser van giran cihên xwe ava kiribûn. Ji xwe re di bin erd de stargeh jî ava kiribûn. Yên me û çete li pêşberî hev sekinîbûn. Beriya ku pêngava rizgarkirina nav bajêr dest pê bike, me çalakiyên piçûk pêk dianî. Çeteyan jî carna êrîş diavîtin ser me. Carna jî xwe nêzikî me dikirin û bi çeka qanas êrişî me dikirin. Piştî girtina van girên dikevin pişta bajêr, bi me re baweriyek çêbûbû. Çi dibe bila bibe, em ê Şengala xwe ji destê wan çeteyên hov derxînin. Jixwe em ser serê wan re bûn. Weke teyrê baz, her roj çavê me li ser wan bû. Em bûbûn xewnereşka wan û diketin xewna wan. Êdî dem hatibû guhertin, vê carê em nêçîrvanbûn û ew bûbûn nêçîr.

Wê roja ku salnameyan 15ê Adara 2015an nîşan dida, ez û hevalê min ê ku doçka bi kar tîne, em bi hevre çûn biryargehê, li gel hevalan. Demek derbas bû. Ji aliyê girê ku em di ser de erkdar in, dengê guleyan hat. Hevalê min got: “Mensûr rabe, em biçin hawara hevalan.” Hevalan got: “Nelezînin, ka em fam bikin çi ye.” Hevalê min hestiyar bû. Wî got: “Şer li gel me ye. Em biçin bi hawara hevalên xwe .” Bêtêl û telefon xebitîn. Hevalê min rast digot. Dawet li gel me bû. Daweta cengê. Ya xwîn û barûtê. Em lîstikvanê vê dawetê bûn. Bivê nevê, em ê destmalê bigirin û bikevin dîlanê. Ez û hevalê xwe em bi bazdanê çûn gihîştin hevalan.

Şer giran bûbû. Çeteyan hem hawan diavêtin hem jî êrîş dikirin. Di milekê de jî bi qanasan gule dibarandin. Dema ez gihiştim stargehê ku di berwarê gir de bû, fermandarê me got: “Bi lez BKC bigihîne çeperê herî jor, da ku heval baştir gule biavêjin wan bêbavan.” Ez çûm bin stargehê. Min BKC û guleyên wê girtin û berê xwe da xeta ku têkevimê û di nav re xwe bigihînim çeperê herî jor. Du metre mabû ku bigîhim xetê, min di milê xwe yê çepê de germahiyek hîs kir. Ji piştê ve guleyek qanasê ket nava laşê min. Bê hemdê min, BKC û guleyên wê ketin erdê. Paşê serdevkî ketim xwarê. Min hewl da ku rabim. Paşê bi zehmetî rabûm û bi destê rastê ve min BKC girt û xwe berda jêr. Bîst mêtre wilo çûm û hevalê min ê doçka bi kar dianî gihîşte min. Li rûyê min meyzand, paşê dest danî ser birîna min. Qet nesekinî, BKC girt û berê xwe da ser serê gir. Hevalekî din hat cem min. Êdî çavê min tarî dibûn. Lewra min nas nekir ka kî bi min re ye. Wî hevalî ez rakirim. Ket bin çengê min û ez ber bi jêr ve birim. Em qasî sed mêtre çûn û gihîştin newaleke biçûk û teng. Di wir de bîna min çikiya. Hevalê min fam kir ku ez êdî pakrewanê vê xakê me. Wî hedîka ez li erdê dirêj kirim. Her çi qas, di beden de giyan nema be jî, wî nedixwest min biêşîne. Kefiya xwe ji xwe kir û danî bin serê min. Bi bazdan xwe gihand stargehê û bataniyek jê derxist. Anî li ser min raxist û wisa ma sekinî, heya ku ji alî jêr heval hatin, di cihê xwe de nelebitî.

Hevalan bi dorê ez li pişta xwe kirim. Min anîn ser rê û ez siwarî maşîneyê kirim. Maşîneyê berê xwe da ser serê Çiyayê Şengalê. Em hatin li Amûdê di nuqteyê de sekinîn. Destpêkê de, dema ku ez ji Zaxoyê hatim Şengalê, hevalan dîsa ez anîbûm vê nuqteyê. Di vê nuqteyê de min dest bi jiyaneke nû kiribû. Lê niha, îro û îşev, ez mêvanê vê nuq-

teyê me. Hevalan nobedar danîn li ber min. Erê, nobeta pakrewan pîroztir e ji nobetên dinê, dizanim. Ez pîroziya wan im. Ew xwe di min de, ez xwe di wan de dibînim. Ew hevalên pakrewanan in. Pakrewan rênîşanerên wan in.

Çi zû hat nizanim lê hat; bavê min, Xwedêda! Ji Zaxoyê ketibû rê. Dema hat gihîşt nuqtê, li gel hevalan peyivî. Paşê hat serdana min. Serê min vekir. Eniya min maçê kir. Destê xwe li ser rûyê min gerand. Paşê, hêdîka serê min girt.

Wê şevê çar caran hat serdana min. Min jê xatir dixwest, lê ew dîsa dihat. Wisa xuya bû ew naxwaze ji min veqete. Ji ber ku wî baş dizanî ew êdî ditînên dawî ne, ew êdî kenê li ser lêvên min nabîne. Dengê min nabihîse û bi min re galgalê nake. Lê, dê wêneyê min mezin bike û li dîwar bixe. Her wiha dê gorek bi destê xwe li rex hevalên min yên beriya min şehîd ketine çê bike. Carna, wê li wêneyê ser dîwar binihêre û wê hinek rondik ji çavê wî bêne xwarê. Pişt re wê rabe li ser xwe, li goristanê temaşe bike, dema dît li goristanê ez ne bêheval im û gelek qehremanên dinê, yên ku dayîk û bavên wan nikarin bên li cem gora wan jî hene, dê wê demê dilê wî hinekî hênik bibe û wê bizane ka ez çima û ji ber çi şehîd ketime.

Şev borî. Rojê, tîrêjên xwe avêt li ser serê Çiyayê Şengalê. Malbat hemû hatibûn ji Zaxoyê. Ewil dayîka min Xezal hat ser termê min. Bi girî, bi êş serê min vekir. Wisa hûr û kûr li rûyê min mêzand. Dizanim ji min têr nabe. Çend caran xwe xwar kir û ez maçê kirim. Nêta wê tine bû ku min berde û biçe. Dawiyê, hevaleke jin hat, ew hemêz kir. Bû şirîkê hêstirên dayîka min. Ew kişand û bir. Pişt wê re xwişk û bira hatin. Me xatir ji hev nexwest. Em ê herdem bi hev re bin di jiyana siberojê de. Ji ber ku ez zindî me, nemirime, ez şehîd im, şehîd!

Piştî hevdîtina bi malbatê re, çar şervan hatin termê min hilgirtin û xistin maşîneyê. Em ketin rê. Destpêkê de kêm maşîne hebûn di karwanê de. Me xwe ji Amûdê berda xwarê, em ber bi çadiran ve çûn. Dema em ketin nav çadiran, karwan zêde bû. Her ku em çûn, karwan dirêj bû. Karwan weke têkoşîna me bû. Her ku em têdikoşiyan, em zêde dibûn. Karwan her ku diçû zêde û dirêj dibû. Bi rêwîtiyeke di nav çadirên penaberan û şûn de, em gihîştîn goristana şehîdan. Ez di ser milan de çûm nava goristanê. Merasîm hat li darxistin. Axaftin hatin kirin. Her kesî bi yek dengî got, “Şehîd Namirin!”

Di goristanê de ez tenê nîn im. Destpêkê tenê di milekê min de pakrewan hebûn. Lê niha, her çar aliyên min bûne pakrewan.

Ew goristan, di mehên destpêka fermanê de ava bûbû. Gerîlayên ku xwestin di navbera Çiyayê Şengalê û Rojavayê Kurdistanê de korîdorê vekin û êzdiyan rizgar bikin, şehîd ketibûn. Ew anîbûm li vê goristanê sipartibûn axê. Bi anîna wan pakrewanan, hîmê goristanê hatibû danîn. Gelek kes hatin û di vir de xebitîn. Du qube hatin lê kirin. Dar, gul û kulîlk hatin çandin. Ji bo pêşwaziya mêvanan, xanî hate lêkirin. Her ku çû goristan rengîntir bû.

Gorên pakrewanan piştî neh mehan bi mermeran têne lêkirin. Di baweriya Êzdîtiyê de divê wisa be. Ji bo her pakrewanek, piştî neh mehan xêra sersalê tê dayîn. Pey wê re di her mehê de xêra sermeh tê dayîn. Ew xêr ya pakrewan û ya miriyan in. Di cejnan de malbat di goristanê de dicivin. Bi berbangê re, di avêtina tîrêjên rojê re, herkes amade dibe. Malbat xwarinên cur bi cur tînin. Dema xwe li gel me derbas dikin.

Malbata min jî tê serdana min. Bi taybetî, dayîka min her ku tê goristanê, di nava xwe de digirî. Carna bêhal dikeve û rûdine. Jê re av tînin, da ku karibe bi ser xwe de were. Her wextê ku pakrewanek tînin goristanê, dayîka min jî tê. Hevalên min yên têkoşînê, yek jê Evîn e, têne serdana min. Di ser serê min de bêdeng radiwestin û di xiyalên xwe de diçin wan rojên ku me bi hev re derbas kirine û wan rojan li ber çavê xwe zindî dikin.

Ji her çar aliyê welêt mirov têne serdana me. Ji derveyî welat jî yên têne cem me hene. Hinek ji wan gelek wêneyan digirin. Hinek ji wan jî carna li gorên me dinihêrin, carna jî berê xwe didin serê giran, li çiyê temaşe dikin. Ew dizanin çiya bi me, em bi çiya watedar dibin. Ji her çar aliyên welêt, şoreşger hatin Şengalê, têkoşiyan û canê xwe kirin gor. Li vir ez bi wan re me. Ji ber vê ye rehet û aram radizêm.

Em ji her çar aliyê welêt li vir in.
Me xwe kire gor
Da ku hûn azad bijîn.
Em li hev civiyane
Di vê goristanê de
Kurdno!
Hûn jî werin, dora me
Bicivin, bibin yek.
Hilînin ser li ber dijmin
Tola kevin û nû, ya
Şengalê.
Ava bikin ji nû ve
Siberoj ya we ye...

* * *

Ez im Tîjda, keça Xezalê. Dema ferman bi serê me de hat ez panzdeh salî bûm. Di fermanê de ji cih û warê xwe qut bûm. Ji heval û hogirên xwe dûr ketim. Kekê min winda bû, xizmên min belav û derbeder bûn. Her roj di televîzyonan de çîrokên destavêtinê dihatin pêşkêşkirin. Jinên êzdî di bazaran de dihatin firotin. Li ser malper û amûrên weşanê, vîdyoyên hovitiyê yên çeteyan dihatin weşandin. Serê min gêj dibû.

Ew demên me di kampê de derbas kirin pir zehmet bûn. Havînan pir germ bû. Zivistanan sar bû û em diman di nava heriyê de. Me nedizanî dê çi bi serê me ve were. Asayîş û pêşmerge zext û tadeyî li me dikir. Çima! Her çend roj carekê dihatin ber çadira me. Wan pirsa kekê min dikir. Digotin, “Çima beşdarî YBŞê bûye.” Li gorî wan ji bo ax, keramet û namûsa xwe şerkirin, tawaneke mezin bû. Vana xwe kurd dihesiband. Pir qala kurd û Kurdistanê dikirin. Lê mixabin! Ti kurdbûn bi wan re tine bû. Me baş dizanî, lê belê yên nedizanîn jî ne kêm bûn. Heke kurd û Kurdistan xema wan bûya, beriya her tiştî em nedifirotin. Di kampan de zilm li me nedikirin. Heke xema wan bûya, dema meş û daxuyaniyên ji boyî piştgiriya wan şervanên ku li Şengalê şer dikirin çêdibûn, helbet wan rê li ber wan çalakiyan nedigirt, lê mixabin dibûn asteng.

Ez xwe bi xwe difikirîm. Çare tine bû. Wisa jî nedibû. Dema ez wisa dihizirîm, ji ser hişê xwe ve diçûm. Gelek caran min radikirin nexweşxaneyê. Lê ji nexweşiya min re çare tine bû. Her gava ku kekê min Berxwedan dihate bîra min, bîna min teng dibû. Ew ber bi çarenûseke nediyar ve çûbû.

Carna kekê min Mensûr dihate bîra min. Gelo çi dike niha! Çeteyan dikuje? Heke şehîd bikeve, em ê çawa vê rewşê derbas bikin û em ê çawa bê Mensûr bijîn. Min qet nedixwest ez jiyaneke bê Mensûr bihizirim. Pirs pir lê bersiv kêm bûn.

Tişta em ne li bendê bûn pêk hat. Wê rojê dilê min pir teng bû û ez ne rehet  bûm. Min dizanibû tiştek bûye, lê min nedizanî ka çi ye. Tenê min dizanibû ku ev ne tiştek erênî û ne jî xebereke ji  xêrê ye. Belê, ew xebera ji sibehê ve dilê min hîs dikir, bi xwe re tu xêr û aramî ji bo me neanîbû. Kekê min Mensûr tev li karwanên şehîdan bûbû û ji nav me, ji mala xwe bar kiribû û çûbû. Em di çadirê de li hev civiyan. Bi hev re giriyan. Cîran bi me hesiyan. Ew hatin û êşa me parve kirin.

Êdî di kampê de, ji bo me jiyan zehmet bû û êdî sebra me nedihat. Gorên pêşiyên me, windayên me û şehîdên me li Şengalê bûn. Ji ber vê, me berê xwe da Xanasor a Şengalê. Di navbera me û Sîba Şêx Xidir de tenê Çiyayê Şengalê hebû. Başûrê çiyê meskenê me bû, ew jî li bakur mabû.

Êdî em li bendê bûn ku rojek ji rojan cihê me; tax û xaniyên me bên rizgarkirin. Rojên me yên neasayî bi dawî bibin.

Em li Xanasorê, bi taybetî êvaran, li ber televîzyonê rûdiniştin. Me çav li kanalan digerand. Êdî min jî dizanî ka kîjan nûçe derew in û kîjan rast in. Televîzyonên heqîqetê

û yên derewan hebûn. Me rûyê wan yê rasteqîn nas kiribû. Carna di nava malê de, nûçeyên derew dibûn mijara henekan. Endamek yê malbatê xwe dixist şûna bêjeran û derew dikirin. Endamên din yên malbatê jî, wek temaşevan bin, li wî dinihêriyan. Di dawiyê de em hemû dikeniyan. Erê, êdî em dikeniyan. Bi hatine Xanasorê re ken hatibû ser lêvên me û em kêfxweş, em bi coş û xuruş bûn. Ez êdî kêm ji ser hişê xwe diçûm. Dema beşdarî çalakiyan dibûm, bi dengek pir bilind diqîriyam. Min wisa slogan berz dikir, herkesî berê xwe dida min û li min dinêrî. Kesî nedizanî, lê min her digot: *"Xayin, Xiyanet, Koletî! Berxwedan Tîne Azadî!"* . Û bi vî awayî min hêrsa xwe ya di dil de vala dikir. Min kîna fermanê ku ser serê me hatî, bi sloganan derdixist der ve. Min xwe wisa rehet dikir. Di çalakiyan de carna me digot: *"Serî Hilde Êzdîxan, Azad Dibe Kurdistan!"* Rêberê hêja tim di bîra me de bû. Lewra me digot: *"Rêberê Me Ocelan, Mîna Quba Zêrîn e!"* Piştî çalakiyan dema ez dihatim malê, deng ji min dernediket. Min dermanê xwe dîtibû. Çalakî, erê çalakî, baştirîn derman bû. Piştî her çalakiyekê, zindîtir û bi hêztir dibûm. Di çalakiyan de min çalakvanên nû jî nas dikirin. Em dibûn hevalên hev. Diçûn serdana hev jî.

Êdî wext hatibû. Ez bûbûm hevde salî. Min dixwest dost û dijminê xwe û yê gelê xwe nas bikim. Min dixwest perwerdehî bibînim. Hevalên min yên keç hebûn. Pir qala perwerdehiya akademiyê dikirin. Lê belê astengiyek hebû. Pêwîst bû ez ji wê astengiyê derbas bibim. Malbatê, di serî de dayîka min, nedihêla ez bibim şervan. Min hewl da ku ew razî bikim, lê wê her digot: "Li cem min be. Hûn yek bi yek ji min qut dibin. Êdî ez nikarim xwe ragirim." Min dibersivand: "Dayîkê, ez dê her meh werim cem te. Xeman nexwe. Ji bo hevrebûneke rast, ez ê biçim beşdarî YJŞê bi-

bim." Kêmek nerm dibû. Ji lew re ez li hin çareyên dinê geriyam. Çûm cem tevgera jinê. Min ew vexwendin malê. Jixwe dihatin û diçûn, lê çend caran bi taybetî ji bo min hatin. Dilê dayîka min razî kirin. Bavê min, birayên min bêdeng man. Wan digot: "Biryar ya wê ye. Heke dixwaze bila tevlî YJŞê bibe. Lêbelê pêwîst e paşê poşman nebe û di nav xelkê de me nede şermê." Rast e, heke yek beşdar bibe û vegere malê, pir şermek mezin e. Rê rast, armanc zelal bû. Bêgûman jê veger eyb bû. Bêgûman derketina ji rêya rast bêrûmetî ye. Ez bi biryar bûm. Min dixwest gavan biavêjim di nav têkoşînê de. Di avakirina pêşeroja azad de rista xwe bilîzim. Êvarekê, piştî gotûbêjeke dûr û dirêj her tişt bi rê ket. Êdî ez ê bûbûma endama Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ). YJŞ! Belê, Yekineyên Jinên Şengalê. Heke rojekê yekî bigota wê hêzeke jinan a xweser ava bibe, me yê bi hev re gotibûya, di xewn û xiyalan de belkî were damezrandin. Lê îro, îro ew hêz heye û ez jî bûme endameke wê hêza jinê.

YJŞ rêxistineke xweser ya jinên êzdî ye. Di milê civakî de Tevgera Jinê TAJÊ heye. Di milê leşkerî de jî YJŞ. YJŞ di encama konferanseke du rojî de, di 16-17ê Reşemeha 2016an de hate damezirandin. Ji ber bêrêxistinbûnê ferman di ser me de hat. Lê niha ne tenê rêxistinên giştî, yên xweser yên jinan jî hene. Ew jî curek tohildana jinê ye. Jixwe em ê ti caran çarenûsa xwe di destê ti kesî re nehêlin.

Piştî razîkirin û biryara malbatê, YJŞyî hatin û ez ji malê rakirim birim cihê perwerdehiyê. Akademiya jinan di quntara Çiyayê Şengalê de bû. Gelek balkêş e, gelek. Xwezî Edûlê em bidîtana û sitranek li ser me bistriya.

Di akademiyê de li destpêkê me sond xwar. Wê rojê malbat jî hatibûn. Piştî sondxwarinê me şahiyek li dar xist. Me stran gotin. Me govend gerandin. Di nîvrojê de xwarin

hate xwarin. Piştî nîvrojê, ji malbatên hatibûn re, semînerek hate dayîn. Semîner li ser malbata demokrat bû. Belê, ev der akademî ye. Kî were dê perwerde bibe û biçe.

Di akademiyê de em xwe bi xwe bûn. Me hêdî hêdî xwe û zayenda xwe nas kir. Hinek hevalên me yên ku digotin, xwezî ez ne keç, lê kur bihatama dinyayê, hizrên xwe guhertin. Ji ber ku van hevalan xwe û zayenda xwe nas kirin. Êdî ji xwe, ji bedena xwe û zayenda xwe hez dikirin. Çarenûsa gelê me weke ya me bû. Heke em xwe biguherînin û bi pêş de biçin, bêgûman gelê me jî wê ji bindestiyê rizgar bibe û siberoja xwe ya azad ava bike. Em girîng bûn. Gelek tişt di destê me de bû. Beriya her tiştî guhertin û veguhertina civakê, di guhertin û veguhertina me re derbas dibû. Di nîveka perwerdejiyê de em bûn xwedî biryar. Me biryar da ku xwe û civaka xwe biguherînin. Em vê têkoşîna evqas bi wate tenê di destê mêran re nehêlin.

Em ber bi dawiya perwerdehiyê ve diçûn. Perwerdehiya teorîk heya astekê me dît. Êdî dem hatibû ku em perwerdehiya çekan jî bibînin. Li destpêkê çek û rext anîn û dane me. Çekên me bê gule, rextên me vala bûn. Dema min çek girt destê xwe, baweriyekê da min. Lê belê min qet bawer nedikir ku ez gule berdim hedefê û li nîşana ku min girtiye bidim. Bi vê çekê kuştina yekî dinê; min qet bawer nedikir.

Piştî mamoste em fêrî vekirin û girtina kalaşnîkofê kirin, me berê xwe da cihê guleberdanê. Dema dor hate min ku guleyê berdim, min xwe li erdê bi ser devkî dirêj kir. Min binê çekê danî çalika milê xwe û nîşan girt. Lê belê beriya ku ez gule berdim hedefê, bedena min lerizî. Ji ber vê mamosta got: “Bisekine, carê rehet  be. Bîna xwe bigire û berde. Heke fêrî guleberdanê nebî, tu ti caran nikarî

xwe li hember dijmin biparêzî.” Di wê kêliyê de kekê min ê winda û yê şehîd hatin bîra min. Hêrs bûm, pir hêrs bûm. Min binê çeka xwe danî çalika milê xwe. Min nîşan girt û gule teqand. Mixabin, gule negihîşt hedefê. Ez ê rabûma lê mamoste got: “Raweste. Heya li hedefê nedî ranebe.” Min careke din gule berda û careke din jî, di dawiyê de êdî nizanim guleya çendan bû, lê min li kêleka hedefê da. Ji lêdana nîşanê re hîna perwerde pêwîst bû, lêbelê min li hedef xistibû. Ji bo gava destpêkê ev qas bes bû ji bona min.

Wê rojê, êvarê, dema min serê xwe danî ser balîfkê, ez kûr hizirîm. Min got, hêza mêr ji vê tê; wêrekî! Hêza mêr ji vê tê; lêdan! Heke em wêrek bin û bizanibin lê bidin, em ê tu caran di bin destê mêran de nemînin. Tu caran dijmin dê nikaribe dest biavêje me û di bazaran de me bifiroşe. Her cara êrîş di ser me de tê, çi yê mêran, çi yê dewletê, çi jî yê dagirkeran; em vedikişin hev, diqûrmiçin. Nexêr, divê em birêxistin bin. Karibin li ber xwe bidin. Li hember êrîşkaran zêdetir di nava êrîşê de bin. Wê demê em ê karibin di navbera zayenda jin û mêran de wekhevî û hevpariyê ava bikin.

Di dawiya perwerdehiyê de, me yek bi yek sond xwar. Di lidarxistina merasîmê de şahî hebû. Malbat dîsa hatin. Çavê hemûyan li ser me bû. Merasîm û di navê de sekna me ya leşkerî, bala malbatan kişand. Ew keçikên malê, yên nazik û nazenîn çûbûn, di şûna wan de Keçên Êzdîxane yên Cengawer hatibûn. Di dawiya şahiyê de bi taybetî dayîk çûn destê mamostayan û spasiya xwe pêşkeşî wan kirin. Dayîka min, di nav heval û malbatan de bi dengê bilind axivî ku her kes bibihîse. Wê got: “Şûna ku keçik bi neçarî û perîşanî bikevin destê dijminan, wiha bibin şervan û şerê xwe bikin çêtir e. Çêtir e di bazaran de bêne firotin.” Belê,

ew dayîka ku li destpêkê nedixwest ez bibim endameka hêzên leşkerî û tev li şer bibim, lê îro bi hêz û baweriya ji kekê min Mensûr girtî ve qîr dida û hêvî dida tevayî dayîk û bavên êzdiyan.

Bi dawîbûna dewreyê re, her hevaleka me çû cihê ku hatiye erkdarkirin. Ez jî çûm Çilmêran.

Di nuqta Çilmêran a jinan de heval rûniştibûn. Me merheba da hev. Min çenteyê xwe ji milê xwe kir. Berê xwe da qubeyê. Di ber deriyê de min pêlavên xwe derxistin. Paşê min xwe ji ser kêleka derî re xwar kir û ew der maç kir. Derbasî hundir bûm. Hezar dînar danî li ser derçikê û min ew maç kir. Ji bona serderî karibin debara xwe bikin em diravan datînin li ser derçikê. Her kes çi dilê wî/ê were wî datîne li ser derçikê. Piştî ku min dirav danî ez çûm ber pacên kesk û sor û zer. Ji vana ya sor min girt û girêkek avêtê. Di dilê xwe de jî min got: "Melekê Tawûs! Tu me star bikî, tu li me bikî xêrê, tu hêz bidî Keçên Êzdîxaneyê yên Cengawer." Piştî serdana qubeyê, ji qubeyê derketim. Çûm li pişta qubeyê sekinîm. Li raserê wê kortalê, bayekî pir dijwar li min dida. Min li ber xwe dida ku nekevim ber bayê. Her ku ba dihat min jî li ber xwe dida. Her ku min li ber xwe dida, bihêz dibûm. Min porê xwe yê kezîkirî vekir. Berda ber bayê. Çend caran di dora xwe de zîvirîm. Dawiyê min berê xwe da bayê. Min destê xwe vekirin û ba hemêz kir. Bayê bihêz xwe diavêt hemêza min. Rûyê min, porê min dialast. Min ji bayê hêz girt; hêza Çilmêran. Ez bûm bahdînî. Bûm weke hawariyan, weke wahabiyan, weke derwêşan.

Min çavên xwe berda berwarê çiyê. Zevî diyar bûn ku bi hezaran salan gelê me xwedî kiribûn. Lê niha ew bi xwe bêxwedî mabûn. Di quntara çiyê de Qubeya Şerfedîn û ya

Berşerfedîn dixuyan. Ji wan û wêdetir deştê dest pê dikir. Deşta xêr û bêr ya pêşiyên me. Min serê xwe rakir û rast li pêşberê xwe meyzand. Cûdî û Gabar diyar bûn. Ji wan deşt û çiyayan re dengê xezal û pezkoviyan dihate guhê min. Min xwe da hev. Kêliyekê rûniştim û paşê rabûm û çûm cem hevalên xwe.

Rojên min yên destpêkê bi naskirina hevalan û derdorê derbas bûn. Di nuqtê de em bîst jinên şervan hebûn. Em di rojavayê qubeyê de disekinîn. Di rojhilatê qubeyê de jî nuqteyeke hevalên mêr hebû. Ew jî tev, bîst şervan bûn. Bi giştî hejmara me çil kes bû. Em di Çilmêran de çil şervan bûn. Me dabû ser şopa Şerfedîn û Çilmêrên bahdînî. Çiyayê Şengalê parastî bû êdî. Di çiya û dora wê de jiyana êzdiyan ji nû ve ava dibû. Belê em çil jin û mêr di herêma Çilmêran de, di cihê pîroz ê êzdiyan de bûbûn parêzvan. Weke di raboriya dîrokê de çawa çil mêr hatibûn û gelê êzdî rizgar kiribûn û bûbûn parêzvanên Şerfedîn, îro zarokên êgir û rojê bi heman rengî, lê hin bi hêz û bi rêxistin û tevlî keçan cihê xwe girtibûn.

* * *

Ez im, Pêşeroj, Delala Xezalê. Deh salî me. Kolanên Xanasorê nîve nîv vala ne. Yên ku di fermanê de baz dane, hîna temamî venegeriyane. Ji ber vê ye ku hevalên min kêm in. Di kolanan de kuçikên beredayî pirr in. Xwediyê wan baz dane û ew mane li cih. Kuçik birçî, bêcih û bêxwedî ne. Lewra sermest û bihêrs in. Yek ji wan heye, reş e. Li ser rêya min  e. Dema ez diçim dibistanê, derdikeve ser rêka min û nahêle ez di rêkê re derbas bibim. Heke hewl bidim ku derbas bibim, êrîşî min dike. Neçar im birevim û direvim jî. Min ji xwe re rêyeka dinê peyda kiriye. Di nav malên vala re derbas dibim û diçim.

Dibistanên me bi kurdî ne. Xwendin bi zimanê me, mamostayên me êzdî ne, ez xwendekareka jîr û jêhatî me. Li ser dîrok, ol û çanda xwe tême perwerdekirin. Di meşan û semîneran de diqîrin û dibêjin: "Ciwan siberoj in." Baş e, em çi ne? Em zarok in. Nexêr! Em hêvî ne, hêviyên siberojê ne. Ji ciwanan xebat tê hêvîkirin. Em jî hêvî ne. Mezinan hêviyên xwe li me bar kiriye. Em ê wana bi cih bînin. Em ê dawî li êş û azaran bînin. Şengalê bikin cihê kêf û şahiyan. Di Kurdistana mezin de, di nav baxçeyên gelan de, baxçeyên zarokan ava bikin. Bi gul û kulîlkan bixemilînin. Em ê biqîrin û bibêjîn, "Va ye cîhana nû! Em ê hemû zarokên dinyayê vexwînin nava baxçeyê xwe. Em ê bibêjin, em nahêlin xeyalên zarokan têk biçe, em ê bi xeyalên xwe

bijîn. Ji şîrî heta pîrî, em ê qet mezin nebin û her zarok bimînin û zarokatiya xwe bijîn. Yên mezin bûn dîrok vegerandin gola xwînê. Êdî mezinbûn, kuştin û talan, teqandina bombeyan, weke mîrateyek hovbûyinê bila ji dîrokê re bimîne.

Li gel xwendinê, ez diçim dersa çandê jî. Mamostaya porkezî lêdana tembûrê fêrî me dike. Em bi hev re rûdinin û van noteyan lê didin:

"Re mî re mî re mî re mî."

Pişt re perdeyeke din fêr dibin:

"So la so la so la so la."

Bi ken, bi coş derbas dibe ferbûna me ya tembûrê. Ez ji koma tembûrê derbasî ya stranan dibim. Di vir de jî fêrî stranan dibim. Em bi hev re, bi çember rûdinin û dest pê dikin. Li destpêkê mamoste dibêje û em dubare dikin. Lê paşê, piştî ku em stranê fêr bûn bi mamoste re dibêjin. Em niha di şahiyan de derdikevîn pêşberî gel û stranên xwe dibêjin. Ji vana ya herî xweş jî ev e:

*"Çi dar e ji dara gûzê*
*Leylo Leyla min,*
*Hoste bînin ji Bedlîsê*
*Tew tew mala min.*

*Çi dar e ji dara hewrê*
*Leylo Leyla min,*
*Hoste bînin ji Stewrê*
*Tew tew mala min.*

*Çi dar e ji dara biyê*
*Leylo Leyla min,*

*Navê keçikê Belqîz e*
*Tew tew mala min,*

*Xiftan li bejn e dilîze*
*Tew tew mala min."*

Ez di koma govendê de jî cihê xwe digirim. Govendê xweş nagerînim lê ez ê her fêr bibim. Min xwe daye pêş. Dilê min di destê min de ye.

*Ez im, Siberoj im*
*Ji Şerfedîn bi hêvî me.*
*Nûrê distînim*
*Ji Lalişa Nûranî.*
*Ji lew re*
*Ronî ye rêka min*
*Zelal e armanca min.*
*Ez im, Siberoj im*
*Jîr û jêhatî me…*